



**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YIL
ENSTITUYA ZIMANÊNÊ ZN ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ**

CEDELYEYA JIYAN Û MIRIN DI ŞI'RA MAHWÎ DA

TEZA LÎSANS A BİLİND

Amadekar

Rebaz dawood sherazd

**ŞAXA MAKEZANISTA
ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

WAN-2017

T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DAL

**MAHVÎ'NİN ŞİİRİNDE HAYAT VE ÖLÜM
DİYALEKTİĞİ**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN
Rebaz Dawood Sherzad

DANIŞMAN
Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

VAN
2017

K.T
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YIL
ENSTITUYA ZIMANÊNÊ ZINDÎ
MAKEZANISTA ZIMAN Û WÊJEYA KURDÎ

CEDELYEYA JIYAN Û MIRIN DI ŞIRA MAHWÎ DA

Teza Mastirê

Amadekar

Rebaz Dawood Sherazd

Şêwirmend

Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TÎMURTAŞ

Wan

2017





T.C.
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü


TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ danışmanlığında, Rebaz Dawood Sherazd tarafından hazırlanan “Cedelyeya Jiyan û Mirin Di Şi’ra Mahwî da” adlı bu çalışma, 31/03/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Yrd. Doç. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ İmza: 

ÜYE (Danışman) : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ İmza: 

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK İmza: 

ÜYE : İmza:

ÜYE : İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

31/03/2017
Prof. Dr. Murat LİLMİRE
Enstitü Müdürü


NAVEROK

Naverok	Rupel
NAVEROK	i
KURTE	iv
ÖZET	vi
ABSTRACT	viii
Pêşgotin.....	ix
KURTKIRIN	xi
1- DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	4
TESEWIFA KURDÎ Û MEHWÎ	4
Hizra Sofya Mehwî Derbareya Bûn û Dunya da	4
1. Sofî û Tesewifa Kurdî	4
1.1. Helbesta Sofîgerî ya kurdî.....	6
1.2. Mehwî û Şîra Sofîgerî.....	7
1.3. Hal û Meqam di Şîra Sofîgerî ya Mehwî de	8
1.4. Jiyana Mehwî	9
1.5. Rêber û Bandorên li Ser Mehwî.....	10
1.6. Têgihîştina Bûnê (Bûn – Mirov – Cîhan) li ba Mehwî.....	11
1.7. Bûn li ba Mehwî.....	15
1.8. Dîtina Dinyayê li ba Mehwî.....	18
1.9. Dinyabîniya Mehwî.....	21
1.10. Wênekirina Dinyayê li ba Mehwî	27
1.10.1. Dinya – Mîhnetxane	29
1.10.2. Dinya – Çiraxan e.....	29
1.10.3. Dinya – Daye rêzbar	30
1.10.4. Dinya – jina telaqdayî – berdayî (jina no).....	30
1.10.5. Dinya – Cîfe – Berate (kelex)	31
1.10.6. Dinya – Behra Fîtneeyê.....	31
1.10.7. Dinya – Jina Xwefiroş.....	31

1.10.8. Dinya – jina Nanpêj (Nanewa).....	32
1.10.9. Dinya – Zenbûr	32
1.10.10. Dinya – Dava Heyatê	33
1.10.11. Dinya – Teweşistan – Hovistan.....	33
1.10.12. Dinya- Tiyatro	33
1.11. Sedemên Redkirina Dinyayê li ba Mehwî	37
BEŞA DUYEM	41
EZMÛNA HIZRÎ YA MEHWÎ LI SER JİYANÊ.....	41
2.1. Mehwî û Jiyana	44
2.2. Jiyana Dinyayê	51
2.3.Şêwazên jiyana Dinyayê li ba Mehwî.....	57
2.4.Ew Tiştên ku Tê wate û Hevwateya jiyana Pesendkirî (Jiyana Merdane) li Ba Mehwî.	67
2.4.1. Awî Heyat (Ava Heyatê).....	67
2.4.2.Heyat	68
2.4.3.Ava –Xizr	68
2.4.4. Ruhê Teze.....	69
2.4.5. Zîdegî, Zindîtî	69
2.4.6.Ruh Bexş	70
2.4.7- Heyata Teze	70
2.4.8.Awî Heywane.....	71
2.4.9.Jiyana	71
2.4.10.Canfîza	72
2.4.11.Ava Zindîtiyê	72
2.5. Peyv û Bêjeyên ku Bi wate û Hevwateya jiyana Neqebûlkirî Tê li Ba Mehwî ..	72
2.5.1.Ava Heyatê.....	73
2.5.2.Ava Zîdegî.....	73
2.5.3.Heyat	74
2.5.4.Awî Heyat	74
2.6.Ezmûna Hizrî Mehwî Bo jiyane Di Helbestên wî De.....	75
Beşa Sêyem	77
Ezmûna Hizrî ya Mehwî li Ser Mirinê û Gedelyeya Jiyana û Mirinê Di Şira Wî Da.....	77

3.1. Heqîqet û Rastiya Mirinê.....	77
3.2.Mirin di Helbestê Mehwî de	83
3.2.1.Mirina Miroyî (Nefsî)	94
3.2.2.Mirina Merdane ya Bi Dilê Xwe.....	94
3.2.3.Mirina Bi Merdane ya Bi Dilê Xwe Ne Xwestin.....	101
3.2.4.Mirinî Namerdane (Satekî)	104
3.3.Ew Peyv û Gotinên li Gel Mehwî ku Têne Wateya Mirinê	107
3.3.1. Mirin.....	108
3.3.2 Sutin, Sutan	108
3.3.3. Fena.....	108
3.3.4. Xilasîbun	109
3.3.5 Kuştin.....	109
3.3.6 Merg.....	109
3.3.7 Canfîda (Ruh fedakirin)	109
3.3. 8. Edem	110
3.4.Di Helbestên Mehwî de Gedelyeya Jiyan û Mirin.....	110
Encam.....	122

TEZA LÎSANSÂ BILIND

Rebaz Dawood Sherzad
ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ
2017

Navê Tezê: Cedelyeya Jyan Û Mirin Dî Şira Mahwi da

KURTE

Babeta jîyan û mirinê babetekî girînge û xwedî peyvendiyeke bê qutbûne li gel mirov. Ji ber her mirovek divê her du pêvajoyan bi temamî jîyan bike. Di tezê de her du babet di bin ronahiya Qur'an û felsefeya îslamê de, ji aliyê helbestvanê mutesevûfê kurd Mehwî ve hatiye behs kirin. Piştî jî li dervey yasa û zagonên îslamê bi taybetî jî, ji aliyê wêjeyî ve, ku behsa diyardeya jîyan û mirinê di helbestên xwe de kiriye rawe û analîzên derûnî li ser hatiye kirin. Tez bixwe hemû ji sê beşan pêkhatiye, bi wî awayî nêrînên helbestvan hatine rawe kirin. Di beşa yekem de behsa hizra sofîyane ya Mehwî, di derbarê hebûn û cîhanê de hatiye rawe kirin, herwaha li gel behsa jîyana danasîna Mehwî di wêjeya kurdî de hatiye rawe kirin. Di beşa duyem de behsa jîyan û ezmûna hizrî ya Mehwî bo jîyanê hatiye rawe kirin, di hemû pêvajoyên û demên temenê helbestvan, ku xwedî wêne û pênasayên cuda li xwe digre hatiye vegotî kirin. Di beşa sêyem de behsa mirin û ezmûna hizrî ya Mehwî li hember mirinê hatiye rawe kirin û piştî di heman beşê de behsa diyardeya jîyan û mirinê di helbestên Mehwî de hatiye vegotin, ku di encama wê cudayiyê de, dema muqayese û dana berhevên nêrîn û ramanên Mehwî yê derbarê jîyan û mirinê dikare bê bidestxistin û fêmkirin. Di encamê de em gehestin wê astê ku helbestvan xwedî raboriyeke olî û wek sofîyê îslamê perwerde bûye, herwaha bi baweriya Mehwî jîyana rasteqîn bo mirov ew e ku ewd û canfedayê xwedê be, herwaha

geheştina ber deriyê mala xwedê be, Ev jî tê wateya ku hemû dema xwe ji bo evîn û muhabeta îlahî re cuda bike û bi wî awayî dikare xwe di jiyana rasteqîn de bibîne. Ew jiyana sexte naxwaze ku di cîhanê de heye. Ji ber Mehwî jiyana rasteqîn di ronahîbûna Qur'an û îslamê de dibîne û bidest dixê. Her tişt bi mirine. Li gor baweriya Mehwî bi xirabî mirin heye, ji bo vê mirov di vê cîhanê de mêvane, çî zû çî direng hebûna wî di vê cîhanê de namîne. Di heman demê de jî wêne û nêrîna irfanî ya cuda li hember mirinê di Mehwî de heye, ji ber mirin li gel Mehwî xwe gehandina wêneyê jiyane bixwe ye. Lê piştî Mehwî wek helbestvan bi taybet, di pêvajoyên dawîya jiyana û temenê xwe de hin cudayî û bê seqamgirî ango bê istiqariyên derûnî di nêrînên wî yê derbarê jiyana û mirinê de derdikevin pêş û di encamê de, muqayese û dana berhevkirina nêrînên Mehwî tî kirin, ji destpêkê heta dawîya temenê wî, derbarê jiyana û mirinê de ji aliyê wêjeyî ve ji qalibên hûnerî ve ew diyardeye hatiye dariştin. Herwaha bi hurgilî li ser wan mijaran muqayese û dan berhev pêkhatiye.

Yüksek Lisans

Rebaz Dawood Sherzad

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
2017

Mahvî'nin Şiirinde Hayat ve Ölüm DİYALEKTİĞİ

ÖZET

Hayat ile ölüm insan açısından oldukça önemli bir konu olduğu gibi, insan yaşamının ayrılmaz bir parçasıdır da. Çünkü her insan bu iki süreci yaşamak zorunda. Bu birbirinin parçası olan iki konuya ilişkin yazmış olduğumuz tez de, Kur'an ve islamî felsefe temelinde, Kürt tasavvufçu şair Mehwi'nin bu konudaki görüş ve yaklaşımları geniş bir şekilde ele alınarak dile getirilmiştir. Daha sonra islami yasa ve kanunların dışında da, özellikle Mehuyi'nin edebî açıdan yaşam ile ölüm olgusunu işlediği boyutlar psikolojik yönleriyle ele alınıp çözümlenmeye çalışılmıştır. Tezimiz üç bölümden oluşmakta ve bu şekilde şairin dünya bakışı ve görüşleri analiz edilmiştir. Birinci bölümde Mehuyi'nin sofuluk dünya bakışı temelinde, varlık ve dünyaya ilişkin görüşlerine yer verilmekte, ayrıca Mehwi'nin yaşam öyküsü ile kürt edebiyatındaki yeri ve önemine de değinilmektedir. İkinci bölümde ise Mehuyi'nin yaşam ve düşünsel deneyimlerinin, hayata yansımaları, ayrıca hayatının tüm dönemleri ve şairin ömründeki dönemeçlere ilişkin ortaya çıkan fotoğrafın farklılığı ve anlamlandırmalar anlatılmaya çalışılmıştır. Üçüncü bölüm de ise Mehwi'nin ölüm ve zihinsel deneyimleri ve ölüm karşısındaki duruşu

anlatılmakta, daha sonradan ise aynı bölüm de yaşam ile ölüm olgularının şairin kendi eserlerinde yer verdiği biçimi ile ele alınarak işlenmeye ve çözümlenmeye çalışılmış, bu anlamda varolan farklılıklar ve gerekli mukayeseler yapıldığında Mehwi'nin hayat ve ölüme ilişkin yaklaşımları ve düşüncelerinin ne olduğu yalın bir biçimde açığa çıkmaktadır. Sonuç olarak da elde ettiğimiz veriler temelinde şairin dini ve sofiliğe dayalı geçmişe dayanan bir eğitimden geçtiğini ve kendi inancı temelinde gerçek yaşamın, insan için sadece allah yolunda iyi bir kul ve fedai olmaya gerektirdiği ve ancak bu şekilde allah yolunda yürüyenebileceğini, bunun anlamının ise sürekli bir allah aşkı ve ilahi muhabbetiyle zaman geçirilmesi gerektiği ve ancak bu şekilde doğru yaşam ölçülerine ulaşabileceği felsefesini esas almaktadır. Sahte ve ucuz yaşamın dünyaya hakim olduğuna inanır. Onun için de Mehuyi doğru yaşamın Kur'an ve islam ölçülerinde mümkün olduğuna inanır. Aynı zaman da her canlı ölümlüdür. Onun için de Mehuyi'nin inancında ölümün oldukça kötü şekilleri vardır ve insan hayatta sadece bir misafirdir. Ama geç ama erken bu dünyadan göçüp gidecektir ve ölecektir. Aynı zamanda Mehwi'de irfani yönlerin de bir fotoğrafını görmek ve ölüme karşı o temelde bir yaklaşım da hakimdir. Çünkü Mehwi'ye göre ölüm aynı zamanda gerçek yaşama da ulaşmanın ta kendi fotoğrafıdır. Fakat bir şair olarak Mehuyi hayatının sonlarına doğru, yaşının ilerlemesi ile birlikte hem hayata hem de ölüm karşısında kendisiyle çelişen, istikrarsız, ya da psikolojik olarak bazı istikrarsız düşüncelerin ve yaklaşımlarının ön plana çıktığı belirtilebilir. Sonuçta da Mehuyi'nin genel anlamda hayat felsefesi ve ölüme ilişkin genel görüşlerine yönelik gerekli mukayeseler yapılmakta, ayrıca başlangıçtan hayatının son dönemlerine kadar hayat ve ölüme ilişkin görüşleri ve sanatsal kalıplar çerçevesinde de bu olgular ele alınarak analiz edilmiş ve gerekli ayrıntılarla birlikte tüm bu konularda mukayeseler yapılarak sonuçlandırılmıştır.

Master Thesis

Rebaz Dawood Sherzad

YUZUNCU YIL UNIVERISTY
SOCIAL SCIENCES INSTITUTE

January, 2017

Dialectic Live and Death in the Poetry of Mahwy

ABSTRACT

The subject of life and death has been considered as an important and well connected to humans , because all human beings will experience the both parts in their life cycles in this thesis both of the subjects under the effects of (Qur'an) and Islamic philosophy of philosophical Kurdish poet (mahwi) .have been explained however in terms of literature and outside of Islamic laws the argument of life and death in his poems has been explained in the form of psychoanalysis this thesis is comprised of free parts ,the poet's perspectives have been explained as follows :-in the first section of the thesis the philosophical perspectives of (mahwi) towards existence and world have been narrated along with more detailed recognition of (mahwi) in Kurdish literature in the second section of the thesis (mahwi) life and thinking experience of life has been shown as well as different periods of (mahwi) life. and in the third section the concept of death and thinking experience of death within (mahwi) has been explained and at the same time the argument of life and death in (mahwi)'s poems has been narrated as the result of contrasting perspectives of mahwi toward life and death, eventually to reach that understanding that mahwi had come from Sufism and Islamic background of thinking. for mahwi the true life means the sacrifice of human for God, for reaching the gate of God's house meaning that the entire time has to be served in loving and compassion for God. Mahwi is seeing himself living in a true life as such he refuses the life of materialism, and he spends his life in lighting of Quran and Islam, as for the death mahwi believes in existence in existence of death he believes that every one is just a guest.

this plaws soon or late every one has to leave despite of this he has dihereat aspect toward death , because death for mahwi represents aform of life, but at the late stage of mahwi is life assort of psychological un stability in his thinking toward life and death has been noteced due to the conflict between mahwi prespectives from the bigginiy and end of his life about life and death,com be considered as argument is form of literature.

Pêşgotin

Di Edebyata Kurdî da Mehwî cihên bilnda kurdî dihêta hîsab kirin û berhemên wî bi piranî çî hî girîngpêdan û pir hûneryên bi dawya xwe hati ye dest xistin, ji ber wî bandora xwe di hember huner hîjaya xwe dest an ye. Ji ber ku gelek vekolên û şiroveyên cuda cuda di ser wî hati ye nivîsandin, ji encamî de gelek berhemên û peyva wî xwe znye nav biwarîn din li belî şair şareza yî û bilind dest ya wî li hember buwarên da mezin bû ye mehwî bi yeka li mezin tirîn helbesitvanên mijara Edebiyata tesewif di hête nasandin, we yeki ji mezintirin şahirên di edebyata kurdi dihête hisab kirin. Bi awayek berhem û peyvên wî ravekirina ferhengî êrfanî pîtivî hene ve gerya û xebitina zêde pêtivî hene û lazime her kesek ji lêkolîna xwe da şareza î û motîvên ekadîmî û mehrîfî wî hebe Jiyan û mirin yekî di hember babetên şeîrên mehwî da girîngî xwe hene, destkirin bi amadesazyî wisa bebetên bê sebeb nîne û bersiva wan sebeba ji lêkolînên de hat ye bas kirin. Mesele ya jîyan û mirin şeweyeka tesewfî û eslami wergirtye, lî belî zêdetir xwe an ye nav çuar çoveyên din, behsa jîyan û mirinên wî ji dunya de kiri ye û têfîkrîna bijûn di her du babet kir ye, piîştî derxistina watayên hevdu mijar behsa gedelyeya jîyan u mirin di cuar coveya edebi behs kiriye,bi rêya şikari derunyane , bi awayek ku şahir na îstiqrariya derunya wi ji şihra xwe da di cuar coveya hunerên gedelyeda behsa wi kiriye, Ez ev mijare bi babetên girîng zanî ne û xebata xwe di ser mijara bi kem jo bo derxistina zêdetir û sanaya mebesta şair derbixeyên.

Ez ji Xwedê re şikir dikim ji ber ku bi sayeya wî projeya lêkolînê temambû, ez supas û pêzanîna ji bo mamosta Lihon Qadir heye bi pirs û şewrandna wî bandorên xurt

li ser teza min kir, ez spasiya Omar Eziz Mehwî dikim ku alîkariya min kir ji bo bidestxistina pertukên wî derbareya Mehwî û bandorekê girîng li ser mijara lêkolîn anyî, ez spasiya Dr. Abdulhadî Timurtaş dikem li ser pîşu drêjî û serpereştiya lêkolîn kir we li dawida spasiya her kesê ku piştgirî ji min ra kir ji bo lêkolînê, we supasya dilsozya wan dikim.

Rebaz dawood

15 , 02, 2017

wan



KURTKIRIN

R	: Rûpel
W	: Wefat kirin
S.X.	: Silavên Xwedê lê be
M	: Mîladî
K	:Koçî



1- DESTPÊK

1.1.Navnîşana Têzê

Ev lêkolîn bi navnîşana “gedelyeya Jiyan û Mirinê di Helbestên Mehwî de” ye. Mebesta me ji vê lêkolînê destnîşankirina têgeha jiyana û mirinê li ba Mehwî ye ku têgeha jiyana bi wateya derketina hebûna xwe di cîhanê de dibîne, çimkî bihayê hebûna xwe di vê cîhanê de, kartêkirina rol û wateya jiyana di arasteya jiyana paşerojê de dibîne. Anku ji aliyekî ve dest ji jiyana bernade, mebest ew e ku hebûna xwe ya rasteqîn bidest bixe û ji aliyekî din ve jî bêwateyiya jiyana nîşan dide ku jiyana kurt e û dem bidawî dibe û ezmûne ji bo mirov. Bi giştî jiyana watedar û bêwate ye, wek ku di Qur’ana pîroz de hatiye wênekirin. Mirin jî heqîqeta derketina jiyana wî ya rasteqîn bû.

Ji bo vê yekê jî em li piraniya ol, filosofi û Îrfana Îslamî geriyana û piştê em dê herdu têgehên “jiyan û mirinê” lêkolîn bikin û mebest û ravekirina wan berçav bikin. Piştî behis kirin û derxistina jiyana û mirinê da, di çwarçêwya Îslamî û Qur’ana pîroz da derxistye, we behsa gedelyeya jiyana û mirinê di çwarçêwya edebî bi nerina lêkolera hatye behiskirin.

1.2.Babeta Têzê

Ev lêkolîn hewl dide têgeha jiyana û mirinê wek ku di olî, filosofiya Îslamî û Qur’ana pîroz de hatiye nîşan dan. Herweha piştê taybetmendî û wateya van herdu têgehên li ba helbestvan Mehwî vedikole. Piştê fehim kirina herdu têgehên di çwarçêwya edebî behsa gedelyeya jiyana û mirinê bi nerina lêkolera hatye der xistin . Ji bo vê armancê, anku ji bo lêkolînkirina herdu têgehên jiyana û mirinê, bi taybetî me sûd ji Dîwana Mehwî wergirtiye û ji bo behskirina van herdu têgehên li ba olên cuda û di filosofiya de me sûd ji jêder û çavkaniyên cuda cuda wergirt .

1.3.Arîşeya Têzê

Ev tez an name dixwaze wê taybetmendiyê rave bike ku herdu têgehên jiyân û mirinê di edebiyat û “helbestê” de diyar dike û şehrezayiya tecrûbeya helbestvan Mehîwî li hember dinyayê wek zanayekî ezmûndar derdixe. Kartêkirin û bandora helbestvanên din ên edebiyata erebî û farsî li ser Mehîwî diyar bû nemaze di diyarkirina wate û mebesta jiyân û mirinê li ba vî helbestvanî de.

1.4.Sedemê Hilbijartina vê Têzê

Ev babet di nav lêkolînên kurdî de, nexasim di navendên akademîk de pir kêmtê dîtîn, çimkî heta niha bi şeweyê akademîk careke tenê li ser vê mijarê lêkolîn hatiye kirin û ev lêkolîn dibe ya yekemin. Eger lêkolîn hatibin kirin jî, pir kêmtêkildarî vê mijarê bûne. Divê edebiyat li gor dîtina marîfî û helwestê bê kirin, çimkî bi giştî naveroka marîfet û hizrê tevî form û hunera derbirîna wan bûye beşekî girêdayî hev. Mehîwî jî hîmên helbesta xwe wek zimanhalê têgihîştina xwe ji dinyayê re dîtiye

1.5.Armanca Lêkolînê

Armanca lêkolînê ew e ku rengdan an hewldana derxistina wê rastiya ku dikare çavkaniya marîfî û helwesta mirov wek tekst derkeve û sûd jê bê wergirtin. Ji ber pîrbûna giringîdanê, helbest heta astekê ku hemû hizr û hîmên marîfî reng daye, lewma zêde girêdana mirov bi herdu têgehên jiyân û mirinê ku zêdetirîn xala gotûbêj û mijûlbûna fikirî ya mirov bûye. Bo vê mebestê jî me pêwîst dît berê xwe bidin derketina wateya van herdu têgehên li ba helbestvan Mehîwî û me giraniya xwe danî ser tekstan.

1.6.Rêbaza Lêkolîna Tezê

Di vê tîzê de rêbaza lêkolîna wesfî ya şîrovekarî hatiye pêrewkirin û kar li ser tekst û naveroka tekstê hatiye kirin. Bo vê armancê jî zanyariyên hûr û piştrastker û dûrî nerîna lêkolînan hatine bidestxistin. Di tevahiya beşan de, analîz hatiye kirin û rêzbandî hatiye pêkanîn. Bi vî rengî jî, wênekirina van herdu têgehên heta asteke baş hatiye kirin.

Herwiha metoda “handar” hatiye bikaranîn, anku bi giştî jiyan û mirin li ba oliya Îslamî da piştê bi taybetî li ba Mehwî.

1.7.Sînorê Tezê

Di vê tîzê de bo lêkolînkirina Mehwî, tekstên helbestan hatine bikaranîn ku di Dîwana Mehwî de hene ku ji hêla mamoste Ebdilkerîmê Muderis hatine berhevkerin û şîrovekirin. Me sûd ji ravekirina dîwanê wergirt û bo dewlemendkirina şîroveyê jî hinek caran me sûd ji jêderên din ku nêzîk bûn li ser heman babet û nerînê wergirt. Wek ferhenga Dîwana Cizîrî û Mehwî û Mehwîzanî – ku taybet e bi nerîna Mehwî û tîbînî û tîfîkrîna Mehwî derbarê jiyan û mirinê û tîgihîştina Mehwî li awayê tevgerkirina bi vê cîhanê re hatiye nişandan. Paşê di sinwra hunerên gedelye da berawird di fikra Mehwî derbareya jiyan û mirin kirye.

1.8.Babetên ku Berê di vî Warî de Hatine Nivîsandin

Heta vîga em agehdar in ku hiç babetên di ser vî mijarê da nehatiye kirin, tezeke din li ser van herdu tîgehên di şî'ra Mehwî da nehatine nivîsandin. Bi vî lêkolînê dibe yekem lêkolîna akademîk ku li ser gedelyeya jiyan û mirinê di şîira Mehwî da tî nivîsandin. Babetên din jî hene ku pir kêr in û bi awayekî nerasterast behsa van babetên kirine, Lewma ev nameya yekemine ku van herdu tîgehên di helbestan de lêkolîn dike, piştê wan şîrovekirina herdu tîgehên jiyan û mirinê behsa gedelyeya di nav bera herdu tîgehên di çwarçêweyên edebî hatye kirin .

BEŞA YEKEM
TESEWIFA KURDÎ Û MEHWÎ
Hizra Sofya Mehwi Derbareya Bûn û Dunya da

1.Sofi û Tesewifa Kurdî

Sofi têgeheke ku behsa kesê ku dibe rêbwarê rêya soffigeriyê dike. Ev jî gengeşeyeke zêde li ser heye neku her nivîskarên misilman lê biyanî û rojhilatzanan jî xwe pê ve mijûl kirine, hinek ji wan gihîştine encamekê. Yekem nivîskarê ereb ku peyva sofî di nivîsên xwe de bikar anî el-Cahiz (w. 255. k) ku dibêje “ الصوفية من النساك ” û navê Ebu'l-Haşim es-Sofi tîne. Lê yekemîn çavkaniya Îslamî ku tê zanîn li ser soffigeriyê hatiye nivîsandin kitêba *el-Lume'* ya Sîracuddî et-Tûsî (w.378.k) ye derbarê peyva sofî dibêje ji ber lixwekirina cilûbergên hirî navê wan wek (sofi) hatiye çimkî lixwekirina cil û bergên hirî rewîştê pêxemberan û dirûşma maqûlan e û dibêjin di serdema Hesenê Besrî de jî sofî hebûn wek ku wî bixwe navê wî aniye ku bi tesadufî çavê wî bi sofîyekî ketiye ku alîkariya wî kiriye. Hinek dibêjin (sofi) ji (sefa)yê hatiye, belgeya wan jî bo vê hedîseke (ذهب صفوا الدنيا ويبقى الكدر) lê aliyê rêzimanî ne rast e. Hinek dibêjin ji (Suffe) ya mizgefta pêxember hatiye. Yanî rêza pêşî bo xwedaperistinê, ev jî egerek kême heye ku rast be. Piraniya wan jî wek û Ibn Xeldûn(w1406.m), Yafî(w.768.k), Sehwerdî(w.1191.m) di wê baweriyê de ne ku (tesewif) ji (sof) hatiye qaşo Pêxember (s.x) cilûbergên hirî li xwe dikir, hezreta Ayişe gotiye ku dema bêhna xwêdanê jê dihat ji xwe dikir¹.

Lê heta niha bi nerîna rast dibêje sofî ji (sof) hatiye. Çimkî ji aliyê zimanî ve guncaw e û herwiha sofî ew kes bûn ku dev ji cîhana materiyal berdidan û sof (hirî) lixwe dikirin, niha jî em digihin sê amajekirinan bo wan nerînen nivîskaran ku rast in di bîr û baweriyên xwe de.

1. Hinek nivîskar di wê baweriyê de ne ku sofî ji (Sofe) hatiye. Sofeyê kurê Xews Ibin Hecer (w.852. k) an dibêjin çimkî dayika (Sofe) zarok jê re nediman nezr kir li

¹Sebûr Ebdilkerim Şikar, *Cemkî Jiyana û Mirnê di Helbesta Mewlewi û Romida*, Capxaneyê, Tehran, 2014, Çapa yekem, r ,23-24.

Xweda ku zarokê wê yê bê kur be yan keç be wî/wê bike micêwir (xizemtkarê) Ke'beyê. Sofe jî qetek hirî li porê xwe girêda, êdî ew û neviyên xwe bi vî navî hatin naskirin.

2. Hinek zanayên ereb û rojhilatzan wek (Bîrûnî – Mihemed Lutfî Cuma- Corcî Zîdan- Jozîf Fon- Hamirî) di wê baweriyê de ne ku sofî ji Sofiyaya Yûnanê hatiye.

3. Piraniya zanayên misilman wek es-Serrac, Klabazî, Sehrewerdî, Ibnu'l-Cewzî, (w.597. K) Ibn Teymiye (w. 728. K) , Ibn Xeldûn, û rojhilatzanên din wek Fon-Grîmer-Koldzîvr-Nicoson-Masînon di wê baweriyê de ne ku sofî ji sofî hatiye, ji ber guncandina rêzimanî û wateyê.”²

Ana Marî Şîmîl derbarê Tesewfî de dibêje sofî zahîreyekî berfireh û dûrdîtîne yê kûre, ku kes heta naha nekariye pênaseyekî tamamî bike û herwaha dibêje bingehê tesevufê wek pênase jî pêgeha herî mezin a ruhê olê ye û geheştina bi rastiyên mûtleq û ew rastî jî eger bê pênase kirin û nav kirin hûkme, yan jî nûra evînê ye³ Ewfi bi zûhdê ve girêdayî ye zuhde jî yasa, ferheng, rêziman û piştevaniya rêberê xwe heye. Tesevuf navê wê ku bi wateya terk kirina cîhanê ye, bi tamamî terk kirina xwe ye jî û heramkirina helalan, rakirin li zewac û êşkêşana nefsê bi bîrsîbûn û herwaha bi îşkencê bawerkirin û li hember wê li gel xwedê bi xelatbûne baweriye.

Destpêka dirustbûna jiyane piştî dirustbûna zevî tiştên siruştê mirovan hewl dabi rêya hestên xwe bi dû nihênî û peydakirina tiştên gerdûnê bikevin. Bi vê jî çend ekol ku çend bîr û baweriyên taybet lixwe digirin peyda bûn, her ji ekolên felsefî bigire ta ekolên olî heta îro jî gengeşe berdewam e. Sofîgerî wek yek ji aliyan nerîna wan li gerdûnê bêyî destûr û fikrê xwe şîrove û hatiye ravekirin bo gerdûnê. Pêşî sofîgerî bixwe ji nerîneke dînî bo cîhanê pêk tê. Koka wê vedigere bo wan nifûsên nihênî yên ku komên olî li rojhilat û rojava dikirin. Mebest jî ji peydakirina pêwendiyê di navbera mirov û mirov de yekgirtina bi Yezdan re ye. Ji aliyekî din ve em dikarin bêjin sofî tihniyên heqîqetê ne. Bi dû pîşeya xwe de digerin. Bo çî hatiye û diçe kû, divê çî bike. Yanî zanisteke ku mirov bi saya wê digihe rastiyê. Ev jî bi zanistî û kirde tê pêkanîn. Zanista wan jî ji birrîna kelemên nefsê û xwe dûrxistina ji xilsetên wê yên bed û xirab pêk tê heta digihe

² Şîkar, *Têgeha Jiyan û Mirinê*, r, 24-25

³ Ana Marî Şimeyl, *Eb'ad Sûfiyye fî Tarîxi'l-Îslam we't-Tesewwuf*, Menşûratu'l-Cemel Koln, 2006, Çapa Yekem, r. 7-8.

wê payeya ku ji bilî Xweda tiştêkî din nabîne. Sofîgerî lêgerîna li tiştên nihênî û nediyar e. Yanî sofîgerî şoreşeke berfireh a giyan e li ser hemû qeyd û bendên madî yên ku şaristaniyê bi dirêjiya dîrokê bi mirovê ve kirine. Lewma rêbwarê rasteqîn bi sê telaqan kelûpelên cîhana madî berdaye. Yanî sofî hilbijardeyê Xweda ne û ji bilî Pêxember, ji hemû çînen din bilindtir in. Dilê wan bûye kangeha nihênîyên Xweda û zanistên yektaperestiyê.”⁴

1.1. Helbesta Sofîgerî ya kurdî

Beriya her tiştî divê em bêjin di helbesta kurdî û erebî û farsî de jî li ba gelên din ên Îslamî, helbesta tesewif û helbesta olî tevlihev bûye. Her şairekî di pesna Xwedê û Pêxember de nivîsibe, soz û dua bi sirûdên ruhî honibe êdî bê pirs û lêpirsîn yekser xistine qalibê tesewifê. Ev yek li gor Letîf Helmet xeletiyê. Çimkî divê herdu corên şîrê li gor xislet û taybetmendiyên xwe bîn cudakirin. Cudakirina taybetmendiyên wan heye, lê di dawî de ji ber her hoyekê be di nav yek xaneyê anku qalibî de hatine rêzkirin. Lê helbesta sofîgerî ew helbest e ku tê de diyardeya yaxîbûn û serkêşiyê li hember desthilata dewletê û desthilata darayî û desthilata olî heye. Helbesta sofîgerî ya kurdî jî xwe di helbesta tesewif û olî û Xwedênasî û şerîetê de dîtîye. Herçiqasî ev bixwe derketin e ji qalibê sofîgerî, lê ev tenê li ba kurdan nayê dîtin, lê li cem şairên ereb jî heye. Lewma gengeşe di navbera çend edîb û dostan û sofînasan de dirust bûye li ser ka gelo sofî û helbesta oldarî di yektaya terazûyê de ne yan cuda ne. Çimkî hinek bawer dikin ku helbesta oldarî û Xwedênasî ne têkildarî tesewifê ne.

Herwiha helbestên olî dikevin qalibê zuhdê ku ji tesewifê cudaî heye. Çimkî tesewif û zuhid jî ji hev cuda ne. Zahid aşîqê Xweda ye lê sofî xwe wek Xweda dibîne, ketiye rewşekê ka gelo ew bixwe Xweda ye yan Xweda ew e û ev rewş di zimanê sofîgerî de wek fena fillah tê binavkirin. Lewma nivîskar û şairê kurd Letîf Helmet piştî anîna çend mînanan ji şîrên Mewlewî, Mehwî û Mewlana Xalidê Neqîşbendî şahidiyê dide ku helbestên van helbestvanan ku wek tesewif tên binavkirin û diçin rêza helbesta

⁴İbrahîm Ehmed Şiwan, *Helbesta Olî û Sofîgerî di Helbestên Kurdî yê Mehwî de*, Capxaneya Mukiryan, Capa yekem, r, 17-21.

oldarî û Xwedênasî, lê ev nerîn jî dikare bê redkirin û dibe ku rast jî be. Çimkî nivîskar sofîgeriyê wek yaxîbûn û derçûn û serkêşiyê dibîne, wek yaxîbûna Hellac(w.309 k), Ibn Erebi(w.638. k), Cahiz, Şebistrî(w.720.k) û Bustamî(w.261. k) ."⁵

1.2. Mehwî û Şiîra Sofîgerî

Di encama xwendina berhemên Mehwî de, bo me eşkere dibe ku helbesta Mehwî wek helbestvanekî dahêner nabe ji yek nerînê lê bê temaşekirin û hewl bê dayîn ku cîhana vî şairî di yek araste û yek navnîşanê de bê komkirin. Tiştê ku derbarê Mehwî û berhemên Mehwî hatiye gotin, bêhtir xwe di helbesta tesewifê de dîtiye. Ev jî ji ber hebûna amajeyê berfireh ji sofîzmê di şîira vî şairî de. Şîira oldarî ya Mehwî rûbereke berfireh ji berhemên Mehwî dagîr kiriye. Di heman demê de jî şîira jiyandostî û çêjdostiya regezî li hember corekî tede serdest e. Lê eger em derbarê işqê bipeyvin, bêhtir işqa yek cemserî ye, yar haya wê ji Mehwî nîne. İşq li ba Mehwî li vînerê tevgera jiyane ye, xwe di işqa xwedayî de dibîne."⁶ Mehwî wek tekane siwarê meydana şîira sofîgerî ya kurmanciya jêrîn tê hejmartin. Bi vê jî çend lêkolîn li ser hatine kirin. Eladîn Sicadî amaje bi şîira sofîgerî ya Mehwî kiriye, nimûneyeke şîirî jî aniye.

Dinya tiyatro ye, meweste tiya, biro

Kê mayewe tiya, ke nebûbê tiya, tiro

Herwiha Kakey Felah li ser sofîgeriya Mehwî dibêje: Şair zanayekî muteswif bû. Lê ev jî cuda ye ji peyva (sofî) çimkî muteswif tê wateya ku Mehwî ne sofî bû lê wek sofî dihat dîtin. Nivîskar bi rêya amajedana bi nîrxê jiyana cîhanê û dijminkirina nefsê. Diyarîkirina işqê li ba Mehwî û nivîskar çend nimûneyên ciwan aniye û herwiha Ebdillah Agirîn di amajeyekê de bo tesewifê li ba Mehwî dibêje: Mehwî wek sofîyekî qonax û pileyên tesewifê birriye her ji (fena fî şêx) piştî (fena fî lîlah) ku dawîtirîn pile û qonaxa xwe helandinê ye di wê felsefeyê de û di behsa xwe de derbarê sofîyan dibêjin sofî du cureyin: Mutesewifê îslamî û mutesewifê yaxî bû, Mehwî jî ji mutesewifên yaxî ye bi rêya vê helbestê

⁵ Letîf Helmet, *Sofî û Sofîgerî*, Capxaneya Rexneya Cawdêr, Hewlêr, 2009, Çapa Duyem, r.16-21.

⁶ Eta Qeredaxî, *Mehwî di Navbera Heza Dinyayî û Eşqa Xwedayî De* Wezaretê Rewşnberî, Hewlêr, 2009, Çapa Duyem, r.13.

Embînî şetî ye Mehwî, le mekirî nefsi emmare

Eger rehmî xuda, dem bestî ka, em mare engêwe

Li vir Mehwî ji xwe yaxî bû li dijî nefsa xwe ya bed derketiye û pena dibe ber Xweda bo rizgarbûna ji destê wê.⁷

Mînak li ser yaxîbûna xwe tîne û dibêje:

Çiye em hemû tentene û min minet

Ewende çiye, fexr û yex kirdinet

Be roçûnî awêk dekey zîndegî

Be derçûnî bayek debê mirdinit

Dr. Marif derbarê Mehwiye sofî dibêje, Mehwî wek dîndarekî terîqeta Neqîşbendî bawerî bi têkilkirina terîqetê ji bona şerîetê neku bi berevajî hebû. Herwiha nivîskar behsa guncandina şîra sofîti ya Mehwî ligel sofizma Îslamî kiriye û wî dike hevtayê şairên mezinên sofizma Îslamî. Xorşîd Reşîd dibêje / Mehwî sofîyekî mezin e û karîbûfelsefeya sofîgerî di şîrên xwe de nîşan bide. Tevî çend nivîskar û şairên din ku dîdevaniya sofizmê di şîrên Mehwî de teqez dike.⁸

Herwiha Hîmdad Hisên bawer dike ku Mehwî arifekî mezin bû, ew jî li gor wê nerîna wî ku hebû, herwiha sofîyekî tamam bû, ew jî bi rêya piştgirêdana me bi wê yekê ku Mehwî hemû hal û meqamên şîra tesewifê birrîne.⁹

1.3 .Hal û Meqam di Şîra Sofîgerî ya Mehwî de

Piştî lêkolînkirina tesewifê li ba Mehwî, nivîskar û rewşenbîran mohra sofîgeriyê li ser vî şairî danîn û tew wî wek arif jî dibînin bi rêya wê nerîna ku li ba wî hebû. Helbet ev gotin bi piştbestin bi wan hal û meqamên ku Mehwiye şair hemû meqamên tesewifê birrîbûn wek meqamên (tewbe, el-were‘ ez-zuhd, es-sebr, elfaqr, riza, et-tewekkul), lê çavkaniya van jî dixin rêz meqamên (el-‘inaye, el-qena‘e, eş-şukr, et-teselum, el-

⁷ Şiwan, *Helbesta Olî û Sofîgerî*, r.307-310.

⁸ Jêderê Berê, r. 311-313.

⁹ Hîmdad Hisên, *Mehwînasî*, Çapxaneya Serdem, Silimany, 2012, Capa Duyem, r. 32.

musahebe, el-xewf, er-reca, el-muraqebe, el-ihsan, el-qurb, el-ixlas, el-fena, el-beqa, et-tewhîd, et-tecdîd, et-tefrîd, et-tenzîh, el-ubudiyê) û hal jî ku hejmara wan ne cihgir e.

Hinekan 10 têgeh wesf kirine wek (el-muraqebe, el-hizb, el-xawf, er-reca, eş-şewq, el-uns, et-tanîne, el-muşahede, el-yeqîn) li vir hinek tevlihevî bi meqaman re heye, lê ev ne zêde giring e."¹⁰

Herwiha derbarê halan jî ev dikevin pêş çav wek (el-qebz, el-best, el-mehw, el-isyân, es-semu, es-sekr, el-xeybiye, eş-şihûd, el-wecd, el-celal, el-cemal û el-kemal, el-werih, et-talih, el-lewamih, el-hizb, el-warid) Mehwi amaje daye van hal û meqaman.

Divê ev têgeh jî cudakarî jê re hatibe kirin, dibe ku li hin cihan bi wateya asayî hatibin û li cihin din wek têgehên sofîgerî hatibin. Û herwiha Mehwi di şîrên xwe de bi tenê li çend cihan behsa hal û meqamên sofîgerî kiriye. Di du beytan de jî bi cot behsa hal û meqaman bi hev re kiriye.

Di dawî de em dikarin bêjin ku ew haletên ku Mehwi di şîrên xwe de behsa wan kiriye, ev in: Xoşewîstî (elmehebbe), tika (er-reca), şewq (eş-şewq), xidûgirtin (el-uns), surzanîn (el-yeqîn), celal (el-celal), ciwanî (el-cemal), tewawî (el-kemal), qebz (el-qebz), best (el-best), hişyarî û hestî (es-sehw û es-sekr), soz (el-cezb) û herwiha meqam jî ev in: (tobe (et-tewbe), wera (el-wera), zuhd (ez-zuhd), hejarî (el-faqr), aram (es-sebr), tewekul (et-tewekul), reza (er-riza), spas (eş-şukr), îhsan (el-ihsan), nîstî (el-fena), man (el-beqa), yektaperestî (et-tewhîd), dilsozî (el-ixlas), rastgoyî (es-sidq))¹¹

1.4.Jiyana Mehwi

Mehwi helbestvan navê wî mela muhemedê kura şêx husman balixye, babê mehwi jî navceya mawet hatye bajarê Silimanî. Mehwi ji sala 1830 ji Silimanyê ji daik bûye . Bi zarokîya xwe berê xwe daye xwendina ya hinbûna wanya olî û ji ber wî sedemênda gelên navçeya dî minak (sine – sablax-bexda) hatye seknandin . Mehwi paşnava wî ji beryêda (meşwî) bûye)¹²

Mehwi ji çuna xwe jibo Bexdayê çuye def Mela Mufti Zehawî piştî wî icazeya melayî ji wî wergirtye . Mehwi ji sala 1859 buye mamostayê mizgîfta Îmam Azem piştî

¹⁰ Husên, *Mehwinasî*, r. 32.

¹¹ Şiwan, *Helbesta Oli û Sofîgerî*, r. 345-358.

¹²Xefûr Fetah Sîlêman Bêdad, *Gulzarî Ş 'iranî Kurd*, Çapxaneya Çwarcira, Silimanî, 2013, I. 12.

qedandina sê sal vegerya Silêmanî . Wî buye andama dadgehê piştî mirina babê wî dest ji karên xwe berdaye ,wî berê xwe dide vegotina wanên olî bi feqêyan

Ji sala 1883 çuye heg(male xuda) piştê wî berê xwe daye istembûl we cuye hûzura Sultan Ebdulhemid Osmanî û sultan bi zanin û mehrifetên Mehwî pir keyf xweş buye daxwaz kirye ji Silimanî mizgeftên bi nava (xaneqayê mehwî) bi hête ve kirin)¹³

Xanqayên Mehwî buye gihên mezin ji bo witina waneyên olî û bilav kirina tezû fikrên sûfî, Mehwî ji sala 1906 koca dawî kiriye we terma wî ji yekên di taqa xaneqayên Mehwî hatye naştin.)¹⁴

1.5.Rêber û Bandorên li Ser Mehwî

Yek ji mercên rêbwarê sofîgerî divê rêberêkî wî hebedaku rê nîşanî wî bide û di wê geşta ruhî de hevdemê wî be û kelem û astengiyên ji pêşiya wî rake çimkî (felşeyxû lilmurîdîn emîn elilham, kema ene Cibrîl emîn elwehî, fekema la yexûnû Cibrîl fî el wehî la yexûnû elşeyxû fî elham.) Mehwî jî divê di vê tewerê de rêberêkî wî hebûbe, belgeya me jî bo rêber divê em pişt bi wan zanyariyan girêbidin ku di çavkaniyan de hatine tomarkirin. Herwihaew beytên şîrî yên ku amaje bo bûn û nebûna rêber dikin. Mehwî destpêka jiyana xwerêberê wî yê sofîgeriyê hebûlê piştê rêberê wî miriye ji sala 1880 z bêyî rêber maye, çimkî di xezelên xwe de giliyê bêkesiyê pirkiriye û ev yek eşkere ye ku Mehwî jî nalîn û hawara wî ye ji ber bê rêberiyê. Lê di heman demê jî gelek beythene ku bêhna bêrêberiyê ji wan têû amaje jî behsa (Şêx Behadîne Neqîşbendî) dikin ku wefat kiriye dûre Mehwî bê rêber dimîne.

Piştê jî kurê Şêx Hisamedîne kurê wî dibe rêber ku temenê wî 20 sal e, lê Mehwî nabe mirîdê wî. Lê di dawî de em dikarin bêjin çend beytên Mehwî hene ku şahidiya hebûna rêber dikin ligel wê jî beytên din hene ku şahidiya bêrêberiya Mehwî dikin. Mehwî jî her ji ber bêkesiyê dike qîr û hawar."¹⁵ Lê ew jî neşeartî ye ku bandora helbestvanên sofîzmê li derveyî edebiyata kurdî li ser Mehwî hebû, çî fars çî ereb, wek Hellacê sofî ku em dibînin pir amaje pê hatiye kirin, lê di şîrên Mehwî de Qelumensûr

¹³Alauddîn Seccadî, *Diroka Adebî Kurdî*, Capxaneyê Niştîmanî, Bexdad, 1971. Çapa Duyem, r. 361-362.

¹⁴ Ata'ullah Huwarî Neseb, *Diwanî Mehwî*, Întîşarat Kurdîstan, Sine. 1379,çapa Sêyem, r .8-9.

¹⁵ Huwarî Neseb, *Diwanî Mehwî*, r. 356-360.

ena el heq nekem di rastiyê de têgeha ena el heq gotineke bi navûdeng a Hellac e ku serê xwe li ser kir ku ev jî yek e ji nihênîyên heqîqetê ewê ku eşkere serê xwe ji bona eşqê datîne, dibêje:

**Ba heqîş bê lebo mensûr (ena elheq) heq nî ye
Şêtî ye mecnûn eger bê nazî Leyalyî bika))¹⁶**

Mehwî jî di heman demê de haya wî ji Ibn Erebi hebû di dîwana xwe de du caran amaje bi (el fitûhat elmekiye) ya Ibn Erebi kiriye û dibêje:

**Basî çî bikim cêkeranî behrî pîrr teşwîrî îşq
Taqe siwarêkî (fitûhat) e, rencîke (Mesnewî)**

Ev jî aşîniya Mehwî ligel berhemên Ibn Erebi nîşan dide. Herwiha bandora Mewlana Xalidê Neqîşbendî li ser Mehwî hebû Mehwî di sê cihan de amaje bi Mewlana Xalidê Neqîşbendî kiriye û dibêje:

Qesemî guêyî beçawî peçeda pîrî muxan

Ke le mewarid neybînê weiz qisey Mewlana

Ligel çend şairên wek Şêx Mehmûd Şeysterî ku amaje ye Gulşenî raz dike û ligel şairên wek Mewlana Romî ku Mehwî baş ji berhemên wî agehdar bû, amaje bi Mesnewî daye di şîrên xwe de. Herwiha bi berhemên Hafîzê Şîrazî û Sadî jî heydar bû."¹⁷

1.6. Têgihîştina Bûnê (Bûn – Mirov – Cîhan) li ba Mehwî

Di destpêkê de berî em behsa bûnê bikin, divê em bi awayekî sade behsa cîhan, jîyan û mirinê bikin. Ango berî bûna me, ev gerdûn û tiştên din ên ku hebûn, çawa hebûn. (Di destpêkê de divê em bizanin, hemû tiştên li esman û zevî hene malê afirînerê xwe ne. Afirîner an xaliqê zana û bi şîyan hebû, tutişt li zevî û esman nebû, tew dem jî

¹⁶ Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Ferhenga Sofîyane ya Dîwana Cizîrî û Mehwî*, Capxana Hacî Haşim, Hewlêr, 2010, r. 26 - 27.

¹⁷ Şiwan, *Helbesta Olî û Sofîgerî*, r.172.

nebû, çimkî dem ji bo Xwedê nîne û destpêk û dawî ji bo Xwedê nîne, wek ku di vê ayeta pîroz de hatiye diyarkirin (الَّذِي خَلَقَ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ فِي سِتَّةِ أَيَّامٍ) “Xudê afrênera asman û zavîyandaye bi şeş rojan da,” ango dem wê çaxê dest pê kir gava tişt hatin çêkirin û hebûna Xwedê tenê Xwedê bi xwe pê dizane û ti hebûneke din ji hebûna Xwedê ne agehdar e û divê em wê yekê jî bizanin ku hebûna Xwedê bêkêr dibû, çimkî hebûn û nebûna Xwedê ji wî bi xwe re wek hev e, ti sûd jê nedihat dîtin, tenê sûda wê di wê yekê de bû ku cîhan bi hemû laş û bûnewerên xwe sûd ji şîyan û zanebûn û lêborîn û soz û dilovanî û sîfetên din ên afirîner ji bo me biguhêze. Ev vîna afirîner bû. Ango berî bicihanîna cîhan û jîyanê, kesek nebû ku pêwistiya wî bi hejmartin û ragirtina demê hebe, meh û şev û roj û sal nebûn. Tenê Xwedê (Allah) hebû. Kes jî nikare rastiyan hebûna Xwedê fêhm bike û tutişt naşibe Xwedê, wek di sûreya ((سورة الشوري (42)) r. 11) 484 dibêje (لَيْسَ كَمِثْلِهِ شَيْءٌ) Wata “Hiç tiştên bi şeweya wî nîne.” jîyan û mirinê û pêwistiyên cîhanê û siberojê jî bîne hebûnê.¹⁸

Derbarê xuliqandin an afirandinê ku me berê jî behs kir, xuliqandin cara yekem ji Xwedê ve dest pê kir an rastir e em bêjin hate pêşkêşkirin. Xuliqandin bi baweriya (Cîlî û Ibn Erebi) ji wêneya Xwedê hatiye wergirtin. Ev wêne têkildarî zanista xwedayî ye, mirov nikare xuliqandinê şîrove bike. Xwedê cîhan afirand ji bo qudret û şeweya wî bê dîtin. Belge jî navên wî yên bedew in ku sîfetên govanî (şahidî) yan nasîna şeweya Xwedê ye ku, ev dîmen jî bibe sedema kifşkirin û hestkirina bi Xwedayê mezin û bawerî pê anîn û nasîna wî û ev sîfet rastiya cîhanê ye, ev cîhan jî ku hatiye afirandin wek çawa Hewa ji Adem hatiye çêkirin.¹⁹

Şîroveya van herdu filosof an sofî (mitesewuf)ên mezin derbarê mirov wiha ye (Însan jêderê hebûnê ye. Û di kitêba (Elkemat Elîlahiye) de hatiye ku însan wek Xwedê ye ((لَيْسَ كَمِثْلِهِ شَيْءٌ))²⁰

Ango heqîqeta çêkirin an bûna vê cîhanê, bûn an çêkirina mirov e. Nihêniya vê cîhanê û vejandina bûneweran tenê mirov e. (Mirov an heqîqeta mirov bi vî rengî tê dîtin

¹⁸ Hisên Salih Hacî Teratewenî, *Endîşeyên Min Bo Jîyanê*, Çapxaneya Baban, Silêmanî, 2015. Çapa Yekem, r. 14-15-16,

¹⁹ Elî Eşref Îmamî, *Muqayese ve Dîdga hay îrfanî Ebdulkerîm Cîlî ve Ibn Erebi*, Intişarat Besîret, Tehran. 1389, Çapa Yekem, r. 188-189.

²⁰ Yûsif Zêdan, *Elfikir Elsûfî Beyne Ebdulkerîm Cîlî we Kîbar Elsûfiye*, Weşanxaneya el Emîn, Misr. 1998 Çapa Duyem, r. 73.

ku îlahîbûna însan e ku bi rêya pîfikirina ruh ku ji aliyê afirîner ve bû, bi vê jî ji bûnewerên afirandî yê din cuda bûye. Bi baweriya Ibn Erebi, însan di asteke bilind de xwe dibîne û du aliyên mirov hene, batinî û zahirî (nepenî û diyar), heq di dîmena hemû bûneweran de ye, lê di însan de di asteke bilindtir û eşkeretir de ye. Ê Xweda di hemû hebûnan de reng dide. Ê her bûnek di asteke bilindtir û kemilîtir de be, Xweda bilindtir

û kemilîtir dibe. Ango heq di made, giya, riwek, ajal û însanan de bi rengên cuda heye. Lê sîfet û kirdeya îlahî di însên de ye. Wiha jî ji hemû bûnewerên din bêhtir xuya û berçav in. Tew mirov ji firîşteyan bilindtir in. Çimkî firîşte dîmena bedew a hev in, lê dîmena Adem di bedewî û mezinahiya îlahî de ye.)²¹ Ev hemû dirustkirin mirov bi roja dawî ve girêdide û herçiqasî Ibn Cewzî vê baweriyê red dike jî û hokarên girêdana derûna mirov bi dinyayê ve pir in û di hinava mirov de ye. Ê behskirina roja dawî karekî li derveyî zatê mirov e, anga tiştêkî li dijî meraq û hewesa derûn e. Ji wan hokarên ku mirov bi roja dawî ve girêdide, ew e ku Xwedayê mezin sînor û xweparastin jê re daniye û bezandina wê cezaya wê li wê dinyayê ye. Lê Ibn Cewzî wê gefxwarin û cezakirinê wek nihêniya serkeftina mirov di jiyane de dibîne. Ê belgeyeke din li ser girîng nebûna dinyayê û sereke dîtina roja dawî yan jiyana ebedî bo mirov ew e ku Xweda di Qur'ana Pîroz de dibêje (Kullu nefsin.....) yanî mirov û zevî ku du dirustkiriyan Xwedê ne, çî dinyayê ye li ba Xwedê bînirxtir e ji meheke mirar li ba xwediyê xwe. Ango eger em bi hûrbînî li dinyayê binerin, tenê zeviyê pehin û berfireh e, bûye cihê niştêcîbûna xelkê û mirov her dimirin û di axê de jî tîn veşartin. Yanî hebûna tiştan li vê dinyayê, bi taybetî mirov, girêdayî jiyana piştê ye. Wek ku Xweda di sûreya Hedîd de dibêje(وَمَا
(.الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِلَّا مَتَاعُ الْغُرُورِ)²² “xoşya jiyana hemî xururîyete lêbelê jiyana kurte mirin heye”

Lê mirin bêhtir girêdayî mirov û dinyayê ye, wek me berê diyar kir. Çimkî ev bûn wek ezmûnkirinê ye. Çimkî ev jiyana amadebûneke bo mirinê yan hebûneke bo mirinê yan azadbûneke bo mirinê. Ev bawerî li ba Mela Sedra û Ibn Erebi bi zelalî diyar dibe.)

²³ Heman ramanên hevta yê kêm zêde hene derbarê wê yekê ku pêwendiyêke bihêz a

²¹ Silêman Uludag, *Ibn Erebi*, Nîga Çap, Tehran, 1390, Çapa Sêyem, r.103-104.

²² Ibn Cuzî, *Ezmûnên Jiyane*, Çapxaneya Karo, Silêmanî, 2015, Çapa Duyem, r. 12-36.

²³ Mehdî Fidayî Mihrbanî, *Îstaden Der an Suy Merg*, Çap Xezel, Tehran, 1391, Çapa Yekem, r. 186

mirinê bi hebûna me re heye.)²⁴ Eger em di warê felsefeyê de behsa bûnê bikin, bi nerîna felsefeya hebûngerî, hebûn ji mirov dest pê dike, ku me berê bi kurtî behs kiribû. Me behsa mirov jî kiriye, qudsiyet û pîroziya mirov, mirov xwedî hest û wijdan e. Ev jî ne tenê wek ramanekê. Ev jî siruşt û mahiyeta mirov lêkolîn nake. Tenê hebûna mirov berî mahiyeta wî ye. Ango nihêniya afirandina mirov piştî afirandina laş/gewde tê. Bi rêya erk û hestên xwe wezîfeyên xwe fêm dike û wan cîbicî dike.

Yanî erk û cîbicîkirina wezîfeya mirov ji aliyê wî ve mahiyetê dide wî, rûbirûyî xwe dibe û diçe nav cîhana xwe, îmkanên xwe bicîh tîne û nas dike. Ango ev felsefe wek encameke siruştî ya mirov an encama piştî kirdeyên wî wek bûn nas dike) yanî mirov tiştê jê re eşkere be bi rêya hebûnê biha derdikevin holê.²⁵ Ango hebûn di nava me de ye yan bi me re ye, lê heta radeyekê nediyar û xerîb e, ne şênber e, lê tevî vê yekê jî bûn tişteke me dorpêç dike û giyanê me pêk tîne. Mirov bi xwe hebûnek ji diyardeyên hebûnê ye, yanî hebûn li her cihî û di her mewcûdekî de heye. Wek hebûna tiştên din ên mirov, amûr û ... hwd, lê dema behsa hebûnê tê kirin behsa hebûneke taybet tê kirin ku mirov e.)²⁶

Ast û cureyên bûnê jî hene, wek mînak bûn di xwe de, bûn ji bo xwe. Lê antolojiya çiyetiyê lêkolîn dike, ango bihayan. Biha jî di bûna ji bo xwe de ne. Ev jî dibe mijara psîkolojiya hebûngeriyê ku vekolîneke rewîştî/exlaqî ye. Ê da mirov bibe Xwedê, divê em bibin mirov. Eger wiha be tê wateya ku em li ser zemîna rewîştî rawestiyane. Ji bo bûn ji bo xwe divê xwegehî di serbestiyê de pêk bîne, pêkan e di rewîştên xwe de tûşî dudiliyê were, lê divê jê rizgar bibe. Bi vî awayî serbestî derdikeve holê. Hebûn û paqijiyê hebûna di nav xwe de peyda dibe.)²⁷

²⁴Ibrahîm Ehmed. *Işkaliyet Elwicûd Elteqniye Inde Martin Heidegger, Menşûrat elixtîlaf, 2006, Çapa Yekem, r.71.*

²⁵Jean-Paul Sartre, *Bûn û Nebûn*, Weşanxaneya Serdem, Silêmanî, 2011, Çapa Yekem, r. 623.

²⁶Emced Emîn *Ebdula ,Bûn/Hebûn di helbestên Mehwi de*, Çapxaneya Tîşk, Silêmanî,2008 Çapa Yekem,r, 13.

²⁷Sartre *,Bûn û Nebûn*, r. 624,

1.7. Bûn li ba Mehwî

Bêguman Mehwiye xwedênas jiyana dinyayê girîng nedîtiye. Çimkî serkeftin û birin di jiyana dawî de ye û jiyana dinyayê jiyanêke demkî ye û dixwaze ber bi jiyana cîhana rasteqîn an jiyana hetahetayî here.)²⁸ Mehwî hewl dida bizane û fêr bike jiyana çî ye û hebûna wî li jiyana tê çî wateyê û qonaxa piştî jiyana çî ye. Mehwî bi van pirs û mijaran daketibû. Mehwî li ser xwe ferz dîtiye erk û pîşeya xwe ya mirovî cîbicî bike û bersiva van pirsan bide. Lê beriya hertiştî divê em hebûna Mehwî zelal bikin û naveroka wê diyar bikin. (Tehrûbeyaya jiyana Mehwî li ser nexwestin an redkirina dinyayê û li ser tirsê ji Xwedê “teqwayê” radiweste, bi armanca paqijkirina derûna xwe. Redkirina dinyayê li ba Mehwî ji rahênana ruhî di navbera Mehwî û Xwedê de birêkûpêktir bû.)²⁹

(Mehwî ji dawîhatina dinyayê pir miqate ye û bi hûrbînî pê re tevdigere, çimkî dizane hemû hebûnên vê dinyayê ku mirov wek destkeft dibîne di jiyana de bê qîmet in û dawîya wan tê û tune dibin. Tu yek ji van nikarin di jiyana de berdewamî û dirêjîyê bidin temenê xwe. Hertişt destpêk û dawîya wê heye. Hebûn çî baş û çî xirab û hevdi, dikevin qalibê fena û nemanê de.)³⁰

Çimkî hertiştê ku ji aliyê Xwedayê mezin ve hatibe çêkirin dawîya wan heye. Tew ev zemîn jî ku berê nebû, berî hebûna mirov hatiye çêkirin, tevî hemû dar û giya û riwekan temenê wan bidawî tê û dimirin. Xwedayê mezin di sûreya (فاطر) (9) rûpela 435an de dibêje (فَسُقَاتُهُ إِلَىٰ بَلَدٍ مَّيِّتٍ فَأَحْيَيْنَا بِهِ الْأَرْضَ بَعْدَ مَوْتِهَا) “Xwedê ye yê ku bayan ku dişine û ewran dixa bizavê. ha bi vi awayî wan dişinine de vera mirî (hişkbuyî) û piştî hişbuna erdê em disa wê hêşîn dikin. Herwisa em miriyên piştî mirinê sax dikin”

Herwiha di sûreya (ياسين) (33) r. 442 dibêje (وَآيَةٌ لَهُمُ الْأَرْضُ الْمَيْتَةُ أَحْيَيْنَاهَا)³¹

“erda mirî (ya hişk û hola) ku em wê sax (û hêşîn) dikin û em jî hep û tene derdixin, vê ja ew jî dixun (û pê dijîn), jib o wan nişan û delile (ku xûdê dikare ji gorn ji miryan sax rake”.Ango Mehwî miqate bû ku hemû hebûn dimirin (Hemû tiştên ku me

²⁸ Îbrahîm Ehmed Şiwan, *Mehwîname*. Çapxaneya Minare, Hewlêr, 2010, Çapa Duyem, r. 31.

²⁹ Sebûr Ebdilkerîm Şîkar, *Rengdana Kesayeti û Felsefeya Helac di Helbesta Klasîk a Kurdî û Farsî de*, Çapxaneya Tehran, Silêmanî. 2014, Çapa Duyem, r. 20.

³⁰ Umer Ezîz Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yê Mewlana Mehwî*, Çapxaneya Ezmer, Silêmanî 2012, Çapa Yekem, Cildê Çarem, r. 125.

³¹ Hisên Salih Teratewenî, *Ezmûnên Min Bo Jiyanê*, Çapxaneya Baban, Silêmanî. 2015, Çapa Yekem, r. 79-80.

behsa wan kir, bi tekane şîfreke fantazî û bi bîr û baweriyeke tesewufî û felsefî nîşan dide ku hertişt pûç û bê naverok û hîç e:

Menaze be bûn, megirî bo nebûn

Hîçyan ta ser nîn, çi bûn çi nebûn

Ango hertişt bi bîr û felsefeya helbestvan ve ligel destkeftên jiyane, dewlemendî û feqîrî û bedewî û kirêfî û karên din ên jiyane hîç û pûç in. Mehwî di helbesteke din de dibêje:

Bese, naz meke...beser zewiya

Diwa car xorakî...le yek parûya

Ev şîra wî amajekirin e bi sureya (لقمان ,18) Qur'ana Pîroz ku Xweda dibêje (وَلَا تَمْشِ فِي الْأَرْضِ مَرَحًا إِنَّ اللَّهَ لَا يُحِبُّ مَنْ كَانَ مُخْتَالًا فَخُورًا) Ango Xwedê ji mirov re dibêje “bi qurretî û kêf û xweşî li ser erdê birêve neçe çimkî Xwedê ji kesên pozbilind û qurre hez nake)³²

Ango ey Adem bi mejî û hişekî hişyar li dinyayê tevbigere çimkî tê tûşî sergêjî û bêhêvîtiya psîkolojîk bibî. (Yanî Mehwî ne tenê dinya û cîhan pûç û hîç didît, lê xwe jî hîç didît, xwe dişibîne heywanan çimkî ne hebûneke hetahetayî ye û mêvan e tê de. Mehwî dibêje:

Gufta to kemî astî z kuca ta be kucayî

Guftim ke man hîç z hîç amede ta hîç

Yanî: Bi laqirdî ji min re got! Tu hîç û bê giranî yî, tu ji kû ber bi kû ve diçî?

Min got ez bi xwe hîç im û ji hîçiyê hatime û ber bi hîçiyê diçim. Di malikeke din de dibêje:

Dinya heme hîç ast welî hîçtir az wî

Mayîm ke der baxte îm în heme ba hîç

Yanî: Cîhan hemû hîç e û ji wê hîçtir jî em in ku me hemû serwet û samana xwe ya ruhî û madî li ser wê kiriye û encama wê jî dîsa hîç û pûç e)³³

³² Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî*, r,127-129.

³³ Şiwan, *Mehwîname* .r.61.

(Ango li gor Mehwi di vê dinyayê de şeweya mirovan û kesayetiyên wan du cur in, baş an xirab an bi awayekî zelaltir Mehwi hebûnê bi du cureyan şrove dike, hebûna resen û hebûna neresen. Mehwi li gor ku xwediyê vî laşî ye yan ev hebûna Mehwi li vir radiweste li gor şiyar û têgihîştin û hizr û îmkanên xwe, bi vî rengî jî cureya bûna xwe diyar dike.

Demê Mehwi deriyê derveyî yê laş di rûyê derve de girt, deriyê navxweyî di rûyê laş di rûyê hebûna resen de vedibe. Li vir deriyê derve hebûna neresen e û ev cureya resen bi vebirîna ji derve, di kûrahiya Mehwi de derdikeve holê. Xwediyê çend şiyar û îmkanên resen e ku hino hino wan bicih tîne. Lê hinek caran Mehwi bi xwe ji ber bandora derve, yan îhmala xwe deriyê derve yê laşê xwe di rûyê hebûna biyanî û neresen de vedike, rê dayê bê nav laşê wî, bi vî rengî jî hem laş û hem cureya wî jî reseniyê ji dest dide. Mehwi hest bi nearamî û rahejinê dike, bêzar dibe û zûbizû agehdar dibe û dixwaze ji wê hebûna sexte rizgar bibe û derxîne derve û ev jî ne hêsan e.

Mehwi pê re dikeve berberiyê de heta ku bi xwe bi ser dikeve ango bûna resen carekê jî bûye neresen, hinek caran dua ji Xwedê dike da wî efû bike û vegere ser bûna xwe, yanî bûna resen. Wek mînak Mehwi hinek caran helbest bi farsî dinivîsand, hesteke wiha li ba Mehwi dirust kiriye ku hest nekiriye bi bûna xwe, çimkî ew yek ji bîr kiriye ku Kurd e û divê bi kurdî helbestan binivîse. Mehwi dibêje:

(Kurdî zubanî esilme ger terkî kem be kul

Bo farsî be kullî emin debime bê wefa

Yanî: Kurdî zimanê min ê eslî ye, eger ez ji bo farsî dev ji kurdî berdim, ezê wê çaxê bibim mirovekî nankor û bêwefa. Nankorî sexte ye, divê vegere bûna xwe, eslê xwe ku zimanê kurdî ye û divê helbestan ne bi farsî, lê bi zimanê kurdî binivîse.)³⁴

Mehwi dixwaze bi rêya terikandina dinyayê û derve ji bûna xwe ya resen ku (yar) (yar – bûn) pir jê nêzîk e bidest bixe, amade ye jî ji bo hatina yar (yar = Xwedê) serê xwe li ber piyê wî deyne, yanî bi derneketin û nehatina yar, Mehwi piyê xwe radide nav deriyê derve, pêşwaziyê li bûna sexte dike.

³⁴Mihemed Emîn Ebdula, *Bûn/Hebûn di Helbestên Mehwi de*, Çapxaneya Tîşk, Silêmanî, 2008 , Çapa Yekem, r.35-37.

Delê niyazme berpêfî xem serim, fermûy

Be naz û işwe: Şehî bo geda ke nada destî

Yanî: Mehwî pir ji yar nêzîk e, rasterast berê xwe dide yar, dibêje ez bendewarê te me, her wextekî tu hatî ezê serê xwe deynim ber piyê te, ango yar nebû bûna sexte di Mehwi de derdikeve, Mehwi jî amade ye ji bo derketina yar serê xwe deyne ber piyê yar. Dibe ku yar jî xwe nîşanî Mehwi nede çimkî divê beriya dîtina yar, Mehwi dev ji dinyayê û arezûyên dinyayê berde, piştîre yar dibîne. Bi nehatina yar Mehwi ji bûna resen dûr dikeve û xem û kovan û êş û azar digrin ser wî û dibêje:

Delê Be ahim ger reqîbanit bisûtên ey gulî reena

Merence tuxuda şûele le aqarî çiqil çibka)³⁵

1.8. Dîtina Dinyayê li ba Mehwi

Divê em wê yekê bizanin ku Xwedê bi qudreta xwe û mezinahî û zanatiya xwe, ev mexlûqat di vê cîhanê de dirust kir. Bi vî rengî jî bi bexşîna xwe li kesekî yan aliyekî li gor pêwîst bi dinyayê nedaye yan bi efûya xwe pê daye, lê dirustkirina wan li dinyayê herdem di pêwîstiyê de ne bo bexşînên Xwedê, da em mirov hest bi mezinahî û qudreta afirîner bikin, ji wan re eşkere dike ji dewlemendiya Xwedê û dayîna rizq û qût ji aliyê Xwedê ve. Lewra wiha însan dirust kiriye yan siruştî mirov wiha ye, ji hemû zindîwerên din hewcedartir e yan em bêjin ji bo mabûn û berdewambûna li jîyanê herdem di pêwîstiyê de ye. Xwedayê mezin dibêje di sûreya 28) (وَأَخْلَقَ الْإِنْسَانَ ضَعِيفًا) نساء, “yanî însan zeîf aferandiye”. Vêca sebir ku mirov pir caran jê bê par e, yanî ew tişt e ku jê aciz bûye, ango mirov ji hemû bûnwerên zindî yê din bêhtir wiha derketiye ku bêkêr an jîderbketî tê ber çav. Ji ber vê yekê pêwîstîbûna te bo tiştêkî ku ango tu hejar î ji hebûna wî tiştî, lê tevî vê yekê jî gelek nîmet li ser mirov hatine barandin û tevî vê hemû aciziyê, Xwedê mezintirîn dilovanî bi mirovan kiriye û eql daye mirov.

Eql li vê dinyayê hokarek e bo veğerandina pêwîstiyên. Van hokar û pêwîstiyên wiha kiriye ku bêyî van pêwîstiyên, jiyana mirov dijwar bibe û di heman demê de

³⁵ Ebdulah, *Bûn u Hebûn*, r.41-57.

derdora wî bi saya eql gelek nîmet li ser barandiye. Yanî dinya bûye cihê kar û teklîfê û cihê dawî (dar el axîre) bûye cihê mabûn û ceza û xelatkirinê. Lê ev nayê wateya ku kê dev ji fizûliyet û nefsa xwe berde karekî baş dike û yê ku jê hez bike karekî xirab dike. Na, lê pêwîst e bi saya eql xwe derbas bike. Hedîseke pêxember heye dibêje (Ne baş e tu ji bo axiretê dev ji dinyayê berdî. Di axiretê de dinya tune. Baştir e û xêra wê bêhtir e tu herdu dinyayan bidest bixî.) Herwiha Îmamê Elî dibêje ku dinya mala xêrkaran e, mala wan kesan e ku baweriya wan bi xêrê heye, cihê rizgarbûnê ye.)³⁶

Li vir beriya ku em herin nav olê, li dinyayê herçiqasî di yasayên me de me bal kişand ser hinek ayet û hedîsan jî, çimkî bihêztirîn tuxm li vê dinyayê ku ji me re maye ol e. Olê gelek dil û mejî kirine alîgirê xwe û ber bi xwe ve kişandine. Piştî rêyeke din peyda dibe ku ew jî zanist û ol e. Piştî nakokiyê, zanist û ol peyda dibin. Lê milletên ku xwediyên ola îslamê ne dibe ku kêmtir tûşî bandora wê nakokiyê bibin. Çimkî perwerde û geşbûn û şêwe û teşe rêveçûna mejî û hizra me di feza û jîngeha olî de çêbûye, lê ne bi wê wateya ku bandora wan li ser me kêmtir e, lê bi wateya ku em guh nadin vê berberî û nakokiyê. Ango wicûda wê heye, lê hatiye piştguhkirin. Ev jî ne mumkin e. Çimkî nabe mirov bêyî lêkolîn û xwendin bigihe encama dawî³⁷

Di ola îslamê de rastî û heqîqeta dinyayê ji me re hindik û rindik hatiye şîrovekirin. Di vê hev kêşeya dinyayê de ku mumkin e hin kes ji vê dabeşkirina dinyayê li ser mirovan nerazî bin û giliyên wan hebin. (Lê ola îslamê ji me re dibêje dilgiran nebe dinya tiştê herî kêmtir û kirêt e ku tu ji bo wê dilteng bibî. Xwedêdi sureya زخرف,33,r 492, bi xwe biryarê li ser tiştêkî dide ku nîrxê wê li ba evdê wî ye li dinyayê û di axiretê de, dibêje وَلَوْلَا أَنْ يَكُونَ النَّاسُ أُمَّةً وَاحِدَةً لَجَعَلْنَا لِمَنْ يَكْفُرُ بِالرَّحْمَنِ لِبُيُوتِهِمْ سُقُفًا مِّنْ فِضَّةٍ وَمَعَارِجَ عَلَيْهَا) “Eger ji ber hinjeta însan hemu (li ser kufrê) yek millet biminin ne bûya, medji bo wan eyn ku Xwedê nkar dikin, banê xaniyên wan pêlkên ku bi wan hildikşin jûrê jî ziv çêkirbûna.) û herwiha di heman suret (35) dibêje(الْحَيَاةُ الدُّنْيَا وَإِنْ كُلُّ ذَلِكَ لَمَّا مَتَاعٌ) (وَالْآخِرَةُ عِنْدَ رَبِّكَ لِلْمُتَّقِينَ) “me dê wan dinava xemlên zêrda noq bikrana . ev hemû tenê pertalên jiyana gihanên biwe xtin(ku demêke wan î ve birî heye). Qengîya axiretê jî li gem xwedê ya te ,tenê ji bo mutteqîyan e” .

³⁶Ebû Hesên Elî Bin Mihemed Bin Hebîb elbesrî Elmawerdî , *Edebu 'd-Dîn we 'd-Dunya*, Daru'l-Kutubi'l-Îlmiyye, Beyrût, 1987, Çapa Yekem, r. 107-108-109 .

³⁷Ebdilkerîm, Siruş, *Eql û Îman*, Çapxaneya Genc , Silêmanî, 2009, Çapa Yekem, r.11-12.

Ango ev xerabata dinyayê ye, ev hev kêşe zelal û eşkere û dadmend e, yê ku dixwaze razî be bila razî be, yê nebe jî bila nebe çimkî nikare li vê dinyayê xweşiyê ji dirhem û dînar û otomobîl û avahiyan bibîne, lê xweşî xweşiya îmanê ye, xwedê di sureta (هود) 15-16. dibêje

مَنْ كَانَ يُرِيدُ الْحَيَاةَ الدُّنْيَا وَزَيَّنَّتْهَا نُوفَتْ إِلَيْهِمْ أَعْمَالُهُمْ فِيهَا وَهُمْ فِيهَا لَا يُنْحَسُونَ
أُولَئِكَ الَّذِينَ لَيْسَ لَهُمْ فِي الْآخِرَةِ إِلَّا النَّارُ وَحَبِطَ مَا صَنَعُوا فِيهَا وَبَاطِلٌ مَّا كَانُوا يَعْمَلُونَ³⁸

“Çî kesê jiyana dinyayê û xemla wê bixwaze, em ê bêtêmasî, beranberî karên wan lî dinyayê bidin wan û lî dinyayê tiştêk lî wan nayê kêmkirin, Ha ew in yên ku jî bo wan lî axiretê ji êgir pê ve tiştêkî din nin e ş yak u wan (li dinyayê) kir berhewa çu ş karê kuwan dikir puç ş betal bş” hekesek xeşy û gwanî jiyana dunya dixwazê jî dinya ya axiretda gihên wî agire cezaya xwe bi şeweya ahmala xwe ji dinyada wedigre

Ango divê di vê jiyana de bi îrade bijîn, hilbijartinek ji eql be, ji bo nêzîkbûna me ji Xwedê pêwist e em di aramgirtinê de bin û bê ku bandora arezûyên dinyayê li ser me bibe.

Xwedê di sureya (انفال) (46) dibêje (إِنَّ اللَّهَ مَعَ الصَّابِرِينَ) “Bêgûman Xwedê di gel sebirêşane”. Eger em berê xwe bidin jiyana sofî û arifan, emê bibînin ji bo gihîştina nemiriyê di vê jiyana de mirina mirovî û nefsê dikan. Li ser zimanê Şêx Ebdilqadirê Geylanî dibêje (Ez carekê tûşî diltengiyê bûm, min xwe livand û min daxwaza asûdeyî û vejandina laşê xwe kir. Ji min re got tu çî dixwazî? Min got ez mirinê dixwazim ku jiyana tê de nîne û jiyana ku mirin tê de nîne. Ev nemiriyê ruhî ye. Li vir mebesta wî sîfetên xirab û rizgarbûna ji wan e ligel ceribînên zêdetir em fêr dibin.

Divê tu vê biceribînî. Ji wan jî sûdên rewîştî heta digihe zuhdê ku veqetîna laşê mirov ji tiştên heram e, ev jî bi rêya bihêzkirina bawerî û teqwayê, ku ew jî di rêbazeke cihgirtî de li dinyayê, ji belayên dinyayê û planên şeytên rizgar dibe û dest li behra kesên din nade, lê ji behra xwe dixwe ku Xwedê jê re kiriye qismet. Bi rêya hejarî û şewitîna ji bona buhiştê Xwedê. Hezkirina dinyayê xwe di hezkirina axiretê û Xwedê de dibîne, piştî terikandina dinyayê ji aliyê evdê wî ve, yanî gihîştê xweşiya dayîmî (زالت الغموم والاحزان) (عن قلبه وجاءته الراحة والطيب والانس بالله)

³⁸ Aîz el Qernî, *La Tehzen*, Mektebet el Ibîkan, Riyaz, 2004, Çapa Çardehan, r, 315-316-317.

xidû girtîn(الانس بالله)hat” Pêxember Hezretî Mihemed jî dibêje (الدنيا سجن المؤمن و جنة الكافر) “Dinya zindana mûmin û buhişta gawiran e”³⁹

1.9. Dinyabîniya Mehwî

Dibe ku dinya li ba gelek kesan ji nan, paye, pere, desthilata darayî, malê dinyayê, zengînî, destkeft, qezenc û xweperestiyê pêk bê. Lê di heman demê de dinya li ba hin kesên din cîbicîkirina peymanekê, sadebûn, xweparastina ji karên xirab û tawan û karên heram e ku ev jî rûyê dinyayê yê bedew û şêrîn e, wek Mehwî dibêje:

(Ciwana û şîrîne eger dinya be rûda mîhrebana

Werdî xare, şehdî zehrî mare, ehdî bê sebat)⁴⁰

Dinya li ba Mehwî eger te xwe teslîmî dinyayê kir, dinya te ber bi jinavçûn û têkçûnê ve dibe. Belkî bi berovajî tu hebûna xwe ji dest didî. Mehwî di wê baweriyê de ye ev aliyên me di jiyane de çi dewlemendî çi feqîrî qeşeng û tiştên bidestxistî yê vê dinyayê çi hebûna wan hebe û nebe, bi aramî hemû ji nav diçin, wek ku di vê helbestê de dibêje:

(Menaze be bûn, megirî bo nebûn

Hîçyan taser nîn, çi bûn çi nebûn)⁴¹

Li gor Mehwî, li vê dinyayê bûn û nebûn, ne hetahetayê ne û heta dawiya jiyane ji mirov re namînin, êdî çima pêwîst dike mirov xwe pê ve girêbide, yanî pir caran tiştên heyî xweşiyê didin mirov, lê pir caran jî mirov bi nebûna wan tiştan pir kêfxweştir jî bûye, di jiyane de jiyaye û bi berdewamî ji hundir ve kêfxweş û şa bûye.⁴²

Dinyabîniya Mehwî pir caran cuda bû ji helbestvanên din ên beriya xwe çimkî bi mînak û tecrûbeyên xwe yê rasteqîn, pûçî û hîçîtiya dinyayê ji me re teqez kiriye. Em dikarin bêjin Mehwî di hemû temen û jiyana xwe de, di warên psîkolojîk û hişmend û

³⁹ Irfan Ebdilhemîd Fetah, *Sewret el Ruh*, Daru'z-Zebîe, Qahîre, 2014, Çapa Yekem, r. 69-70.

⁴⁰ Ebdula Ezîz Xalid agirin, *Derbarê Mehwî yê Lûtkeyê*, Rêveberiya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan Silêmanî 1986, Çapa Yekem, r.101.

⁴¹ Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî*, r. 127.

⁴² Şahîn, *Mehwînasî*, r. 15-19-20.

moralî yên jiyanê de hertim li ser pûçkirin û hîçandina dinyayê kar kiriye. Mehwî û ramana Mehwî li ser dinyayê pir reşbîn bû. Lê tevî vê yekê jî em nikarin bêjin Mehwî li hember dinyayê ne geşbîn bû, belê, Mehwî li hember dinyayê geşbîn bû jî û dibêje:

(Ewene teng û naxoşe dinya)

(Xoşe derçûn, eger çî bo seqer çîn)

Dinya li ba Mehwî hinek deman ji cehnemê pir xirabtir bû, ku eger mirov jê rizgar bibe ku here dojehê jî dîsa qezenc dike.

Bi vê hev kêşeya Mehwî, ji me re zelal dibe ku tu demekê ku em dizanin dinya ji tukesî re namîne, divê em mineta wê hilnedin û serê xwe li ber destkeftên jiyan û dinyayê neçemînin, çimkî ewlehiya dinyayê tune û her dema bixwaze mirov bilind dike û her dema bixwaze mirov berjêr û nizm dike. Mehwî dibêje:

Zemane beize satê lepir ke heldebirê

Ewende heldeperêt heta legel debirê

Beyek dû kilke berew jûrî birdewe dinya

Be taqe nuke şeqêkî firê deda le pirê

Mehwî bê emanetiya dinyayê teqez kiriye. Di dawî de wek pend wergirtin bêhtir xistin e ber çavê mirov ku dinya ji kesî re namîne. Eger mirov bibe desthilatdarê herî mezin an zengîn û dewlemendê herî mezin. Mehwî mînaka kes û desthilatdarên wiha wek pend û nimûne tîne da ew yek bêhtir li ba mirov zelal bibe ku pile û payeya dinyayê heta hetayê namîne û ji kesî re nemaye û di dawî de serê wî dixwe. Mehwî dibêje:

Role ger hez dekey bîte şakur

Pendî Mehwî le gwêgire wek dur

Merdî azade, qet merencêne

Kûlû şeyen wela şetîmetû hur

Yanî lawo yan canê min, tu dixwazî bibî şah an padîşahê kuran û kurekî diyar û mezin û jêhatî, guhdariya pendên Mehwî yan şîret û gotinên wî bike û wan di guhê xwe de bike cewher û morîk û mercan, da tu kurekî merd derkevî û stûyê xwe li ber tiştên xirab neçemînî, dilêr û serbest bijî li ser erdê, wek pend û mînaka riswabûna Fîrewn û Nasir Paşa, Iskender û Daryuş wek mînak aniye, îbretê ji wan kesan werdigre. Mehwî dibêje:

**(Ehlî îbret mawe ger bê, seyrfî Nasir Şa bikat
Dû le dû, sê kem şehî kird we kişêkî rê nehat
Hatî wa seyrfî nehatî ken ke sed tîpyan siwar
Pasewanî bûn, lenaw besta pyadiye kirdî mat**

Li vir behsa Nasir Şah dike ku dora 25 salan desthilatdarî kir û di lûtkeya qûwet û hêzê de bû, sed rêz pasevan û keleheke wî ya asê wek polayê hebû, lê di dawî de peyayekî devrût û tazî li hember wî derket û ew kuşt. Ev bûyer jî bû pendeke baş a dem û dewranan.

Mehwî di helbestêk din de dibêje:

**(Çû ew Fîrewne hîze bo cehennem, qur beser Haman
Debê esbabî zûtir çune xizmet ew bida saman
Lewane û hem le emsalî ewane yarebî her an
Cehennem pirken cennet tehî bê bo musulmanan))**⁴³

Ev bûyerên li jor ku Mehwî behsa wan kir ji riswabûna zeman pêk tê, bê çawa emana dinyayê ji tukesî re nîne û kes nikare baweriyê bi dinyayê bike.

Mehwî dibêje:

**(Ew mesxerey zemanê be şah û wezîrî kird
Ew ketine qet melê ke be geda û feqîrî kird
Kilkêkî pêwe kird berew jûrî jûrî bird
Tê helda şeqê serew jêrî kird**

Eme mesxerey ya galtekirdinî gerdûneke be padişah û wezîrî deka)⁴⁴

Bi baweriyê Mehwî eger dinya bi te re kenîya stûyê xwe jê re neçemîne û eger dinya bi te re nekenîya xema wê nexwe û dilgiran nebe. Dibe ku mirov xweşiya dinyayê wek xweşî fêhm bike, lê di axiretê de ew mirov hildiweşîne. Mehwî dibêje:

**(Be zerd û sûrî dinya zerdewalet lê negorabê
Be hengî tê bigey, her nîşe, nîşêkî nî ye zembûr)**

Lewra di dawî de Mehwî dibêje, beriya ku xweşî û destkeftên dinyayê bi mirov ve bidin û mirov piştê hesretê bikşîne li ser stû çemandina li pêşber kêra dinyayê, êdî divê

⁴³Umer Ezîz Mehwî, *Felsefeya Çarînên Mehwî*, Çapxaneyê Çarçira, Silêmanî, 2005, Çapa Yekem, r. 31-75-137.

⁴⁴Mihemed Mela Kerîmî Muderis, *Dîwana Mehwî*, Çapxaneyê Hisam, Bexda, 1984, Çapa Duyem, r. 336.

mirov beriya serkeftinê ber bi rûyê dinyayê neçe û wê hembêz neke û dev jê berde.
Mehwî dibêje:

(Ta ser nebûwe bego, le dinyade to şeqê

Her em şeqe bekare kewa heldirê le hîç)

Bi baweriya Mehwî, tu nirx û bihayeke dinya û jiyanê tune, mirov karekî çewt dike eger dinyayê hembêz bike, çimkî zû yan dereng dinya serê mirov dike gok û pê dilîze. Êdî Mehwî dibêje bila mirov bi xwe dinya û jiyanê bike gok û wan bide ber pehînan) ⁴⁵

Bi nerîna Mehwî, divê dinya tenê ji yek alî ve bê hembêzkerin, ew jî tenê bikaranîna wê ji bo peristina Xwedê û zîkra wî ye, yanî tenê nasîna Xwedê karê mirov li vê dinyayê be. Mehwî dibêje:

(Mehwî hîç kes menase, binase Xuda û bes

Zîkrî yekê ke, mare, meke basî çar û mar) ⁴⁶

Çimkî ev dinya tenê ji bo wê yekê hatiye çêkirin ku em bi rûyekî spî jê rizgar bibin, ji qeyd û bendên dinyayê ku herçî derketina min ji vê dinyayê zûtir be, Xweda hesabeke mezintir jê re dike, rêz lê digre, ji bo vî karî jî divê em xwe bi dawa mirinê bigrin, hez û arezûya me lê be, çimkî bi baweriya wî mirin rizgarbûn e ji vê dinyayê, û çûna nav dinyaya axiretê û jiyana ebedî ye, yanî mirin pêkhêner û dirustkera xweşiyar e, ango arîfîna Mehwî li vir teqez dibe çimkî arîfîna dinyayê wek qefes û rekeheke ruhê mirov dibînin ku laş qeyd dike, mirov jî tekane heza wî ya hertimî û niştimanê wî yê resen dostê heqîqî ye û deriyek e bo mezinbûnê, bi şertê ku em kelûpelên wê rêwîtiyê misoger bikin û em ji wê rêwîtiyê re amade bin û bi dilbijîn li vekirina wî dergehî binerin.) ⁴⁷ Mehwî di din de dibêje:

(Dû espe menzilt pê tey deken, ta ser hedî mirdin

Be dîqet Mehwî tîfikire, şew şebdêze, roj eşeb)

⁴⁵Agiri, *Derbarê Mehwî yê Lûtkeyê*, r. 106 -107.

⁴⁶Qeredaxî, *Mehwî di navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, r. 40.

⁴⁷Ehmedî Mela, *Mehwî di Navbera Zahiriyet û batinyetê de*, Çapxaneya Rojhelat, Hewlêr, 2013, Çapa Duyem, r. 110.

Mehwîyê arif wiha li dinyayê dinere ku dinya du dergeh an derwaze ye, dergehek ji wan jîyan û hatina nav dinyayê ye û dergehê din jî mirin e.

Li vir espê şew şebdêze çûna dinyayê ye bi wî hespî û xirabiyên mirovan e, hespê roj eşeb jî çûna nav dinyayê ya mirov û kesên çê nîşan dide, bi wan karên çê û qenc li ser hedê mirinê û roja heşrê kesê maqûl û çê ligel bi hesab û kîtab tê.)⁴⁸

Ango dinya ji nerînegha olî ve bi Mehîwî ve hatiye girêdan. Em dibînin tenê li cihekî piçekî bi dinyayê geşbîn bûye û ew wek çiraxan binav kiriye û dibêje:

Le tarîkî şewî kufra beyek dem lemêkî da

Hezar û sê sed û bîst û dûwe, dinya çiraxane

Mebesta wî jê sala koçkirina pêxember ji Mekke bo Medîne, dinyaya wî hemû wek şevê reş bû, ereban pût diperistin heta çax gihîşte 1322 dinya bi ronahiya misilmantiyê rewşen û ronak bû û wek çiraxanê lê hat)⁴⁹

Şîroveya me ji bo vê helbestê ango (tarîkî şewî kufir – tarîtiya şevê kafiriyê) tarîtiya şevê yan şeva tarî berovajî roja ronak e. Ji roja ku mirov Xwedê nas dike, dinya yan cîhan rewşen û ronîdar dibe, ronahiya çirayan pêxistiye, bûye çiraxan)⁵⁰

Mehîwî her derbarê wê hîcretê dibêje:

(Le feyzî hîcretda asmanî “bedir”, em şew hilî bûn

Sibey her yek bûwe bedirêkî kamîl ew hîne

Çi hîcret? Şehrê weslê, aramiya can e bo hewadarên xwe, her ev beyt jî girêdayî hîcretê ye ku me berê behs kir, ew hîcreta ku dinyaya wî kir çiraxan, bi gihîştina pêxember û hevalên xwe bo Medîne, weke gihîştina hezkiriyên bû, pir xweş bû, ji hungiv xweştir bû, ew hîcret bû sedema aramiya giyan.)⁵¹

Ev behskirina Mehîwî ji wê yekê peyda dibe û me digihîne qenahetekê ku dîn û dinya du tiştên girêdayî hev in, dinya ji bo wê yekê ye ku tu qurbaniya qenciyê ji xwe re jê deyn bikî da ku tu bi pakî û serfirazî herî ber dîwana Xwedê.

⁴⁸Umer Ezîz, Mehîwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehîwî*, Çapxaneyê Ezmer Silêmanî, 2012, Çapa Yekem, Cildê Sêyem, r. 52.

⁴⁹Neseb, *Dîwana Mehîwî*, r. 464.


⁵⁰Umer Ezîz Mehîwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehîwî*, Çapxaneyê Ezmer, Silêmanî, 2012, Çapa Yekem, Cildê Yekem, r. 134.

⁵¹Tehsîn Heme Xerîb, *Ruhê hikmet û Nûra îrfanî ya Mehîwî*, Rêveberiya Giştî ya Kitêbxaneyan, Silêmanî, 2012, Çapa Duyem, r. 231-237.

Di piraniya helbestên Mehwî de me wênekirina dinyayê kişandiyê (dinya hatiye şibandin bi “behra fitneyê, jina nanopêj, tewehşistan – hovistan-, jina xwefiroş, ewra belav, xerabat, tiyatro, zenbûr...hwd) ku emê di beşên din de behsa wan bikin. Yanî dinya ne dawîtirîn menzilgeh û wargehê mirov e. Lewra Xwedê dinya ji bo ezmûnkirina mirovan birêk xistiye, ji Adem û Hewa bigre heta digihe min û te jî. Divê em vê dinyayê nas bikin, em ji bo çî hatine û em diçin kû. Divê em dinyayê bi encameke baş û bi qenahet derbas bikin, yanî bi ezmûn û tecrûbeyê ew encam pêk tê, nabe em bidin pey destkeftên jiyanê û çavên xwe girêbidin, lê ne bi wateya em vê dinyayê bikin qurbana dinyayê axiretê, lê em bi saya eql û têgihîştinê jiyanê birêve bibin. Pêxember û Qur’an rêxweşker bin ji bo nasîna dinyayê û berdewamiya jiyanê. Ev hizrkirina Mehwî derbarê dinyayê wek behskirina wê dîmenê ye ku di Qur’anê de li ser dinyayê hatiye kirin, çimkî dinya kurt e û bidawî dibe lewra zema dinyayê kiriye li gor Qur’anê û pesinê dinya û jiyanê daye li gor Qur’anê.)⁵²

⁵² Hîmddad Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, Çapxaneyê Rojhelat, Silêmanî, 2014 ,Çapa Duyem ,Cildê Duyem , r .288.

1.10. Wênêkirina Dinyayê li ba Mehwî



Di vê wênêkirinê de, Mehwî wê yekê ji me re zelal dike ku dinya bi xweşî û nexweşiyên xwe her bidawî tê. Ne hebûneke hetahateyî ye. Îcar divê em mirov ji ber xatirê dinyayê û xweşiyên wê teslîmî dinyayê nebin, heke na dê dinya me bi dava xwe ya asê û şaxvedayî têk bibe û me ber bi pêkenok û qerfên çax û dewranê ve bibe. Mehwî xwestiye wênêkirina dinyayê bişibîne dîmen û realîteya şênber a vê dinyayê ku bi xweşiyên wê dilê mirov xweş dibe, lê piştî mirov ber bi çarenivîseke bixof û metirsîdar ve dibe. Ango dinya rêyeke metirsîdar e, divê mirov piştî xwe bi Xwedê girêbide da ji tarîtiya vê dinyayê rizgar bibe, (Mehwî wê çaxê vê dinyayê dixwaze dema li ber rewşenî û ronahiya Qur'an û pêxember û olê be, em dibînin wê çaxê ew dinyayê wek çiraxan binav dike, di rewşeke tenê de, ew jî hatina pêxember Mihemed (s.x) e ku tarîtiya şevê ronîdar kir di nav misilmanan de, yanî dinya bi hebûna Qur'an û pêxember ronîdar bû û tenê hêzdan bi berdewamiya jiyane divê li jêr sîbera ola Îslamê be. Bi vî rengî jî cennetê tîne vê dinyayê. Wek di vê beytê de diyar e dema Mehwî dibêje:

**(Le tarîkî şewî kufra beyek dem lemêkî da
Hezar û sê sed û bîst û dû, dunya çiraxan e)**

Herwiha dibêje:

**(Çe ha rehban kahîn hatinî xeybî beyektiryan
Deda mujde ke cennet dête dunya bem nizîkane)⁵³**

Ji xeynî ku Qur'an û hedîs dinyayê û xweşiyên dinyayê wek demkî û daxwazkerê wan jî bi çend peyvên tund û dijwar wesf kiriye, sedemên din jî hene ku di vê dinyayê de bêhtir Mehwi gihandin qenahetekê ku dinya xerabat e û dinyayê red bike. (Ew kesên ku xwe wek kesên xwedênas wesf dikin, hemû xwedênenas in û Mehwi di nav van kesan de hest bi xerîbiyê dike, yanî ev kirêtiya dinyayê gelek ji sedemên wê kirêtiya kes û mirovan e, ango hebûna Mehwi li dinyayê yan ew cihê ku Mehwi tê de dijî, însanên wê ne baş bûn.)⁵⁴

Bi baweriya Mehwi ew kesê ku tê dinyayê eger bi temahiya wê yekê be ku bigihe jiyaneke kamiranî ya buhiştê, divê hewldan û têkoşînê bike, dinyayê bide aliyekî û têkoşînê bike ji bo qiyametê. Bi awayekî xwe li dinyayê winda bike.)⁵⁵

Çimkî mirov û kesên vê dinyayê ewqasî nefis û derûn nizm in ku, li ser dirav û pereyan şer dikin û xwe kirêt û nederust dikin. Her bi dîtin û bihîstina dirav û pereyan geş dibin.)⁵⁶

Ango jiyana û dinyaya Mehwi aşiqbûn e bi wê fezaya ku di nûra Xwedê de xwe dibîne tê de aşiq dibe hevawayê sofî di bilindtirîn pileyê de digihe ruhê bilind, pêwendiya wî bi dinyaya şênber re vedibire û qut dibe, ji bo dinyayê û destkefên dinyayê najî û haya wî bi yekcarî ji xweşiyên dinyayê namîne û bala wî nakşînin.)⁵⁷

Çimkî zû yan dereng rêwîtiyek li pêşiya me ye ji bo wê dinyayê û terikandina vê dinyayê, eger bê destê min an neyê, ezê têkoşîna xwe bikim, mebesta wî karê qenc û îman û xêr e, daku ez bi rûyekî spî herim pêşberî Xwedê. Mehwi di vê malikê de dibêje:

⁵³ Hewarî, Neseb, *Dîwana Mehwi*, r. 464-467.

⁵⁴ Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, r. 28.

⁵⁵ Hewarî Neseb, *Dîwana Mehwi*, r. 607.

⁵⁶ Umer Ezîz Mehwi, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwi*, Çapxaneyê Ezmer, Silêmanî, 2012, Çapa Yekem, Cildê Yekem, r. 399.

⁵⁷ Eta Qeredaxî, *Mehwi di Navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, Çapxaneyê Kemal, Silêmanî, 2011, r. 321-322.

(Bem nizîkane leberme “Mehwiya” rêgeyekî dûr

Bête destim, ya neye, her koşîşî zadê dekem)

Mehwî dibêje dinya ne menzilgeh û wargehê însên yê dawî ye ku ev jî heman ew derbirîn e ku di Qur'anê de li ser dinyayê hatiye, ku Xwedê dinya birêk xistiye û afirandiye ji bo ezmûnkirina însan ku ji Adem û Hewayê dest pê dike heta digihe min û te jî, em hatine û divê em herin jî.)⁵⁸

1.10.1.Dinya – Mîhnetxane

Mehwî jiyana dinyayê wek mihnetxaneyek dibîne û ku mirov ji ev dinyêda hilakî û naxweşîne ku her wextek meriv dinya derkeft jib o wî nihmete dibêje:

Le...neziî roha, rohî aşiq

Witî: Oxey le mîhnetxane derçûm

Yanî di wê kêlikê de gava ku aşiqê rasteqîn yê rêya heq ruhê wî tê standin dibêje, oxey giyan ez ji vê mîhnetxaneya dinyayê rizgar bûm.)⁵⁹

Pena degrim be zatî eqdesî bêçûnî nadiwe

Mehwî ev dinya şibandiye ecûz ango pîreke bi fenûfût û sihrbaz. Ev dinya hemû fenûfût in û ez pişta xwe bi Xwedê digrim ji bo ez ji destê dinyayê rizgar bibim. Ez pişta xwe bi Xwedê digrim daku Xwedê min ji sihra dinyayê û nefsa dinyayê rizgar bike û duaya me qebûl bike)⁶⁰

1.10.2. Dinya – Çiraxan e

Helbestvan bi hic awayek hez jî jitan nakat tune ji carekda hez ji jiyana dike bi ciraxan nava wî hinaye ku wextek muhemed pêxember ji dayîk buye wata ji dayik buna pêxember jiyana dinya ciraxan bû.şahir dibêje.

Le tarîkî şewî kufra beyek dem lemêkî da

Hezar û sêsed û bîst û dûwe, dinya çiraxane)⁶¹

⁵⁸Şahîn, *Gulxaneya Arîfan*, r. 287-360.

⁵⁹Jêderê Berê, r. 270.

⁵⁹Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r. 342.

⁶⁰Jêderê Berê, r. 342.

⁶¹Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r. 464.

1.10.3. Dinya – Daye rêzbar

Mehwî şahir dinya wisa bi xirapî dibine wî şubhandye ciroka afretekî xirap binavî daye rêzbar ,ku cirokekî afsaneyedibêje.

Dinya be hîle meylî ye ebnay eger bibêy

Em dayerêzbare be ferzendî şû deka

Dayerêzbar efsaneyeke folklorî ye, di ola Ehlê Heq de, ku qaşo Ehlê Heq an hemû Kakeyî dema hatine qirrkirin, kes ji wan nemaye ji xeynî jineke avis ku karîbû xwe xilas bike. Piştê xwe li derdora Hewramanê veşartibû, heta dûre zarokek jê re çêdibe ku kur e. Piştê li gor çîrokê jinik kurê xwe mezin dike, piştê pê re cot dibe. Ev çîrok hinekî ji rastiye dîr e û dibe ku ji aliyê misilmanan ve hatibe hûnandin û çêkirin, çimkî rastî di efsaneyê de pir nizm e, rastiya vegotinê li ba Ehlê Heq bi awayekî din e û li gor Mehwî zevî û dinya hevawayê Dayerêzbar e, lewra neqebûlkerî û kirêt e û karekî nelirê û nedirust e) ⁶²

1.10.4. Dinya – jina telaqdayî – berdayî (jina no)

Mehwî di wênayek di jî xirap bo dinya kiriye wî şubhanye bi jina telaqdayî u di helbesteka xwe dibêje sê be sê telaqa dinya bide heta dinya telaqa te nedaye ji mala xwe tu ji dernkirye wekî jina xirap cewa dhête telaq daî tu dinya telaq bide .

Ta lemali dernekirduy, em jinî sed şukere

Mehwî, azane bide to sê be sê dunya telaq

Yanî dinya wek jina no û exlaqxirab e ku her şev sed mêrî bike, ango divê mirov lez û bezê bike û sed şukrî bike ku hîn te ji mala dinyayê neqewitandiye û kesekî din neaniye şûna te û te nedaye kuştin, bi sê telaqan wê berde û telaq bide.) ⁶³

⁶²Eta Qeredaxî, *Mehwî di Navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, Çapxaneya Kemal, Silêmanî. 2011, r. 323-324.

⁶³Şahîn, *Gulxaneya Arîfan*, r. 304.

1.10.5. Dinya – Cîfe – Berate (kelex)

Mehwî xwstina dinya ji bo mirovan wekî şerû şorên seg wehaye di ser laşeyên heywanêk ku miriye bi kelka xwarin nayete kirin.

Dezanî cîfe dunya, de heyfe

Wek seg em ser şore Leser lak

Mehwî dinyayê dişibîne kelex an cendekê mirar û mirî û ev amaje û nîşan e li ser hedîseke pêxember (s.x) dema dibêje (El dunya cîfe û talîbûha kîlab) ango dinya kelex û leşekî mirar e û kesê wê dixwaze jî wek seg û kûçikê li ser leşên mirî ye, yanî tu qîmet û girîngiya vê dinyayê tune.)⁶⁴

1.10.6. Dinya – Behra Fîtneeyê

Mehwî dinya bi behra fitneeyê şubhandye wata dinya xirapeyên wî zêde hene heta ku meriv ji rêya rast der biketin mirov nikare xwe ji xirapeyên dinya biparêze cimkî xirapeya dinya zêdene nayete control kirin .

Lem behrî fitne belkî necatit bida Xuda

Dawênî yaxuda bigre, berde naxuda

Mehwî di vê helbestê de ji ber ku gelek xirabî û kesên xirab û temahiya xweşiyên dinyayê hene, dinyayê dişibîne behr ango deryaya fitneyê. Ji bo necat û rizgarbûna ji vê behr û deryaya fitneyê divê em xwe bispêrin karsaz û rizgarkerê mirovan ku mebesta wî jê Xwedê ye. Yanî xwe bispêre Xwedayê mezin da ku tu ji vê dinyayê rizgar bibî û bifilitî.)⁶⁵

1.10.7. Dinya – Jina Xwefiroş

Mehwî şahir di beytekî din da dinya wekî jina xwe firoş hatye şubhandin ,cewa hemi dizane jina xwe firoş ku weneyekî xirap qirêj hene û dibêje.

⁶⁴ Hîmîdad Şahîn, *Mehwînasî* , Çapxaneyê Serdem, Silêmanî. 2012, Çapa Duyem , r.18.

⁶⁵ Muderis, *Dîwana Mehwî*, r. 3.

Ger le dunya çakeyê sadir bû tefrey pê nexoy

Rû spî rû reş e ger bê sed azayî bika

Mehwî dinyayê dişibîne jina xwefiroş. Mebesta wî ji rûspî li vir jina xwefiroş e ku her demê di berê kesekî de ye, bendewariya çakbûn û başbûnê ji jina xwefiroş nayê kirin. Dinya jî qencî jê nayê çaverêkirin, eger baş jî bû kes ji we baweriyê pê nekin.)⁶⁶

1.10.8. Dinya – jina Nanpêj (Nanewa)

Mehwî di beyteka din da dibêje mineta dinya nebe libelê qimeta xwe ji dest daye û dinya şubhandye bi nanekî co ku teleba nanekî co ji pirejnekî nanewa bike, ev bexşin nexwazebila nehête xwarin.

Bexşînî dinya mexo, yanî be nanekî co

Xo mekere ber minetî, pîrejînî nanewa

Mehwî dinya wek pîrejina nanpêj bi dîmen nîşan daye, bexşîna dinyayê wek nanê ceh e ku, ne mineta pîrejînê bibe û ne jî nanê cehî, çimkî herdu jî ne hêja ne mirov mineta wan hilgire.)⁶⁷

1.10.9. Dinya – Zebûr

Mehwî dinya bi zebûr şubhandye ku nabê dinya bi heng bhête fehim kirin ku zebûr jibo mirov bi azare ji dawida ev heng ku bi xeleti hatye fehim kirin wekî zebûr azare te didet, wata dinya xapinokê xêr jib o mirov nine.

Be zerd û sûrî dunya, zerdewalet lê negorabê

Be hengî têbigey, her nîşe, noşekî nî ye, zebûr

Mehwî wê şêwaza xapînok a dinyayê nîşan dide ku mirov xweşiyên dinyayê yan xirabiyên wê wek xweşî dibînin, lê di dawî de dibin xefka mirinê ji wan re, wek ku serê wan gêj bûbe û şandelîkê (zebûrê) wek mêşhungivê bibînin.)⁶⁸

⁶⁶Jêderê Berê, r. 17.

⁶⁷Jêderê Berê, r. 37.

1.10.10. Dinya – Dava Heyatê

Xilasbûn ji dinya nine meriv bi zehmet xwe ji xirapeyên dinya diparêze , çimkî dinya wekî davek wisaye ku nikari derbaz bibî tune mirin dikare azadî jibo te bihine.

Eger azadiyek bê le edemda boman

Çî heye xeyrî pêçî pel pel dawî heyat

Li gor Mehwî, dinya daveke şaxvedayî û aloz e ku bûye wek girêka kor û ji vê ne zêdetir e ji me re, tew neman pir baştir e ji dinyayê ango mebesta wî mirin e ku baştir e ji dinyaya aloz û lihev aliyayî, çimkî bi kêmanî serêşî û qeyd û bend tê de nîne.)⁶⁹

1.10.11. Dinya – Teweşistan – Hovistan

Dizanin ku teweşistan ghên gyandarên dirindene ku hic qyasek insanî têda nine ,mehwî dinya bi teweşistan şubhandye ku ghên merivên pir xirab û qrêjin ku zemir û insanyet têda nine.

Le malmda nedîwe hasilçî xeyrî teweş, min

Xuda pêdiraw ewaney lem wehûstane zû royîn

Mehwî hebûna xwe li vê dinyayê wek hebûna xwe di nav weşistanê de dibîn ango zevî yan dinya tenê weşistan û wargehê hov û weşan e. Însan jî weş in ji bo jîngeheke wiha hatine dirustkirin, lewra zû çûn an rizgarbûna ji vê dinyayê nîmeta Xwedê ye û tenê kesên ku Xwedê dide wan dibin para wan, tew eger em biçin cehnemê jî baştir e ji mabûna di vê weşistanê de.)⁷⁰

1.10.12. Dinya- Tiyatro

Mehwî dinya bi tyatro şubhandye ku cewa tyatro başênin ji babeta şano û filmsazî ku cî zube yan direng binina wî tamam dibe, dinya wisaye jibo mirovan tamam dibe.

⁶⁸ Ebdula Ezîz Xalid agirin , *Derbarê Mehwî yê Lûtkeyê*,Çapxaneya Somer, Silêmanî,1986,ÇapaYekem, r. 106-107.

⁶⁹ Muderis, *Dîwana Mehwî*, r. 64-65.

⁷⁰ Eta Qeredaxî,*Mehwî di Navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, r, 40.

Dinya tiyatro ye meweste tiya biro

Kê mawe tiya, ke nebûbê tiya tirro) ⁷¹

Di encama dawî ya vê lêkolîna me de li ser dinyabîniya Mehwi, li gor wan tefikirin û şibandin û teşbihên ku heyama me ya îro reng daye xirabiyê, Mehwi hatiye ew wêneyên xirab şibandiye dinyayê, me digihîne wê qenahetê ku Mehwi bi tamamî reşbîn bû derbarê dinyayê ku, hinek caran ji cehnemê jî pir xirabtir bû, Mehwi hebûna xwe di vê dinyayê de û hatina xwe ji bo dinyayê wek ketina nav daveke asê dibîne ku, divê tu xwe bispêrî Xwedê da necata te bide, ango Mehwi bi her hawî terikandina dinyayê û redkirina nefsê xwe wek çare û rêya derketina ji vê dinyayê wek çareserî dîtiye. Ev jî nêzîkbûna dinyabîniya Mehwiye sofî ji sofîyên Erebb û Fars diyar dike, (di şerha Camî Sexîr de hatiye) ku hezkirina dinyayê bi ser derkirin an peydabûna hemû gunehan dest pê dike, û terikandina dinyayê bi ser derkirin an peydabûna hemû îbadetan tê hejmartin.) ⁷²

Ev reşbîniya Mehwi bi tena serê xwe şeydabûna wî ye ji bo vegeza li nemanê ango mirinê. Lewra bi dilekî fireh bendewariya mirinê dike. Hêvîdar e zû ji vir here, çimkî dinya hîç û pûç e. Bi baweriya Xezalî, dinya dijminê Xwedê ye çimkî rêya bendên wî dibire da negihin wî, lewra dijminê dostên wî ye. Ibn Erebbî bi heman awayî dinya wek xaniyê hogirbûnê dîtiye, mirovan ji Xwedê dûr dike û dema vediguhêze xaniyê axiretê rûreş û zimanbirî dibe. Mehwi bi heman awayî daku ji vê dinyayê rizgar bibe, mirinê ji xwe re hildibijêre û bi şewq û hesret bendewariya mirinê dike. Çimkî mirin tekane rê ye ji bo rizgarbûna ji pîsî û kirêtî û pûçiya dinyayê. Lewra mirin ew cih e ku vebirîneke kûr di navbera me û kirêtiyên dinyayê de pêk tîne.) ⁷³

Bi baweriya Mehwiye maqûl û sofî mirin birrîna jiyanê û gihîştina baregeha Xwedê ye:

Mirdinêkî leber ew qapîeyda merdane

Bexwa çatir e emro, le gilarawî heyat

⁷¹ Şahîn, *Mehwînasî*, r. 19-20.

⁷² Merziye Silêmanî, *Istîlahat Sofîyan*, Intîşarat Ilmî û Ferhengî, Tehran, 1388 Çapa Yekem, r. 171.

⁷³ Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, r. 273-276.

Yanî mirina bi merdî di vê jiyânê de ji çirava heyatê baştir e. Mehwî di helbesteke din de dibêje:

Ewende teng û naxoşe, le dunya

Xoşe derçûn egerçî bo seqer çîn

Yanî dinya ewqasî teng û nexweş e, eger em herin dojhê jî, xweştir e ji vê dinyayê û divê mirov jê bar bike.)⁷⁴

Mehwî ligel nîşandana vê wêneya dinyayê, di heman demê de jî xwediyê nefseke bilind û îzeteke bilind e û dibêje:

(Bê minet rizqêke xem, bimirim le birsan, ewe dexom

Tefre naxom, teleb nakem, le dunya qûtê roh

Ev helbest bedewtirîn wêneya nefsbilindiya Mehwî nîşanî me dide, ku xemxwarina xwe wek bêminettirîn rizq dijmêre û dibêje eger ez ji nêza û ji birçîbûnê bimirim, heta xem hoste be, ez hewl nadim rizq bi minet û nanê heram bixwim.)⁷⁵

Ango li gor Mehwî, hebûna wî li vê dinyayê tu sudeke wê ji bo wî nîne û hest dike li vê dinyayê xerîb e û kes tune ji zimanê wî fêhm bike, yanî ev ne welatê Mehwî yê rasteqîn e, (ev jî wek wê hestkirinê ye ku li ba Ibn Erebi heye ku bawer dikir (hebûna wî li vê dinyayê ne bi arezûya wî bû, çimkî ev dinya ne wek wê hebûn an welatî ye ku ew dixwaze. Welatê wî di nemanê de ye û neman jî destpêka wê heye û ew welatê wî ye û dibêje tu suda min ji vê hebûnê nebû û hezkirina min ji derçûna ji vê dinyayê jî ew e min ji hebûna xwe tiştêk ji hebûnê nedît, ji bilî wêneya kesayetiya xwe, ango tu hatî hatî afirandin, lê tu hîç bûyî)⁷⁶ Bi heman şeweyê Mehwî dibêje:

(Menaze be bûn, megirî bo nebûn

Hîçyan taser nîn, çî bûn çî nebûn

B baweriya Mehwî mirov li vê dinyayê çî bi hemû paye û xweşiyên wê ku bi rûyê te de hat û ligel wî aliyê din nebûnî û xem û kovan herdu jî hîç in û heta hetayê ji mirov re namînin. Li vir heman ramana Ibn Erebi tê holê. Yanî Mehwî bi xwe di vê afirandina

⁷⁴ Jêderê Berê, r. 277.

⁷⁵ Mehwî, *Bêjeyên Arifî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r. 393.

⁷⁶ Doktr Gul Baba Seîdî, *Hicab Hestî*, Intîşarat Zwar, Tehran. 1387, Çapa Duyem, r. 141.

di vê dinyayê de, ji bilî dîtina wêneya kesayetiya xwe, tu girîngiyek ji bo min tune, lê nîrxê min ê heqîqî dinyaya axiretê ye.)⁷⁷

Mehwî li hember vê negirîngiya dinyayê, mirinê baştir dibîne ji xweşî û sefa û danên bitam ên dinyayê. Lê di vê jiyandê de mirineke bi merdî pê hêjatir û binirxtir e ji çirava heyatê:

(Mirdinêkî leber ew qapieyda merdane

Bexuda çatir e emro le gilarawî heyat) ⁷⁸

Di vê lêkolînê de li ser helbestvan Mehwî, em digihin wê astê ku nerîna Mehwî li dinyayê bi tamamî reşbîn bû. Mehwî dinya wek cihê malwêranî, helaket û sergêjiyê wesf kiriye. Ligel van wêneyan, diyar kiriye ku dinya hîç û betal e û li ser hîçbûna dinyayê kar kiriye. Lê tevî vê hemû reşbîniyê jî, hinek geşbînî di helbestên wî de diyar e. Wek me berê jî got ku geşbîniya helbestvan di vê dinyayê de tenê li hember qudreta afirîner û girtina rêbaza Xwedê û pişaftin û helandina tê de ye. Mehwî di rewşeke tenê de dinya wek çiraxanê wesf kiriye. Ew jî di encama paşxaneke dînî û oldarî li hember dinyayê geşbîn û xweşbîn e, (û ew dinya amadekirina dîtina te bi xwe ye ji bo vegera bo wî cihê ku însanan mehkûm dike, gihîştina mahiyet û wicûda rasteqîn û mabûna ebedî, wek Mehwî dibêje:

(Belke lew rêyewe berme imranî beqa

(Mehwiya) xeyrî xerabatî fena nîme melaz) ⁷⁹

(Di dawî de bi baweriya Mehwî dinya ne dawîtirîn wargeh û menzilgeha însan e, ne wicûda ebedî têgihîştina ji xwe û wicûde ye, lê dinya tenê ceribandî û ezmûnkirina însên e, lewra divê em vê dinyayê nas bikin û zanibin em çima hatine û çima divê em herin.

⁷⁷ Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r. 125.

⁷⁸ Şahîn, *Mehwînasî*, r. 23.

⁷⁹ Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r. 63.

1.11. Sedemên Redkirina Dinyayê li ba Mehwî

Mehwî mitesewif û zanayê nihêniya nefsa xwe li dinyayê bû. Ew wek şareza li ser hebûn û dinya û qiyamet bi başî dîtiye, dinyabîniya Mehwî û redkirina vê dinyayê li ba Mehwî xala herî girîng ew e, ev cih ango dinya hebûneke sexte ye, ne welatekî herdemî yê mirov e. Her divê em bimirin û zû dinyayê li pey xwe bihêlin. Ev li pey xwe hîştin jî divê em bi rûyekî spî û bi merdî berê xwe bidin welatê resen ku qiyamet û dinyaya axiretê ye û yek ji xalên sereke bo dawîya jiyane mirin e. (Mirin qederek an rêyeke naçar a her mirovekî ye ku divê zû yan dereng tê de here. Yanî divê ev mirovên ku wiha didin pey çêj û xweşiyên dinyayê, bawer bikin ku sibe dimirin, û heq û hesab bi wan re tê kirin. Eger wan ev zanîba ev kêferat ji bo vê dinyaya bêşûd nedikirin. Xwedê jî li ser vî karê wan yê kirêt dê ew ceza bikirana. Mehwî dibêje:

(Be pel pelkirdinî sibhey eger bibwaye baweryan

Debû qed bem hedde nebwaye bo dunya peley mexluq) ⁸⁰

Yanî dinyayeke ku mirov tê de bûn yan dawîhênerê dinyayê hebû, êdî çawa bijî, çî te hebe û kê bû, hemû ji ber mirinê bidawî tê.

Mirin xaleke ji xalên redkirina dinyayê li ba Mehwî, çimkî hatina bo dinyayê divê di mirinê de derbas bibe. Li gor vê nerînê jî, mirin dawîhênera dinyayê ye. Ango bo dinyayekê têbikoşî û xema jidestdana wê bixwî ku li hember wê mirinek heyê dawî li jiyana me hemûyan tîne. (Yanî ew kesê ku tê dinyayê divê ne bi temaya wê yekê be ku jiyaneke kamîran a buhiştê bibe nesîbê wî) divê bi her hawî li dinyayê têbikoşî da jê rizgar bibî û têbikoşî bo qiyametê û divê xwe li dinyayê winda bike.) ⁸¹ (Ew cureyên têfikirînan jî bo dinyayê, ku dinya aveke tihniya me lê dişke, çewt e, dinya tenê mij û moraneke berçav e ku ji dûr ve bi rengê xwe dişibe avê, ji nêzîk ve berevajî niyaza me ye. Mehwî di vê beytê de dibêje:

(Be awî têgeştinî ême dunya her serabê bû

Hemû eşçin bexinkan û lewşkîşe meley mexluq)

⁸⁰Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, r. 296.

⁸¹Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r. 607.

Yanî me wiha bawer kir ku av li wê derê heye û tihñbûna me pê dişke, lêbelê dema em gihîştin me dît hemû bejayî ye û hemû ruhber û candar ji tîbûnê xeniqîne. Ev jî di warê felsefî de tê wateya ku van mirovan dinya hambêz kiriye û bawer dikirin berhema wê şêrîn e wek wêneya avê ku bo kesê têr sûdmend e lê ev hambêzkirin dawiya wê bêhêvîti û reşbîni ye, wek wêneya avê ye ji dûr ve dişibe ewreke bi mij û moran a rengşîn a avî, bi nêzîkbûna jê berovajî mebesta me bû) ⁸² Yanî ku em vê hemû rastiyê zanibin, êdî em berê xwe bidin dinyayê, ne şhamet û merdîti ye.

Mehwî bawer dike însanê merd û şhametdar piştta xwe dide dinyayê û dibêje:

(Nelê merdim ke dunya pişt lew, ew rû le dunya bê

Ke purî zale, boçî pîre zalî pê reza nabê)

Yanî mirov kêferatê bo dinyayê dikan, berê xwe dane dinyayê, lêbelê van kesan merd nabîne, çimkî însanê merd eger dinya berê xwe bidiyê jî û di berjewendiya wî de be, ev berê xwe nadiyê û pê nayê xapandin, çimkî dinya ji kesî re ne dilsoz e, ango Mehwî mirov û civak wek sergêj dîtiye çimkî piraniya mirovan dane dû dinyayê. Mehwî vê dîmenê xweş û ciwan nabîne, herdem xwestiye vê dinyayê biterikîne, ji ber kesên bi nav zahid û civaka xirab bêzarker dike. Çimkî ev civak û komelgeh ji Xwedê yaxî bûne ji ber xweşiya dinyayê, qiyamet ji bîra wan çûye. Lê Mehwî berovajî civak û zahidan e eger ew dinyayê wek buhişt bibînin. Mehwî dinyayê wek (Beytu'l-huzin – mala xemgîniyê) dibîne û dibêje:

(Bexte zahîd ke beheştî bote meewa, min

Xeyrî (beytul huzin)î derd û cefa nîme melaz)

Mehwî bi van dîmenan pir qels e û derûneke wî ya netebitî heye, çimkî ne jiyan û ne bajar û ne civak ligel vê nerîna Mehwî naguncin. Mehwî dibêje:

(Tezwîr û fesad in xaybî walî îbad

Mubtelayîn bem belaye, ehî şarê eleyaz)

Yanî Mehwî ji destê wê çax û dewranê êş û azar kişandiye ku xelkê wê ewqasî xirab in, em ketin belaya azar û derdan, mijûlî tezwîrkirin û sextekariyê ne, ev xal me

⁸²Jêderê Berê, r.621.

digihîne wê yekê ku xirabiya civakê hem dîsan bûye motîfek ku Mehwî dinyayê red bike.)⁸³

Herwiha mirov an zahid û sofîyan wêneyeke kirêt li ba Mehwî nexşandibûn. Çimkî bi rûçik an ji derve vex we wiha nîşan didin ku mirovên dîndar in, lê bi kirde jî yan ji hundir ve kirêt û qirêj in wek di vê helbestê de dibêje:

(Rîşêkî pan û, tukî binaguyê dirêj û lul

Sofi le dîn lade be dîmen le cu deka)

Ev jî nîşandana şeweya rasteqîn a sofî û zahid e li ba Mehwî ku ji derve ve xwe wek kesên dîndar û sofî wesf dikirin, lê di naveroka xwe de pîs û qirêj in.)⁸⁴

Em dibînin ku Mehwî li cihekî din êrişî wan dike û dibêje:

(Zahîd û sofî beşer hatin Leser tezwîr şeyr

Xêrî rendane Xuda ke berteref bê her teref)

Yanî xirabiya civak û zahid û mirovan rêxweşker bûn ku Mehwî ji dinyayê bêhtir dûr bikeve, çimkî Mehwî ev دنیا ligel mirovên wê pir cuda ne û kesek tune di vê çax û demê de ji Mehwî fêr bike:

Bêkes min im kesê le zubanîm biga nîye

Hemdem xudanenas in û dem pir le yaxuda

Ev jî xerîbî û cudahiya Mehwî ji van kesan teqez dike, ezmûna Mehwî li vî cihê û rê ye ku tê de jiyaye ne baş bûye, lewra ji zû terikandina vê dinyayê hez kiriye, çimkî mirov xwe wiha nîşan didin ku ehlê Xwedê ne, lê belê di rastiyê de xwedênenas in.)⁸⁵

(Mehwî ji temamiya civakê di wê çax û dewranê de nerazî bûye, ji ber şêx û waiz û sultan û sofîyan. Çimkî ne şêxên wan şêx in, ne mirîdên wan jî bi heq sofî û mirîdên bi rastî ne, wek Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Şêx û waiz û sultan be cennet ben ged û gîpal

Debê emsalî ême bo cehennem ben sir û sîpal)

⁸³ Umer Ezîz Mehwî , *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, Çapxaneya Ezmer, Silêmanî, 2012, Çapa Yekem, l, r. 348-354.

⁸⁴ Qeredaxî, *Mehwî Di navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, r. 319.

⁸⁵ Şahîn, *Gulxaneya Arîfan*, r. 289-290.

Yanî bi şêwe xwe wiha nîşan didin ku buhişt cihê wan e. Lê bi qed û pergala wan diyar e ji xelkê cuda ne. Divê bi sir û sîpalên xwe herin cehennemê. Di dawî de, piştî êrîşkirina ser van kes û aliyan, Mehwî xemsaî û bêminetîya xwe bo jîyanê teqez dike. Wêneya nefsbilindiya xwe nîşanî wan dide û dibêje:

(Bê minet rizqêke xem, bimirim le birsan ew dexom

Tefre naxom, teleb nakem, le dunya qutî rohim)

Ev jî ji bilindtirîn wêneya nefsbilindiya Mehwî ye. Xemxwarina xwe li dinyayê wek bêminetirîn rizq dibîne, eger bimire ji birçîna, xem westa be, mineta rizqê heram nabim, ango heyf e însan girîngiyê bide dinyayê û xema wê bixwe, eger dinya qûtê ruh be jî, heyf e daxwazkirina wê) ⁸⁶

Em dibînin hîçî û pûçiya dinyayê û xirabiya mirov û civak û nefsnizmiya van kesan sedem in bo Mehwî piştî xwe bide dinyayê û ji dinyayê yaxî bibe. Çimkî dinya dîtîye wek sergêjker û windakerê rêya ronahiyê û dûrxera mirovê ehlê Xwedê ji Xwedê ye.

⁸⁶ Mehwî, *Bêjeyên Arifî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r.393-394.

BEŞA DUYEM

EZMÛNA HIZRÎ YA MEHWÎ LI SER JIYANÊ

2.1. Heqîqeta Jiyanê

Beriya ku em behsa jiyane bikin an bigihin tarîf û rastekirina nerînen li ser jiyane, divê em pêşî wê yekê bizanin ku (jiyan tişteke di nava me bi xwe de ye, heta em nejin em wê fêmanakin, yanî em wateyê didin jiyane, wek êş û azar, xem, matem, xweşî û nexweşî, heta em wan tam nekin, em wan kifş nakin) ⁸⁷ Yanî di dinyayê de eger pişkeke jiyane nebe para me, em nikarin wate û kemilbûna jiyane rohn û zelal bikin. Dema erkê jiyane ket ser mirov, awayê reftar û tarîfa jiyane li ba mirov diyar dibe. (Bi baweriya Aristotle, jiyane ne tenê kirdeyeke gewdeyî, lê kirdeyeke derûnî ye jî. Jiyan pêk tê ji şiyana tevgerê bi alîkariya Xwedê yan dayîna wateya jiyane ji aliyê amrazên wek eql, hesta tevgerê, rawestîn, tevgera di cih de, zêdekirin, kêmkirin, ku li ba ruhber û riwekan jî heman araste û rêçik heye) ⁸⁸ Ango jiyane heman nerîna li jor teqez dike ku mirov bi rêya amrazên xwe yê hestewer arasteya geşbûn û diyarkirina temahiya rojane ya mirov wate û tarîfa jiyane destnîşan dike.

(Yanî jiyane bêhtir dişibe hevrikiyê yan meydana hevrikiya hestên mirov e. Eger em berê xwe bidin yekem kêlîka derketina zarok ji zikê dayika wî, bi girî dest bi jiyane dike. Yanî jiyane me dişibe geşteke tijî bilindî û nizmî, divê mirov fêr be rahênanê bike û xwe bi çax û dewranê re biguncîne. Dibe ku ev amaje be li ser anîna me ji bo vê meydana bêyî xwesteka me) ⁸⁹

Lê jiyane bi hemû dîmenekê tê pêş li ba wî kesî, kes jî li gor nerîngeha takekes bi xwe jiyane diyar dike yan senaryoya jiyane datîne bi baweriya Freud. (Jiyane û ew bûyerên ku di jiyane de ne beşek ji jiyane ne. Hemû pêwistiya jiyane ye li ser ruhberan

⁸⁷Qanih Xorşîd, *Jiyan çi ye*, Çapxaneyê Genc, Silêmanî, 2011, Çapa Yekem, r.13.

⁸⁸Sebur Ebdilkerîm Şika, *Çemka jiyane û Mirinê di Helbestên Mewlewî û Mewlana Romî de*, Çapxaneyê Tehran, 2014. Çapa Yekem, r.76.

⁸⁹Hisên Salih Hacî Teratewenî, *Endîşeyên min bo jiyane*, Çapxaneyê Baban, Silêmanî, 2015, Çapa Yekem, r.30-31.

bi xwe, tew mirin encameke pêwist a jiyane ye û her kesek jî çawa li dinyayê deyndarê jiyaneke ye, di jiyane de jî deyndarê mirineke ye, siruştî ye û nayê înkarkirin) ⁹⁰

(Di Qur'ana pêroz de jî amaje bi heman bîr û baweriyê hatiye kirin ku jiyana di rewşa xweşî û bedewî û şanazîkirin û xwe binirxdîtinê ji aliyê pêwistiyên nefsi û zatî yên mirov. Herwek di vê ayeta pêroz de Xwedê dibêje (اعْلَمُوا أَنَّمَا الْحَيَاةُ الدُّنْيَا لَعِبٌ وَلَهُمْ وَزِينَتُهُمْ وَتَفَاخُرٌ بَيْنَكُمْ وَتَكَاثُرٌ فِي الْأَمْوَالِ وَالْأَوْلَادِ كَمَثَلِ غَيْثٍ أَعْجَبَ الْكُفَّارَ نَبَاتُهُ ثُمَّ يَهِيجُ فَتَرَاهُ مُصْفَرًّا ثُمَّ يَكُونُ حُطَامًا وَفِي الْآخِرَةِ عَذَابٌ شَدِيدٌ وَمَغْفِرَةٌ مِّنَ اللَّهِ وَرِضْوَانٌ وَمَا الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِلَّا مَتَاعُ الْغُرُورِ 20, حديد rastî herçî jiyana dinyayê ye , bes leyîstine, xweşikahî, mêjûlî, xweşekî, di navbera hev de xwemezinkirin e kubariy bi mal û zarokên e . Jiyana dinyayê wekî baraneke ye ku giyayê wê cotkar kêfxweş dike ,piştîre hişk bibe, tu dibinî ku va ye zer buye,paşê dibe puş û pelax û di axiretê de jî ezabekî dijwar e(jib o kesê dinyayê di ser axiretê re bigire”

Eger em wateya vê ayetê şîrove bikin, zelal e, heyat çî ye, lê eger em nekevin behsa xweşiyên jiyane bi heramî, bila em behsa misilmanekî bikin ku jiyana wî tijî xweşî û sefa û cilûbergên bedew, koşk û tiştên din e, bi keda xwêdana eniya xwe aniye. Yanî wêneya jiyana vî kesî rohn û zelal bûye, îcar êdî pêngav, yanî jiyana wî, asta jiyana wî xwarin û raketin ev wateya jiyane nînin li ba wî kesî, ango miameleya rojên temenê te, îcar êdî her çawa be şîrîta filma jiyana te kamil dike) ⁹¹

Eynî ew bawerî ye ku Ibn Cewzî dibêje jiyana pêk tê ji reftar û aliyên hestewer ên mirov di jiyana rojane de bi baş û xirabiyên wê, û eger tu ketî tengasiya jiyane, divê em bi destê xwe deriyê wî kesî bigrin ku emrê rizgarbûna me di destê wî de ye, dikare jiyana wî dewlemend bike eger berovajî xwestekên wî jî bû, aram bibe li ser xwestekên wî) ⁹²

Çimkî divê ew yek jî ji bîra me neçe ku jiyana û nerîna li ser jiyane ji bilî wê realîteya mirov tê de ye, lê li gor felsefeya îslamî yanî mirov bêje jiyana ne îtibarî lê heqîqet e, heqîqet jî ew e ku herkesê sûda wî ji bo dinyayê nebe mirî ye, yan di jiyane de be, yanî li jiyane wek jiyana abstrakt cuda ye, lê divê em behsa aliyê însanî yên jiyane

⁹⁰Sigmund Freud, *Raman li Ser Wextên Ceng û Mirinê*, Çapxaneya Tehran, Silêmanî, 2015, Çapa Yekem, r. 39.

⁹¹ Ibnu'l-Cewzî, *Ezmûna Jiyane*, (Muhemed Muhemed Heme Mirza) Çapxaneya Karo, Silêmanî, 2015 Çapa Duyem, r, 35.

⁹² Ibnu'l-Cewzî, *Ezmuna jiyane*, r. 297-298.

bikin, ango mirov arasteya hizrkirina hekîmî û şîyan û jîriya wî kesî dikare şepêla bûyerên jiyana wî bizane ber bi qayîlbûn û razîbûnê rêz bike (Fersenda jiyane fersendeke binirx e. Eger tu bizanî barê eqlî û şîyana xwe, eger mirov nirxê temenê xwe bizane dê pir bigrî li ser wan demên temenê xwe ku winda kiriye. Seyîd Qutib dibêje ez îro bi mixabin im li ser wan kêlik û xulekên ku ji temenê min yê giranbuha û binirx û çê diçin. Lê belê ez îro çavdêriya jiyane û pêngavên wê dikim. Lewra piştî vê çavdêrî û çaverêtiya min, ez du qat dijîm, sûdê jê dibînim û hest pê dikim.)⁹³

Jêderê mirov paşxaneke olî û dînî ya felsefî ye. Em dikarin nexweşiyên wê jî wergerînin xweşî, em dikarin di wê çaxê de bêjin jiyana tevî hemû nexweşiyên xwe her bedew e. Sadî Şîrazî dibêje ango mirov bi girîngî rêza dem û jiyana xwe digre. Divê em demên temenê xwe vala xerc nekin, bi karê dinyayê axireta xwe ronîdar bikin, û herwiha em dikarin bi kêmtirîn şîyan xweşî û aramiyê ji xwe re bidest bixin. Gotineke inglîzî ya navdar heye dibêje tu dikarî li pişt deriyê hesinî yê zindanê li jor binerî û gulekê ji berîka xwe derxî bêhn bikî û bikenî. Yanî ji bo peydakirina xweşiyê di jiyana me de em dikarin bi rêya dil bidin pey peydakirina wan tiştan ku di her dem û mekanekî de xweşiyê misoger dikin.)⁹⁴

Dibe ku di heman demê de nirxê jiyane ji me re derxe ku ji bilî ku دنیا yan jiyana bi xweşiyên xwe bedew e, lê di heman demê de jî jiyana bi nexweşiyên xwe jî her girîngiya xwe heye. Vê yekê jî wiha li mirovan kiriye tew di temenê pîrbûnê de jî her hilma girîng a jiyane û vegera bo wan demên ku di xortaniyê de ji dest dane, hesretê bikşînin. Ev jî dibe ku mirov jî di nav du rêyan de matmayî bike. Bi wê yekê ku xwe di wê yekê de bibîne ka gelo jiyana girîng e yan na, serdemekê piştguh bixe, serdemekê hesreta xweşiya jiyane li ba wî bipişkive; tew eger di dawiya temenê wî de be jî. Yanî girîngî û pêwistiya jiyane heye. Lê bi wateyekê ku tu bi xwe wê arasteya ku tu dikarî biguherî bi aliyê baş û dilxweşker de.

⁹³ Xorşîd, *Jiyan Ci ye*. 68-88.

⁹⁴ Aid al-Qarnî, *La Tahzan*, Pirtûkxaneya El Ibêkan, Riyaz, 2004, Çapa Çardehan, r. 298.

2.1. Mehwî û Jiyan

Başîrîn karê mirov di jiyane de lêgerîn û nasîna zat ango xwe ye. Yanî mirov bi şeweyekê ji şeweyan aliyê hişyarî û hestên xwe îdrak bike. Bi wê rêya ku tu çawa dijî. Daku em bi azadî û serbestî bijîn, divê em nefsa xwe û zatê xwe perwerde bikin. Bi vê rêyê emê bigihin armancên destnîşankirî. Di qonaxa aramiya ruh û azadkirina nefse de diçe. Helbestvanê me Mehwî li gor vê nerîne yan nerîna wî ji bo jiyane mebesteke taybet an jiyaneke taybet heye û dixwaze xwe di warê wan qonaxên ku mebest jê perwerdekirina ruh e, bibe nimûne ji bo xelkê.

Li gor vê nerîne bîr û baweriyekê Mehwî ya sofî û arifane heye, çimkî Mehwî wek helbestvanekî sereke yê meydana sofî û arifan tê hejmartin. Hizr û berhemên helbestvan ji çavkaniyên tesewufê bingeh girtiye. Nerîna Mehwî li jiyane wiha bû ku, jiyana heqîqî ya însên di hundirê însên bi xwe de ye. Divê em bi livandina wan hundiran an karkirina di çarçoveya eql û îmanê de, bikarin bihayên mirovî peyda bikin, girîngiya xwebûna mirov li vê dinyayê bi armanc teqez bike. Mehwî jiyana xwe ne bi çavlêkirina jiyana xelkê, lê bi destê xwe dirust dike. Çimkî Mehwî ev dinya û mirovên wê bêyî destnîşankirina çîna civakî, wek kêşe û pirsgirêk dîtine. Yanî ev jiyana bi perwerdekirina zat û xweparastin û dûrketina ji wan kesan tu dikarî jiyana xwe biparêzî, girîngiya bûna te derdikeve. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Lem behrî fitneye belkî necatit bida Xuda

Dawênî baxuda bigre, berde naxuda)

Yanî eger tu nefsa û zata xwe qontrol nekî, bi neheqî berê xwe bidî behra kêşe û fitneyê ya dinyayê, êdî zû dev ji dawa kesên dûrî Xwedê berde, xwe li kesên nêzîkî Xwedê bigre, eger te berê nefsa û zatê xwe guhert û da dinyaperestiyê, êdî taristan bi ser wicûda te de tê, ji nûra işqa rasteqîn dûr dikevî)⁹⁵

Li vir mexseda Mehwî ji dawa "yaxuda" xaliq e, û ew hêz e jî ku Mehwî han dide, ji bo şopandina vê rêyê, nûra işqê ye. İşqa xwedayî, (û di vê rêyê de Mehwî ji kesên asayî yên din cuda dibe, çimkî pir kes guwahî û şahidiya wê yekê didin ku dane ser rêya

⁹⁵ Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r.313 -314.

rasteqîn, nedane pey nefsa xwe, lê di vî warî de xwe ji wan cuda dike, û xwe jî dike nimûneyeke bilind di vî warî de û di vê helbestê de dibêje:

(Êste bo laf û gezaf her kes debînî aşîqe

Nek hemû kes can fîda, wek Mîm û Hê û Waw yêt)

Yanî niha dibînim pir kes bo şellafî û melaqiyê dibêjin ez evdê rasteqîn im, lê ne rast e. Kesê rasteqîn ew e ku piştî xwe dabe dinyayê û nefsa û arezûyên xwe piştguh kiribe û ruhê xwe qurbanî Xweda kiriye. Mehwî jî yek ji wan kesan e, wî şerê mezin li dijî nefsa xwe kiriye.)⁹⁶

Yanî jiyan li ba Mehwî ji ronakkirina dil pêk tê. Dil ew cih e ku alava teqwayê lê derdikeve, dinya mat û xilmaş dibe eger dilê wî ji îdraqa eşq û heqîqetê bibire, yanî jiyan Mehwî jiyanêke tije teşwîq û agir û alavên eşqê ye, eşqek bo Xwedê, eşqek wî serkeftî bike, ku cilewa nefsa bike. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Dil le îdrakî heqîqet bê beşe, bê daxî eşq

(Mehwiya) dana debê, bem çawe bînayî bika)

Yanî eger nefsa mirov, dil û derûna wî ji heqîqetê nas bû, dax û demxeya eşqa hezkirina Xwedê pê ve hat kirin, êdî nefsa Mehwî bi wê daxa rastîn û eşqa xwedayî zana dibe.⁹⁷

Ev hizra Mehwî bi tevahî hizreke sofîyane û arifane ye, çimkî jiyan li ba sofî û arifan, jiyanê ve dinyayê li ba arifan isyan e û zehmet û bêzarker e ev jiyan eger bi rûyê te de xweş be yan nexweş, du binemayên wê yên girîng hene ew jî eşq û nefsa e, eger nefsa serdest be dibe bikujê jiyanê, te ber bi lawaziyê dibe û eşq jî wate û temamkera jiyanê ye ku însaniyetê eşkere dike û dirust dike, pêwîst e tu nefsa di cihê wê de bikujî, di her kêlîk û demekê de di hizûra Xweda de bî, hemû hinav û dilê te gurr û bi alav be ji bo eşqa Xweda)⁹⁸

Li ba Mehwî jî jiyan yanî eşq, eşq mebesta wî roka xwedênasînê ye, çira dilan e, ronîdarkerê jiyanê ye û di vê helbestê de dibêje:

(Ta zulmetî wicûde terîkî le nurî eşq

⁹⁶Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, r. 309.

⁹⁷Muderis, *Dîwana Mehwî*, r. 19.

⁹⁸Malpera Tebîyan Zencan, www.tebyan-zn.ir

Sêberî nema hetawe ke Mehwî nema, Xuda)

Yan dibêje:

(Bo gum buanî çolî mehbetyetî Xuda

Tebşîrî (elselamû ala men ittebe el hûda)

Ango evên ku di dinyayê de, di jiyânê de rêya rasteqîn winda nekirin bi eşqa nûra Xweda taristan terikandin ew in ku rê winda nakin û ji sizayê roja Qiyametê parastî dibin.)⁹⁹

Yanî Mehwî jiyânê red nake, lê bi rêya eşq û şewitîna di nav bedewî û dilovaniya Xweda de çarçoveya jiyana taybet a Mehwî tê kişandin, belê Mehwî jiyana klasîk an wê jiyana berbelav ku di hundirê civakê de heye red dike, lê di heman demê de ew jiyana taybet ku dirust kiriye pê xweş e yan rizamend e, ne amade ye vegere nav jiyana berbelav a civakê. Mehwî bi vê rêyê biha û nirxên mirovî û bûna resen a zat dinase, jiyaneke ku xwe ji hemû kirdeyên bed û xirab paqij bike.

(Ev jiyana jî bi eşqê dibe, yanî eşq motîfa hîlbijartina vê jiyânê ye ji bo Mehwî. Bi baweriya Mehwî, eşq ronîdarkerê jiyânê ye û di vê helbestê de dibêje:

(Eşq agirêke berbûwe her kesê, debê bekes

Ger roje reş weku şew bê, bû be şewçirax)

Ango eşq wiha ye, agirek e ku bigre ser giyanê her kesî wî dike mirovekî rasteqîn, tew eger roja reş a aşiq wek şeveke tarî be jî, ronîdar dike.)¹⁰⁰

Çimkî karê eşqê ye ku Mehwî dibe ber bi alav û teşwîqa canfidayî yan hezkirina xwedayî û dûrketina ji kirdarên bed, eşq e ku Mehwî payeyeke girîng diyarî wê kiriye, ji kesên din cuda bûye. Nakeve nav meydana mîlmilaneya temahî û nefsa xirab. Ew jiyana dihêle, (Bi baweriya Mehwî ev rê şopandiyê, encama wê dîtiyê, jê ne poşman e û di vê helbestê de dibêje:

(Qisaney min bûwe zîney mecalîs, aferîn ey eşq

Çeha bê nam û xamî wek mint kirdote sahib nam)

Ango sêrkin li saya eşqê bû sedema şuhret û navdarbûna min di hemû civat û meclîsan de, ku ev jî tişteki baş e ji bo Mehwî ku jê ne poşman e.)¹⁰¹

⁹⁹Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r. 38.

¹⁰⁰Jêderê Berê, r.212.

Li gor vê nerînê em digihin wê qenahetê ku Mehwî bi rêya eşqa îlahî ji nefis û dinya û jiyana dinyayê yaxî dibe (isyan dike), berdewam di nakokiyê de bû, çimkî bi baweriya Mehwî beriya ku ruh bê kişandin û ji nefis û zatê te bê betalkirin, tu bi xwe erkê kuştina nefis û dinyaya xwe cîbicî bike, rizgar be ji wê neheqî û nedadmendiya ku îro di nav civak û oldar û terîqetên din ên olî de heye, di dawî de dibêje merd be tu bi xwe wî karî bike, bendewariyê neke ji te re bê kirin, di vê helbestê de dibêje:

(Ger îşî rohte, ke nebû kes be destewe

Dest helgire le roh û mebe îltcac be kes) ¹⁰²

Mehwî piştî van şîret û ronkirinên li ser jiyane, ev jî bi derbasbûna demê, hino hino ew firsend ji dest diçe, çimkî dibe ku dawîya temenê te bê û tu bi hawara ruh û dinyaya axiretê re negihî, yan temenê mirov jî bo kontrolkirina nefis û zatê bedemel temen û qonaxê diyarkirî heye, bi derbasbûna di temen mebesta wî pêrenegihîştin e, êdî wê derfetê ji dest didî, ku dibe ku di dawî de mecalê rizgarkirina te berteng be, di vê helbestê de dibêje:

(Be zayi çû le (mala yanî) ya weqtim hemû, yanî

Debê weqtê le (ebûl weqtî) bixwazim ta tiya bimirim)

Li vir mebesta Mehwî ew e ku ew dem û katên ku bi ser biriye negihîştîye qenahetekê ku heqê mirinê jê re misoger bikin, çimkî eşq bo mirinê di dinyayê de cureyeke din e ji hêjatiya canfidayiya Mehwî wek kesekî xwedênas, lê dibe ku qenaheta Mehwî ya tevahî bi vê jiyane nebe yan di eşqê de kêmasiyek dibe ku rû dabe, ev jî cureyekî ji nearamiya derûnî li ba Mehwî dirust kiriye, ta wiha kiriye wextê ji bavê wextê bixwaze, dibe ku Mehwî li vir mebesta wî ew be ku herçiqasî bi dû kirdeya baş û pişaftina gewdeyî û ruhî ji bona eşqa xwedayî bikeve nebêje zor e, yan bila ez iktîfa bikim her divê tu xwe deyndar derbixî, ev jî zengilê hişyarkirinê ye ji bo her kesî, ku razî ne û qurre ne ji xwe re dibêjin em evdên tamam in, lê ne wiha ye, divê tu hişyar bî û tevî wê yekê ku kiriye divê di dawî de bi minet daxwaza wext ji Xweda bikî ta karên baş zêdetir ji te re bèn nivîsandin) ¹⁰³ Çimkî nefsa bedkar dem û zemanê diyarkirî jê re nîne û nabe mirov piştî xweparêziya ji temenekî diyarkirî bêje êdî spas ji bo Xweda ez filitîm,

¹⁰¹ Jêderê Berê, r. 259.

¹⁰² Mehwî, *Bêjeyên Arifî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*. r.362.

¹⁰³ Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî* .r. 263.

nexêr ne wiha ye, (nefsa bedkar wek şeytan e, herdem wek sîber li ser serê te ye, lewra divê tu hişyar bî, bo rêçareyê jî dûakirin û nêzîkbûn e ji Xweda weke ku Mehwi di vê helebstê de dibêje:

(Esîr û seydi qeydi keyd û şeydi nefsi emmarem

Le destî em mare bedçare, çî ye çarem, xuda çarem

Le hefta têperîm û hefteyek bo dîn û bo dunya

Be karî xom û karî kes nehatim, dey çî bêkarim)

Mebesta Mehwi ew e ku xirabiya mirovan û çavkaniya wê yan motîfa wê nefsa xirab e, îşaret e bosureya (53 . يوسف) “إِنَّ النَّفْسَ لَأَمَّارَةٌ بِالسُّوءِ” “Nefs zêde xirap xwaze” divê mirov hemû destpêk û dawîya jiyana xwe bo karûbarên dîn û olê bi kêrî xwe bê û ji bo karûbarên dinyayê bi kêrî xelkê bê.)¹⁰⁴

Tew gava temenê Mehwi zêde bûye û gihîştîye 70 salî, nefsa bedkar, her dev jê bernade, lê Mehwi ew kontrol kiriye dibe ku ji aliyê derûna wî ve ev tarîbûn dirust be, lê nebûye kirdar, çimkî wek me berê got, pêwîst e mirov bo karê qenciya dîn û dinyayê îktîfa neke her hest bike, ku bêkar e, wek Mehwi ev mînaka canfidayî û kêmdîtina wê pişafînê ji bona eşqê yan nûra Xwedê, çimkî nefsa mezintirîn dijminê însên e, hevrêyekî bedkar li temenê însên e, ku heta terikandina vê dinyayê ligel wî şîrîk e.

Yanî Mehwi û jiyana Mehwi me digihîne wê bîr û baweriya ku jiyana xelkê û weke takekesî û civak li ba Mehwi qedexe ye, naxwaze şîrîkî yan teqlîda wê jiyane bike, çimkî ew kes xwedan nefsa û exlaqên xirab in, parastî nabin ji agir û cezayê Xweda, ango Mehwi dixwaze cuda bibe ji civakê, ji takekesan, ji oldaran û bi nav zahidan, em dikarin bêjin yaxîbûnek e (isyan û serkeşî) ji takekes û civakê, piştî bi gîr û tîna eşqê, ango eşqa îlahî nefsa bedkar ji xwe veqetîne, yaxî bibe ji nefsa xwe bi ser de serkeve, çimkî bi baweriya Mehwi nefsa mezintirîn dijmin û kavilkerê însên e, bi vê yaxîbûnê digihe azadî û lûtkeya çêj û xweşiya jiyana xwe ku nemiriyê pê dide, çimkî mirina nefsa bi tena serê xwe eger em bimirin jî wek nemiriyê ye. Tenê guhastina me ye ji malekê bo maleke din. Di roja mehşerê de jî bêminet e, wek di vê helbestê de dibêje:

¹⁰⁴ Jêderê Berê, r. 271.

Be naxun surefî yarim le sefhey sine nûsîwe

Le heşra weqtê neşrî namekirdin, minim û sîparem

Mehwî sînga xwe ker ker (let let) kiriye û wêneya yar tê de kêşandiye di Qiyamet û heşrê de jî, sîpareya textê sînga xwe nîşan dide wek derbirînekê ye ji nameya kirdarên wî li dinyayê, sîpare, eslê wê bi wateya Qur'anê hatiye, çimkî sîpare, yanî sê parçe Qur'an jî sê parçe ye.)¹⁰⁵

Di heman demê de ku jiyan li ba Mehwî reşbîn bû, em dibînin di dawiya temenê wî de dilê wî ji bo dema temenê xortanê û jiyanê wê serdemê lêdide. Ango jiyan bi xweşî û nexweşiyên xwe her xweş e. Em dikarin bêjin di aliyê wêjeyî de ev tiştê bedew e, curek ji nearamiya derûnî yan cedelî ye, di nav redkirina jiyanê û hezkirina wê de tê dîtîn, wek di vê helbestê de dibêje:

Pîrî nemamî baxî ciwanî kirde poş

Tazem dirextî tûlî emel derdeka çiro

Di vir de Mehwî kêliyên gencyê yan dema bêkesî li ba wî xweş bû, bi vî temenî lêbelê taze dara arezû û hêviyên min ên dûr û dirêj gul vedide)¹⁰⁶ tiştê asayî ye ev nearamiya derûnî çimkî Mehwî bi tevahî hemû tişt zanîbû, hertişt îdraq kiriye bi taybetî dema dibêje min 70 sal derbas kir, wiha nîşan dide ku hemû yasayên dîn û dinyayê gihandiye encam, lêbelê dîsa nihêniya jiyanê maye, girîng e têgihîştin lê, jiyan bi tena serê xwe pişaftina wî kesî bi xwe ye ji bo dahênana dinyaya axiretê, jiyan di her serdem û qonaxê Mehwî de encam û tama xwe heye, lê em dikarin bêjin Mehwî di aliyê ciwankariya wêjeyî de di qonaxa nekesî yan bêkesî de bû, em dibînin ku di qonaxa xortaniyê de ku dibêje:

(Çi bikem ne ew kesem ke kesim bê lela be kes

Xoşim negeyme ew kese ew min bika be kes

Ango Mehwî di vê qonaxê de, di bêçaretîyê de maye, ne ku ew bi xwe kesekî pêgihîştî ye xelk jê fêm bikin, ne kesek jî heye tiştê wiha pê bigihîne)¹⁰⁷

Ev tê wê wateyê ku Mehwî yaxî (serkeş) bûye û hest bi xerîbiyê kiriye bi wê yekê ku ne kes jî Mehwî fêm dike, ne jî kesek heye Mehwî bide fêmkirin. Ev nakokiya derûnî

¹⁰⁵ HuwarîNeseb. *Dîwana Mehwî*. r. 271.

¹⁰⁶ Jêderê Berê, r.629.

¹⁰⁷ Jêderê Berê, r.187.

jî, dibe ku du hokar li pişt rûdana wê hebin, yekem civak an ew kes û şêxê ku Mehwi çaverê bû bigihe bi encam û mebestekê ku, dûre nebûye ew kesê ku Mehwi tişteki jê fêm bike, û herwiha nebûna kesekî ku ligel derd û kovana dilê Mehwi fêm bike ku em her li xala yekem vedigerin. Hokara duyem nefsa Mehwi ye ku bi curekê ji bê desthilatî û lawaziya desthilata Mehwi li ser kontrolkirina arezûyan pêşkêş dike.

Di babetên din de emê bi berfirehî ezmûna jiyana Mehwi berçav bikin. Bi kurt û kurmancî, jiyan li ba Mehwi lêgerîn e li dû kesdarî, kesekî nêzîkî Xweda, daku di dawî de li ber deriyê mala wî wek gešta keştiyê di nav şepêlên bilind û nizm ên deryayê de bi gešta bi kenar deryayê yan gihîştina keştivan bi bejayiyê, çimkî bejayî li ba wî gihîştin e bi arezûyan û rizgarbûn e ji mirinê.

Mehwi jî bi gihîştina deriyê mala kesê xwedênas (baxuda), li vir mebesta wî kenarê aram e, ew kenarê ku gihîştina wê dijar e, bo vî karî jî divê Mehwi ji nefsa û zâtê xwe yaxî bê û wan kontrol bike. Ev kontrolkirin jî bi eşqa heqîqî ya îlahî tê kirin. Piştîre yaxîbûna ji kom û civakê, cudabûna wî jê yan ev jî hemû ji payeya eşqê tê kirin. Ev jî bi buhurîna di kanî û alava teqwa û nefsgirtinê, ew şûn jî yan ew kanî jî dil e.

Piştî wê yaxîbûnê behsa girîngiya katê (demê) an wextê derdikeve holê. Girîngî û ehmiyeta demê, cihê girîngiya Mehwi ye. Çimkî dem binirx e ji dest derket tu nikarî bibî kesekî xwedî nasname yan bi rûyekî spî vegeerî baregeha Xweda. Em dibînin Mehwi bi girîngî li demê neriye, her dem ji aliyê *ebûl weqt* ve ji te re tê terxankirin, mecalê zêdetir didiyê bo karê qenciye yê dîn û dinyayê. Bi jîdestdana demê hertişt serobin dibe. Dem namîne bo mirandina nefsa û hez û arezûyan. Dibe ku ev gotin mebesta wî dema ciwanî û xortanî ye ku her dema tu pîr bûyî, êdî tu venagerî yan mecalê vegeerî bo mirandina nefsa û arezûyan namîne. Çimkî vegeerî di temen de nîne, em dibînin di qonaxên destpêka jiyana Mehwi de jiyan li ba Mehwi nexweş e, lê di serdemên dawîya temenê wî de jiyan li ba Mehwi gul vedide, ev jî tê wateya ku jiyan bi hemû xweşî û nexweşiyên xwe her xweş û bedew e, û herwiha di warê edebî de cedelê di navbera jiyandostî û jiyan nexwestinê de tîne holê. Çimkî di hin serdeman de red dike, piştîre di dawîya temenê wî de dilê wî ji bo jiyane lêdide.

2.2. Jiyana Dinyayê

Jiyan wek me berê amaje pê kir hêma ye yan amajekirin e bi çend bûyerên berdewam li ser zevî rû didin û girêdayî hemû ruhberan e ku tê de beşdar in, ji jidayikbûnê heta mirinê) eger em behsa jiyane di aliyê cure û taybetmendiyê de bikin, jiyana dinyayê ya Mehwî wek eşkere ye du cure ye 1. Jiyana Dinyayê 2. Jiyana piştî mirinê. Di vî warî de lênerîna Mehwî li jiyana dinyayê, yan ew jiyana ku ji aliyê dinyayê ve bi me tê dayîn pûç e, mal wêranker e, çimkî dinya çawa behra fitneyê bû ango eger bexşîna wê ji bo me jiyan be pir ji wê kavilkertir e, ji tiştên xirab berhemên baş peyda nabin. Yanî pêwist e Mehwî bi xwe jiyana xwe watedar bike yan dirust bike. Jiyana dinyayê li ba Mehwî bêzarî ye, ji eşq û mehbete vala ye. Mehwî dixwaze li dû jiyaneke tije eşq û mehbet bigere.

Mîna arifên din Mehwî jî dixwaze bi zuhdê zengînî û wateyê bide jiyana xwe, jiyaneke ku Mehwî bigihîne ber deriyê mala yar, êdî rêçika vê gihîştinê çawa be ne xema Mehwî ye. Ew amade ye berê xwe bide jiyana rasteqîn. Yanî mirov bi xwe ji kirdar û reftarên xwe berpirsiyar e, mirov dizane wateyê bide jiyana xwe yan arasteya wê biguhere (bi baweriya Mehwî jiyan û dinya di kesayetiya yar yanî xaliq de, pişaftina di eşqa Xweda û pêxember de dibîne û bi hebûna wan (Xweda, pêxember) wateya jiyane heye. Li derveyî wan jî jiyan pûç û têkder e. Çimkî Xwedayê mezin di vê ayetê de, dibêje (وَمَا خَلَقْتُ الْجِنَّ وَالْإِنْسَ إِلَّا لِيَعْبُدُونِ)¹⁰⁸ (الزاريات), 56 “Min, cin û ensan bes jî bo ku îbadetê min biken afrandine”

Mehwî bûna xwe di eşqa Xwedayî û koletî û canfidayîya ji bo Xwedê de dibîne. Yanî jiyana Mehwî jiyaneke tije alav û tesewîfa Xwedayî ye. Baweriya wî bi wê yekê jî tê ku jîna vê dinyayê kurt e û dawîya wê heye. Belê xweşî û nexweşî tê de hene ku sedema xemilandina şexsî û dilxweşîya kesane e. Lê ey bendeyên Xwedê, ku ev bexşînên min zû bidawî tên. Ango ev jiyan derfet e ji bo rewşenkirina jiyana axiretê, pêngavek e ji bo amadebaziya ji bo rêwîtiya hetahetayî ber bi jiyana axiretê ve. Çimkî dawîya jiyana axiretê nîne. Xwedayê mezin di herdu sûreyên (الحديد و العمران) de behs dike, di sûreya (كلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ وَإِنَّمَا تُوَفَّقُونَ أُجُورَكُمْ يَوْمَ الْقِيَامَةِ فَمَنْ رُزِحَ عَنِ النَّارِ وَأُدْخِلَ (العمران), 185 de dibêje.

¹⁰⁸ Qur'ana Kerîm, Sûreya El Zariyat Ayeta 56, r. 523.

(الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِنَّمَا مَتَاعُ الْعُرُورِ)¹⁰⁹ “her candar dê mirnê biçêje ,bêguman roja qyametê hun ê gezayê xwe wergirin , vêja kî êgir were dûrkin û biçê buheştê bêguman rizgar bûye.jiyana vê dinyayê jî pirtalê xepandinê ne tiştêkî dî ye” û herwiha di sûreya (الحديد) 20 de, dibêje (اعْلَمُوا أَنَّمَا الْحَيَاةُ الدُّنْيَا لَعِبٌ وَلَهُمْ فِيهَا مَتَاعٌ وَذَيْتٌ وَزِينَةٌ وَتَفَاخُرٌ بَيْنَكُمْ وَتَكَاثُرٌ فِي الْأَمْوَالِ وَالْأَوْلَادِ) (الحديد) 20 de, dibêje (وَمَا الْحَيَاةُ الدُّنْيَا إِلَّا مَتَاعُ الْعُرُورِ)¹¹⁰ “Agahdar bin!bi rastî herçî jiyana dinyayê ye ,bes leyîsten,mijûlî ,xweşkahi ,dinavbera hevda xwemezî kirin e, jiyana dinyayê wekî barenekê ye ku geyayê wê cûtkar kêfxweş dike, piştra hişk bibe ,tû dibinê kuvaya zer buye paşê dibe pûş û pelax û di axîretêda jî ezebêkî dijware (jî bo kasê dinya yê li ser axîretêda bigre), ya jî lêbûrîn û keremeke li cem xwedêya (ji bo yê axîretê li ser dinyayê ra bigre).jiyana dînyayê jî male xepandinê pê ve ne tiştêkî dine” Em nikarin jiyana dinyayê ya Mehwî Xwedênas û mitesewif li derveyî bandora van ayet û Qur’ana pîroz rave bikin. Mewlana Mehwî xwe wek fidakar û kesekî ehlê Xwedê dibîne. Yanî têgihîştina Mehwî ya jiyana dinyayê di çarçoveya hukm û yasayên Qur’an û tesewifa îslamî de bû.

Mehwî bawer dîkir ku ev jiyana kurt e û baweriya wî bi jiyana dawî (cennet) an buhiştê hebû. Lê di heman demê de jî jiyana red nake. Mehwî dixwaze bi rêya eşqa îlahî jiyana xwe zengîn bike, jiyaneke ku bîngeha wê yasayên îslamê be.

Bi baweriya Mehwî, jiyana dinyayê mirovan ji biha û nîrxên însaniyetê dûr dixe, wan bi xweşî û zînetên dinyayê xafil dike û di dawî de wan ber bi hilweşandinê ve dibe.

Û ev kêşe û pîrsgirêk hemû di nefsa mirov de kom bûne, nefsa dijminê mirovan e û wan ber bi rêya tarî ve dibe û serê wan tevlihev dike.

Mehwî di vê helbestê de behsa xwe dike û dibêje:

(Le çend û çonî dunyada, be zayi çûnî umrim çend

Xudaye be zayi çim, be heqî zatî bêçûnit)¹¹¹

Herwiha dibêje:

(Dile erşî Xuda Mehwî, xecalet be, leber xeflet

Ke bote, but û kedey, bê berhem in, ya dêrî rahîb)¹¹²

¹⁰⁹ Qur’ana Kerîm, *Sûreya El Umran*, r.185.

¹¹⁰ Jêderê Berê, *Sûreya El Hedîd*, r.20.

¹¹¹ Muderis, *Dîwana Mehwî*, r.76.

Li vir jiyana dinyayê li ba Mehwî wek deryayeke bi şepêl e. Mehwî tê ku di nav de noq bibe, temen jî winda bike, hawar û firyadî Xwedê dike ji wiha zêdetir winda nebe, li hana wî bê. Di malika duyem de, behsa bêagehiya xwe dike ku eger Mehwî berê xwe dabe jiyana dinyayê, ango ber bi xefletê ve çûye, yanî bêageh e û divê vegere, bê ser hişê xwe, dilê te ku cihê Xwedê ye niha bûye wek pûtxaneya bê rehman, kenîseya bê reben, ev jî wê yekê derdixe ku bûna Mehwî di wê yekê de ye berê xwe bide Xweda, wî berê dilê xwe ku cihê Xwedê ye, badaye aliyên din, wax ji vê guherîna bêserûber, ev ders û waneyeke rohn û eşkere ye ku divê dil û eqlê mirov li ba Xwedê be di jiyânê de, heke na wê jiyana te ber bi tarîbûn û korbûnê ve here.

Çimkî li gor Mehwî, jiyana dinyayê ti azadî û biha û nirxeke mirovatiyê nahêle, lewra Mehwî li dû azadî û bûna xwe ya resen digere û di vê helbestê de dibêje:

(Eger azadegiyek bê le edemda boman

Çî heye xeyrî be pêşî pel pel dawî heyat) ¹¹³

Mewlana Mehwî jiyana wek daveke pelpel û bi şax û pax pêçayî dibîne ku, ti azadî û serbestî tê de nîne, ewqas serê wê hene ku tu nizanî ji kîjanî ji wan rizgar bibî. Divê mirov xwe ji vê dava sedserî a heyatê rizgar bike, xwe îzole bike, cîhana tenêtiyê her çawa be azadiyê berteng dike. Di helbesteke din de, Mehwî bi heman awayî dibêje:

(Bew hemû taliyewe şerbetî merg, ehlî heya

Xoşî gewaratire boy êste le şekrawî heyat

Ango li ba mirovên ehlê Xwedê û bi fedî û heya, jiyana ewqasî nexweş û bêzarker e ku şerbeta mirinê bi wê hemû tehliya xwe, ji avşekirê (şerbeta) heyatê xweştir e. Lê jiyana dinyayê li ba mirovên pîs û xirab xweş e. Lê li ba Mehwî û mirovên merd tehlîrîn tişt e, ku mirin li gor wê şerbet e, yanî tama mirinê ji tama jiyânê xweştir e, herwiha jiyana tehlîrîn û tarîrîn rê ye li ba mirovên merd.) ¹¹⁴

Mehwî êrişî hogirên dinyayê dike, çî mirov bin yanî kesên asayî, yan zahid an kesên din. Ku wiha nîşan didin kesên ehlê Xwedê ne û dev ji jiyana dinyayê berdane û bi pey jiyana axiretê ketine. Mehwî dibêje:

¹¹² Jêderê Berê, r.55.

¹¹³ Jêderê Berê, r.64.

¹¹⁴ Jêderê Berê, r.65.

(Rîşêkî pan û, tûkî binagoyê, dirêj û lûl

Sofi le dînî lade be dîmen le cu deka

Mewlana Mehwî di vê êrişa li ser zahid û sofîyan de nîşan dide ku zahidê rasteqîn ew e ku, berê xwe ji jiyana dinyayê biguherîne, piştî xwe bide xweşiyên dinyayê, lê di dema niha de jiyane ew kes guherandine, mahiyeta xwe ji dest dane. Ew rih û navlixwekirin wek maskeyekê ye ji bo veşartina rûyê xwe yê rasteqîn) ¹¹⁵ Ev baweriya Mehwî li ba Mewlana Romî jî heman tişt e ku dibêje:

(Az hizaran yek nefer zîn sofî and

Ma beqa der dewlet wî mî zînd

Bi baweriya Mewlana, xelk du grûp in, yan em zelaltir bêjin sofî du grûp in, çê û no ango karbaş û karxirab.heman fikre ji def mehwî hene ku ji hezaran sufî yek ji sufîyên rasteqinene, Eşkere ye ku kesê karbaş an sofîyê ehlê Xwedê wicûda ango hebûna xwe di îmana xwe ya rasteqîn de dibîne û bê îman ti fikr û hizreke wî nîne. Û grûpa duyem ku ligel grûpa yekem kar dike, tevî ku bi reng û dîmen xwe wefadar û dilsoz nîşan dide, lê fikr û bawermendiya wan li cem siyaset û pere û tiştên din e.) ¹¹⁶

Ev êrişa wî li ser jiyane û piştî mirovan îjar zahidan, baweriya reşbîn a jiyana dinyayê û hogirên wê nîşanî me dide ku encama wê xirab e, pêwist e beriya jîdestdana demê hişyariyê bidest bixe. Çimkî bawer dike mirovê bêqisûr xwe di wê yekê de dibîne ku bihayên civakî û însanî û azadiyê bidest bixe. Ew kamilbûn jî bi rêya terikandina dinyayê û kontrolkirina nefsî xwe û mirandina tiştên xirab di nefsê de tê bidestxistin. Mehwî ji bo cudakirina xwe hewl dide, dixwaze bi rêya wê isyan an yaxîbûnê ji van kesan û komel û civakê cuda bibe (tew êrişî Xizr dike ku daxwaza jiyane di vê dinyayê de kiriye. Mehwî ne ligel vê baweriyê ye û di vê helbestê de dibêje:

(Xizr eger çawî heyatî biriye awî heyat

Min le xakî derî cananeme her çawî heyat

Mirdinêkî leber ew qapiyeda merdane

Bexuda çatire emro le gilarawî heyat

¹¹⁵ Qeredaxî, *Mehwî di Navbera Hezkirina Dinyayê û Eşqa Xwedayî de*, r.319.

¹¹⁶Elî Esxer Helebî, *Şinaxet Îrfan û Arîfanê Îran*, Intişarat Zewar, Taran, 1390, Çapa Şeşan, r.86.

Mewlana dibêje eger Xizr çavê xwe berdaye ava heyatê, û bi rêya vexwarina wê avê doza heyatê kiriye, ez bi xwe wiha nakim, ez ji bo jiyane û mabûna min li jiyane, xweliya ber deriyê yar dixwim, daku ez bijîm, yanî ez wê jiyane naxwazim ku Xizr bi dû ketiye, eger ez di nav wê xweliyê de bimirim jî, ji çirava heyatê çêtir e.) ¹¹⁷

Mehwiye Xwedenas encama vê êrişê û xwecudakirina ji takekes û komel û civakê, ji me re nîşan dide ku ev çîn kamilbûna xwe ji dest didin. (Ev baweriya Mehwi ji heman baweriya arifê mezin Îzedîn Nesfî nêzîk e ku bi baweriya Nesfî, mirovê kamil ê azad ew e ku bi serê qelema xwe biha û nirxên însanî neqş bike, ku xwe di gotina çak û kirdeya çak û terikandin û qenahetê de dibîne.) ¹¹⁸

(Li gor Mehwi pêxistin û dadana şoreşê li dijî jiyana dinyayê, destpêkirina desthilatdariya jiyana Mehwi ya taybet e, tenê bi çeka deriyê kerem û comerdiyê (qapî kerem) dest pê dike û di vê helbestê de dibêje:

(Qapî û babî kesêkim ke nîşanim bide, biçim

Xeyrî qapî kerem û babî eta nîme melaz

Yanî cih û penageha min ji ber xirabiya civakê wiha xirab bûye, min xwe avêtiye ber derî yan qapiyê te, eger tu jî min venehewînî, kesekî baş nîşanî min bide, ez xwe biavêjim bextê wî.) ¹¹⁹

Ev lava û lûbandina Mehwi di guherandina arasteya jiyana xwe de, encama tirsê ye, tirseke ku Mehwi ji êgirê eşqa Xwedê nêzîk dike, ji kes û civaka xirab rizgar dibe, çimkî ew tirs wiha li Mehwi dike xwedî îradeyeke bilind û kesekî bi avrû be, çimkî ken di rûyê jiyane de, mirov ber bi bêavrûtî û kêmrûmetiyê ve dibe. Mehwi di vê helbestê de dibêje:

(Abrrû beyekcarî çunî xunçe, yek dem xende bû

Ger heyat ey dil dewê, şîwen ke (madam el heyat)

Mehwi hurdekariyeke nazik di vê helbestê de kiriye. Dibêje xunçe avrûya wê çû lewra gul sîs bû, terrbûna pelên wê nema, ku tekane carekê devê xwe vekir girmijîneke nejidil kir, wiha lê hat, de tu jî ey dil eger heyat bê nexwazî avrûya te here, heta tu saxî

¹¹⁷ Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwi*, r.97.

¹¹⁸ Eta Allah Tedîn, *Cilwehay Tesewuf û Îrfan Der Îran û Cihan*, Intîşarat Tehran, Tehran, 1388, Çapa Çaran, r.218.

¹¹⁹ Muderis, *Dîwana Mehwi*, r.116.

digirî, di rûyê jiyânê de nakenî.)¹²⁰ Bi her hal ev nivîsar li ba Mehwî nerîna wî bo jiyânê, ew e ku jiyana dinyayê du rûyên wê hene, rûyekî kirêt e ku tê bi rûyê mirov de, rûyekî din jî baş e, ku li ba mirov bi xwe ye, di vî beşî de tenê rûyê wê yê xirab hatiye nîşandan, de ey bendeyê Xwedê hîn wext û temenê te winda nebûye, pihînekê li vê bexşîna dinyayê bide, yanî (jiyana dinyayê), dema xwe û jiyana xwe ji bo (babuleta) xerc bike. Dil bike erşê Xwedê û însan herçiqasî berê xwe dabe Xwedê, hemû temenê xwe di xizmeta wî de xerc kiribe, ne tiştê e û hîn jî kêr e, hemû wextê wî vala çûye, herçî navê Xwedê jî anîbe wek dubarekirina ABê ye.

Wek Mehwî di vê malikê de dibêje:

**Be zayî çû le mala yanî ya weqtim hemû, yanî
Debê weqtê le ebûlweqtê bixwazim tiya bimirim**

Herwiha dibêje:

**Bexuda qisem legel dilî xalî le sozî eşq
Tekrarî herfe bes demi pir le yaxuda xuda)**¹²¹

Yanî tevî wê xweparastin û dev tijebûna min bi gotina “Ya Xweda” hêj wek dubarekirina AByê dibînim, bi qenaheta Mehwî mişt nebûye, wext jî hemû vala çûye, divê ez wextê ji ebûlwext (bavê demê=Xwedê) bixwazim da tê de bimirim)¹²²

(Ev baweriya Mehwî eynî mîna baweriya Mewlan Romî ye ku dibêje divê sofî kurê katê (demê) be ango dema niha, yan îro, lê ne sibe. Romî dibêje:

**Sofî ibn el weqt başed ey refîq
Nîst ferda guftin az şert terîq)**¹²³

Bi şêweyekê dawîya jiyân û dinyayê li ba Mehwî nedaxwazkirî ye. Mehwî ji bo jiyânê berê xwe nade jiyana dinyayê û jiyana dinyayê wek namerdî û ne cihê ehlê şerm û heyayê dibîne. Herçî jiyana axiretê ye jî mabûn û darulbeqaya mirovan e, dawîya wê nîne. Cihê vehewîna dayîmî ya mirov e. Bo destpêkirina jiyana xwe yan hewldan bo tijekirina wateya jiyânê, Mehwî yasaya taybet a eşqê û lêgerîna bi dû Xwedê û

¹²⁰ Hewartî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r. 94.

¹²¹ Jêderê Berê, r.263.

¹²² Jêderê Berê, r.39.

¹²³ Şahîn, *Gulxaneya Arîfan*, r.351.

çespondina resm û terîqeta eşqê, pişaftin di nav eşqa yar de, tu wî wextî naxwazî yar dûr bikeve, bi nemana yar Mehwî jiyana xwe ji dest dide.

Mehwî di vê helbestê de dibêje:


**(Xizr eger çawî heyatî biriye awî heyat
Min le xakî derî cananemewe her çawî heyat**

Piştî jî dibêje:

**Ke wextê al û yaranî le xizmetiya debin wek
Heyate, nûrî çawe, unsî cane, mehzî insane**

Yanî jiyana Mehwî di bûna yar û al û yarên yar de şênber dibe, bi rêya şopandina eşqê ku digihîje wîsal û gihîştina yar.

2.3.Şêwazên jiyana Dinyayê li ba Mehwî



Di dinyayê de siruştî karê tevger û hizra mirov wiha bû ku li jêr bandora bûyer û pêwistiyên rojane bi berdewamî di guherînê de bû. Pêkan e di karekî yan şîrovekirina wî ji bo diyardeyekê şiyana fikirîn an şiyana peydakirina pêdiviyeye rojane rastî bargiraniyê were, lê bi guherîna rojan û derbaskirina wan hewl daye alternatîvekê jê re bibîne ji bo gihîştina bi encamê yan tiştêkî ku zaniye ziyan pê gihandiyê heta ku îro hewl daye ji sibe ve bi dû bedîlê wê yan ji wê baştir bigere. Ji ya pêştir dûr ketiyê, gelo êdî tirs be yan pêşketina fikirî be, girîng ew e ku mirov jiyana xwe dewlemend bike bêyî ku wê bixê ber metirsiya gedeweyî. Jiyana wiha hatiye heta îro, mirov cudahiya fikr û hizrên nû û teknolojiya nû dibîne, redkirina tiştên munasib ên îro, hewldan ji bo siberojê, ev jî carê

wiha bû hizra takekesekî bû ku şoreşek di jiyana nû û dûre ji bo civakê dikir an ji aliyê taxim û desteyeke civakê ve ew kar bi dawî tê.

Eger ez ji babetê dût nekevim û werim ser vê babetê, em dikarin bi kurtî bêjin, mecal û şiyana her mirovekî heye ku, jiyana xwe ya taybet dewlemend bike. Gelo êdî ew jirêderketina wî ya fikrî xêr be yan şer be, em behsa van herdu encaman nakin, lê girîng ew e ji bo çi ev pêngav avêtiye, sedema dehfdana wî çi ye û bi rêyeke çawa digihe wê isyan û yaxîbûnê ku jiyana wî ji jiyana xelkê cuda be. Helbestvanê me Mehwî ji me re diyar kir ku dinya û jiyana dinyayê yan ew jiyana ku hatiye bexşirin û li ba hemûyan heye, ji me re nabe jiyanêke mişt xweşî û şadî. Mewlana Mehwî xwedî ezmûn û tecrûbeyeke zengîn û dirêj e, dinyadîtina wî ji ya mirovên din cuda ye. Mehwî dixwaze bi aliyê eql û îmanê taristana temenê xwe rewşen bike, bi rêyekê ku dixwaze taqî bike û bigihe yar ku, pêştir yar li wê jiyana nedîtiye, nefsê baskê xwe vedaye ser eql û dil, dilê wî jî bi hizra Xwedê di xafilîyê de bû, çimkî Mehwî bi vê gotinê bawer dike ku dibêje (قلب المؤمن عرش الرحمن) “dilê mirovê bawerdar erşê Xwedê ye”¹²⁴

Ev dilgermkirina bi nûr û ronahiya Xwedê, ew e ku Mehwî xwe dispêre Xwedayekî belkî ji vê cîhan an jiyana tije alozî û kêşe rizgar bibe. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Ta zulmetî wicûde, terîkî le nûrî îşq

Sêber nema hetawe ke Mehwî nema xuda

Ango bila li bîra te be, eger tu li nefsa xwe binerî, taristanê dibînî. Lê li wê taristanê Xweda jî tê jibîrkin, dil vala dibe, yanî dev ji xweperestiyê berde, dev ji xwe berde û berê xwe bide ronahiya nûra Xwedê (nûra îşqê)¹²⁵

Herwiha bûna Mehwî di vê helbestê de xafilbûna dilê Mehwî nîşan dide di jiyana dinyayê de, anga (jiyana nefsê) (nefsa şehwanî-ammare bîlsû) û dibêje:

(Dile erşî xuda (Mehwî) xecalet be, leber xeflet

Ke but û kedey, bê berhemen ya dêrî rahîb

Yanî dil erş û nexşa Xweda ye, îşaret e ji bo wê gotina sofî ku dibêje:

¹²⁴Şêx Emîn Şêx Aladîn Neqşbendî, *Tesewîf çî ye*, Çapxaneyê Çwarçira, Silêmanî, 2015, Çapa Sêyem, r.489.

¹²⁵ Hewarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.38.

((قلب المؤمن عرش الرحمن)) “dilê mirovê bawerdar erşê Xwedê ye” dil cih û nexşa Xweda ye, heyf e dilê te, ewqasî xafil bûye, di wê xafilbûnê de jî rênimayiyên Yezdan pêrew nake, hîn zû ye yaxî be li wê bûna dilê te ku dişibe pûtxane û kilîseyê.)¹²⁶

Eger Mehwî bi vî halî bimîne, êdî jiyana wî li derfeta çê û heyadar naçe, belkî helbestvan Mehwî li jiyaneke merdane digere, jiyaneke hemû ruh û laşê te ji bona işqa Xweda bişewite. Di vê cudakirinê de Mehwî 1. Jiyana merdane (zindî) 2. Jiyana nemerdane (nezindî) diyar dike, ji ber hokarên pêştir ku me behsa wan kir, şoreşa jiyana merdane pêdixê. Çimkî Mehwî li hember dinya, jiyana, takekes, komel, civak û oldarên terîqetê reşbîn bû. Lewra pêwistî bi şoreşa kirdarî û şewitîner heye ji bo jinavbirina jiyana dinyayê (jiyana nemerdî) (nezindî), û di vê helbestê de hokara şoreşa xwe nîşan dide:

(Demêke şarî pir şorî mehbet mat û xamoşe

Be qanûnî tecenûn şorişê însa nekem çîbikem

Yanî ev demeke şarê mişt hezkirina yar (Xweda) di dil de mat û xilmaş e, ji bo anîna dilê yar, divê şoreşeke agirîn û bixwîn, yasayî pêxîne. Ne bi wê şoreşê be, zulmeta teqwa û heqîqetê nayê kifşkirin)¹²⁷

Çimkî jiyana merdane yan zindî li ba Mehwî armanc bû, ji bo derketina hezkirina Xweda di dil de, bi mabûna li jiyana dinyayê, şarê mehbetê xilmaş e. Xweda jî tê jibîrkin çimkî ew jiyana Mehwî dixê qonaxa xafilbûnê de, ev qonax qonaxa nemerdîyê ye, divê tu merd bî dev ji hertiştî berdî, (merd, bi tena serê xwe yek ji bêjeyên tesewifê ye ku tê wateya dilê, camêr an çeleng, mebest jê mirovê olperestê rast e ku bi mêrxasî ji bo dîn û dinyayê diaxive û tevdigere.)¹²⁸

Kesê merd hertim devbigirî û bi nalîn û fixan e ji bo zulmeta Xweda, kesê merd ne dilxweş û devbiken e, hertim tirs di dilê wî de cih girtiye. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Ecîbim dê le eqfî ew kesey, watêdega merde

¹²⁶ Jêderê Berê, r.87.

¹²⁷ Umer Ezîz Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, Çapxaneya Ezmer, Silêmanî, 2012, Çapa Yekem, Cildê Çarem, r.266-267.

¹²⁸ Umer Ezîz Mehwî, *Ji Ferhengistana Dîwana Mehwî*, Çapxaneya Ezmer, Silêmanî, 2014, Çapa Yekem, I. r.17-18.

Keçî wek xan û xanim, dayîma dil xoş û bê gerde

Ango dilxweşî û ken ên kesên nemerd e, di jiyana merdayetî ya zindî de nînin, di eşqa Xweda de bê şiyar dibî.)¹²⁹

Ango di vê helbestê de êrişî dinyaperestan û jiyandostan (jiyana nemerdî) dike û dibêje:

(Nelê merdim, ke dunya piştî lew, ew rû le dunya bê

Ke purî zale, boçî pîre zalî pê reza nabê

Ew kesên ku berê wan li dinya û jiyane ye, her rojek tê jiyana û dinya dev ji wan berdide, piştî xwe dide wan, ew jî her alîgirê wan in, ev cure kes û xelk nemerd û ne camêr in, ji jiyana û kesayetiya merdane dûr in.)¹³⁰

Çimkî bi rastî dawîya wê dinyayê pir xirab e û dilsozî û wefadariya wê ji bo kesî nîne, beriya xwe ji te bêrî bike, tu xwe ji dinyayê bêrî bike. Ê herwiha (careke din Mehî kesên dev ji dinyayê yan jiyane berdidin wek merd wesf dike û dibêje:

(Dunya ke hîçe, cumle dezanin, keçî çî kes

Merdane bo xuda nî ye des helgirê le hîç)¹³¹

Ev jiyana bi destê kesên xirab bûye serdema xirabî û malwêraniyê ku hîç û xirabên dinyayê xwe naporêzin, qenc dizanin ev dinya hîç e û ne arezûya kesên merd e, çimkî mirovê Xwedênas merd e û li dû jiyana merdayetiye digere.

(Herwiha bi heman awayî Mehî di vê helbestê de jî behsa kêmbûna mirovên merd û nebûna jiyaneke merdayetiye ji bo mirovan dike:

Namerd ewende muiteber in, lem zemaneda

Merdî îtibarî kem bûwe, merdî xwa xusu)¹³²

Merd jiyana xirab û reftara kirêt qebûl nake, naçe nav çarçoveya teng a jiyana merdayetiye, çimkî dilê wî pak û paqij e. Lê nemerd bi dû tiştên dinyayê dikeve û hertiştî qebûl dike, ev jî jiyaneke nemerdî ye, lê nemerd pir bûne di vê serdemê de, pêwist e Mehî şoreşê pêxîne. Ber bi jiyana zindî gav biavêje. Jiyanek ku ji nefis û derûna xirab serkeş û yaxî be. Mehî yekem pêngava xwe di cudakirina jiyana xelkên

¹²⁹ Mehî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yê Mewlana Mehî*, r. 269.

¹³⁰ Huarî Neseb, *Dîwana Mehî*, r. 38.

¹³¹ Mehî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yê Mewlana Mehî*, r.351.

¹³² Huarî Neseb, *Dîwana Mehî*, r.38.

din an jiyana dinyayê û mabûn û berdewamkirina jiyana zindî yan jiyana zindî ya Mehwî, cudakirina wî ji wan e, sazkirina jiyaneke taybet û birûmet e. Mehwî jiyana xwe tevlî jiyana wan nake û di vê helbestê de dibêje:

**(Dem le dem nanî reqîban çi bê mirwetî ye
Têkelî awî deba xane deka awî heyat) ¹³³**

Mehwî mabûna di vê gengeşeyê de yan axaftina dualî ligel van kesan wiha dibîne wek ku Mehwî jiyana xwe ya zindî tevlî jiyana van kesan dike ku jiyana wan bi debaxane (debaxxane an jî ava pîs û qirêj) hatiye şibandin. Mehwî naxwaze tevlî van mirovan bibe, ev mijûl in bi şerbet û avşekira jiyane, jiyana li ba wan pir şêrîn e, ev ne ji helê şerm û heyayê ne. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

**(Bew hemû taliyewe şerbetî merg, ehlî heya
Xoşî gewaratir e boy êste le şekirawî heyat) ¹³⁴**

Yanî mirin ku çiqasî giran û tehl e, li ba ehlên merdîtî û heyayê fena şerbetê şêrîn e. Mirovên nemerd her bexşîneke vê dinyayê wek jiyana û şerbeta jiyane dibînin. Mehwî vê yekê dibêje ji bo herdu cureyên mirovan ji hev cuda bike. Çimkî jiyana ku bi xwe nexweş e li ba kesên nemerd xweş e û mirin jî li ba merdan wek hungiv şêrîn e. Mehwî vê cudakariya jiyana merd û nemerdan, di wê yekê de ye dibîne ku ehlê heya bi rêya etîketên eşqê (eşqa Xwedayî) dikarin ber bi jiyaneke merdane herin.

Çimkî kesê merd bi rêya tirs û pêrewkirina eşqê dikare wê jiyane hilbijêre, herçî ehlê nemerd û jiyana nemerdane heye, bi dû nefis û jibîrkirina Xweda çûne, ev çîn jî di Qiyametê de ji agir û sizayê Xwedê nayên parastin. Mehwiye Xwedênas wek arifekî dîn û tihniyê warê eşqê bidest bixe (çimkî jiyana zindî ya arifan pêrewkirina rênimayiyên Xwedê ye êdî dil ji mirina rasteqîn bêminet dibe, pir siruştî dibe, digihe nemiriyê, amaje ye bo wê ayeta ku dibêje: (Ew men kane meyten feaheynahû we cehlana lehû nûren yemşî bihî filnas) ¹³⁵

¹³³ Jêderê Berê, r.99.

¹³⁴ Hewarî Neseb, *Dîwana Mehwi*, r.99.

¹³⁵ Merziye Silêmanî, *Istîlahat Sofîyan*, Intîşarat Ilmî û Ferhengî, Tehran, 1388, Çapa Yekem, r.157.

Motîfa vê jiyânê (jiyana merdane, zindî), tirs wiha li Mehwî dike, vê jiyânê hilbijêre, bigihe parêzvanên vê dinyayê, di vê helbestê de hest bi vê tirsê Mehwî tê kirin ku dibêje:

(Abrû yekcarî çûnî xunçe, yek dem xende bû

Ger heyat ey dil dewê, şîwen ke (madam elheyat)) ¹³⁶

Ango tirsê Mehwî wiha lê dike herdem di vê jiyânê de (jiyana zindî, merdane) dev bi girî be, ne dilxweş be, çimkî kesê dilxweş nemerd e, kesê ji siberoj û Qiyametê ne piştrast be çawa dilxweş dibe, lê ligel vê yekê jî bi girtina rêya eşqê û nûra eşqê em digihin kenarê aram, parastiyên sizayê wê dinyayê dibin. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Ta zulmetî wucûde terîkî le nûrî eşq

Sêber nemawe hetawe ke Mehwî nema xuda

Bo gum buwanî çolî mehbetiyetî xuda

Tebşîrî (el selamû ala tabî el hûda) ¹³⁷

Yanî bi nûr û ronahiya eşqê li parastiyên sizayê Qiyametê ewên ku rê winda nakin taristan rohn û rewşen dibe. Ewên ku dane ser rêya hezkirina Xwedê û ber bi jiyana zindî û merdane çûne. Edet û nerîtên eşqê di bernameya sereke û bihêz a ehlê merd û pêrewên jiyana merdane, ew dikarin bi merasîma eşqê, jiyaneke merdane û zindî saz bikin.

(Etîketên eşqê li ba Mehwî, hezkirina evîndarî ya sofî û îmandaran e, rêyeke dijwar û zehmet e, ya ehlê heya û îmanê ye, ku çawa sofî bigihe wê eşq û hezkirina Xwedê û pêxember û yarên wî), ku xwe di şerîet û terîqetê de dibîne, derketina ji wê destûrê, derketin e ji jiyana merd an jiyana zindî ya vê dinyayê û wê dinyayê, ku vê yekê jî cih û rêya xwe ya taybetmend heye) ¹³⁸ Şopandina vê rêyê ji hewadarên xuda ne,

¹³⁶ Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.94.

¹³⁷ Hewarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.30.

¹³⁸ Mehwî, *Ji Ferhengistana Dîwana Mehwî*, r.17.

parastiyên sizayê Xwedê ne di roja Qiyametê de. (Çimkî eşq tariyê ji te re rewşen dike, bêkesan dike kesdar û wan bi xwedî dike. Mehwî derbarê eşqê dibêje:

(Eşq agirêke berêwe her kes, debê be kes

Ger roje reş, wekû şew debê, bû beşewçirax) ¹³⁹

Yekem pêngava eşqê ji kuştina nefsê dest pê dike. Çimkî nefs mezintirîn dijmin û rêberê rêşaşkerê însên e di vê jiyânê de, kesek nefsa xwe cilew û hefsar neke, dilê wî mirî ye, ne ji ehlê şerm û heyayê ye. Belkî ehlê heyatê ye (ehlê jiyana nezindî), wek Mehwî derbarê nefsê dibêje:

(Esîr û seydî qedîd û şeydî nefsî emmarem

Le destî em mare bed çare, çiyê çarim, Xuda çarim

Nefs xatirê xwe ji însên naxwaze, hertim wek sîber pê re ye, lewra divê mirov ji nefsa xwe bitirse û zanibe xwedî belayeke çawa ye, di her kêliyê de be serê wî dixê derdekî de. Em dibînin ku nefs li ba Mehwî, hatiye bêminetkirin û kar pê nayê kirin:

(Bê minet rizqêke xem, bimirim le birsan ew dexom

Tefre naxom, û teleb nakem le dunya qutî roh) ¹⁴⁰

Mehwî bi vê şewazê gavan diavêje ji bo isyan û yaxîbûna ji nefsa xwe, xem û rizqê xem û xembariyê rizqekî bê erk û bê minet e, heta ev rizqê min li jiyânê hebe, ez mineta nefsê hîlnadim. Eger ez ji birçîna jî bimirim, bê minet her xemê dixwim, tevî ku qûtê ruh jî bi rûyê min de bê, ev îzetnefseke mezin û bilind nîşandana Mehwî ye. Ev helbesta Mehwî amajekirin e bi gotina Xwedayê mezin dema dibêje (We leneblûwenekum bîşy'în mîne'l-xewfî we'l-cû'î), birçîtî yek ji sîfetên rêbwarên parêzvanên nefsê ye) (elmûcahede) tê, çimkî serkeftina bi nefsê li dinyayê, rizgarbûn e ji mîhnetxanê, Quşeyrî (W 465 K)tarî dibêje her kes bi ser nefs û şehwetên xwe biserket dêw ji wî ditirse) ¹⁴¹ (Herwiha Xwedê mezin di sureya (النازعات) 40 , de dibêje (وَأَمَّا مَنْ) “خَافَ مَقَامَ رَبِّهِ وَنَهَى النَّفْسَ عَنِ الْهَوَى” “Herçî ku jî meznayî û rabûna destê xwedayê xwe tirsiyaba nefsa xwe hewesên yê(xirap) dabe paş” Quşeyrî dibêje rûbirûbûna nefsê

¹³⁹Şahîn, *Gulxaneyê Arîfan*, r.416.

¹⁴⁰Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.137.

¹⁴¹ Ebû Elî Hesên Ibn Ehmed Osman, *Rîsaletel Qeşîriye*, Çapxaneyê Xaşîi, Tehran, 1388, Çapa Duyem, r.273.

nihêniya îbadetê ye, û herwiha Cuneydê Bexdâdî (W.297. K) dibêje (Nefs fermankarekî xirab e, ku te ber bi derdeseriyê dibe, yarîkerekî dijinker ê mirov e) ¹⁴²

Heman bawerî û boçûna şîrovekirina gotina wan li ba Mehwiye mitesewif û Xwedênas hebû, derbarê nefse û redkirina wê. Çimkî Mehwi yek ji pêrewkerên dinyaya tesewif û îrfanê bû. Piştî Mehwi di helbesteke din de nefs şibandiye ruhberê herî dirinde û bixof ku mar e, mar jî herwek em dizanin em wî nabînin heta bi me ve nede û ziyane negihîne me, nefs jî wiha ye, te xafil dike dûre bi te ve dide, ku ev jî sîfeteke şeytanî ye, çimkî her tiştek ziyane bigihîne mirov û baweriya wî, ew kirdeyeke şeytanî ye, (em dibînin ku Fexreddîn Iraqî jî nefs bi nefsa şeytanî şibandiye, heman nefsa ammare (dagirtî yan tije ye bi pîsiyê) ¹⁴³ ku li ba Mehwi jî bi heman awayî amaje pê hatiye kirin. Mehwi bawer dike mirov eger teslîmî nefs û şehwetê bû, zindîtî û însaniyeta xwe ji dest dide. Mehwi di vê helbestê de dibêje:

(Le mekrî em ecûze û sîhrî dêwî nefis emin (Mehwî)

Pena degrim be zatî eqdesî bêcûnî nadîwe) ¹⁴⁴

Em dibînin di vê helbestê nefis bi dêw hatiye şibandin, ku ji rengdana boçûna Fexreddîn Iraqî nêzik e ku bi şeytan an nefsa şeytanî şibandiye. Li ba Mehwi jî nefis wek dêw e, herwek dêwên bêîman beşek ji şeytan in. Mehwiye Xwedênas jiyana xwe bi pêngava yekem bi kuştina nefse dest pê dike. Bi neman û têkberina nefse, xweşiya jiyane dest pê dike. Lê divê Mehwi miqate be û dilaramiyê nede xwe ku bi temami zora nefse biriye, nexêr çimkî nefis bêewle ye, heta dawiya temen bi dû te ve ye, piştî bêdengkirin û serkutkirina nefse, divê Mehwi yaxîbûna xwe ji komel û civak û oldaran ragihîne, çimkî Mehwi ava heyatê tevlî debaxaneyê nake, pêwîst e ji van deste û çinan cuda bibe û ji wan dûr here.

Çimkî ev deste û çin dibin sedemê destê betal û nemana bihayê însên û têkdana jiyana Mehwi. Mehwi di vê helbestê de serdema xwe rexne dike û dibêje:

(Telebî rehm û mirwet le dilî ehîl zeman

Telebî awî heyate le serabistana) ¹⁴⁵

¹⁴² Jêderê Berê, r. 287-288.

¹⁴³ Nesrîn Muhteşem Xezay, *Kuliyat Fexreddîn Iraqî*, Intîşarat Zwa, Tehran, 1392, Çapa Çaran, r.31.

¹⁴⁴ Muderis, *Dîwana Mehwi*, r.290.

¹⁴⁵ Jêderê Berê.r.33.

Mehwî serdema xwe rexne dike ku mabûna jiyane di nav wan de bêsiid û bê mirwetî ye, ev xelk bûne alîgirên dinyayê, mabûna min di nav wan de wek ku ez bi dû avê de bigirim li serabistanê, serabistan (leylan an rewrewk) ew cih e ku ji dûr ve wiha tê pêş çav ku av tê de heye, lê dema tu digihe ba wê, ji bejahiyê zêdetir tiştêkî din nîne, lê tîrêjên rojê ye dibiriqê, wiha tê pêş çav ku av lê heye. Mabûna Mehwî li jiyana dinyayê wek çavlêkerê vê xelkê, piyê xwe diavêje qonaxa miriyan an jiyaneke nezindî. Çimkî ev xelk ehlê heyatê ne, dilê wan mirî ye, Mehwî dikare di vê nexweşiyê de jiyana xwe xweş bike, pêngav ber bi jiyaneke zindî biavêje. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Deway em nefse meliûnet, dewê, her derde wek cîwe

Ke hanê kuştî, ew rohî mehze, em cewherî zîwe

Ango Mehwî di vê helbesta xwe de diyar dike ku heta mirov zora nefsa xwe nebe, nikare jiyaneke zindî bijî, yanî eger beşer nefsa xwe nekuje jiyana wî bêsiid û bêkêr e. Çimkî cîwe yan zîbeq bi kuştin û tevlîkirina di nav madeyên din de dibe zîv û siidmend dibe, yanî mirov jî bi kuştina nefsa dibe mirovekî pak û paqij û rêya rastî û heqîqetê dibîne.

Bi baweriya Mehwî, jiyana zindî û merdane bi ked û hewldana mirovê merd tê kirin, ji bo cudabûn û tekiilînebûna bi kesên din re, çimkî naxwaze jiyane wek wan derbas bike û tûşî malwêranîyên wan bibe.

Û dîsa (di vê helbestê de yaxîbûna xwe li hember hawîrdora xwe nîşan dide û dibêje:

(Bo dukanî muşterî gir, hewl eda kala firoş

Dênî wa dênête qiyamet, xwace eziyî bikat

Mehwî ji alim û mela û zanayan zîv dibe û wan wek sexteçî wesf dike ku mijûlî sextekarî û vedana xefkan e bi navê ol û dînê) ¹⁴⁶ Ev yaxîbûna Mehwî ji ber reftara xelkê, (heman ew yaxîbûna Bestamî ye ku ji ber reftara xelkê wiha kir ber bi yaxîbûn û îzolebûnê here) ¹⁴⁷ Quşeyrî dibêje mezintirîn heybeta însên ilm û şerm (heya), ev herdu ji min bibirin, xêr di min de namîne.) ¹⁴⁸ Mehwî jî bicoş bû di gavavêtina ber bi jiyana

¹⁴⁶ Mehwî, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r.327.

¹⁴⁷ Elî Esxer Helebî, *Şinaxet Îrfan û Arîfanê Îran*, Intişarat Zewar, Taran, 1390, Çapa Şeşan, r. 235.

¹⁴⁸ Abu Qasim Abdilkerim Bin Hwazin Quşeyrî, *Rîsaletel Qeşîriye*, Çapxaneya Xaşîi, Tehran, 1388, Çapa Duyem, r.387.

merdane, ji bo cudabûna ji jiyana nemerdane ya kesên nemerd ên wê serdemê. Ev Mehwi ji dinyaya azad an jiyana azadiyê nêzîk dike. Quşeyrî derbarê azadiyê dibêje (Azadî hemû bendan ji koletî û bendatiyê derdixe. Tutişt ji bilî Xwedê di dilê bendê wî de namîne, ev jî yek ji nîşanên dirust ên dil e. Xwedayê mezin jî di sureya (حشر) , 9 dibêje (وَيُؤْتِرُونَ عَلَىٰ أَنفُسِهِمْ وَلَوْ كَانَ بِهِمْ خَصَاصَةٌ وَيَقْشَحْنَ نَفْسَهُ فَأُولَٰئِكَ هُمُ الْمُفْلِحُونَ) ¹⁴⁹ “ew ên hî ji berê va li medinyê bigêh buna berî hicreta mûhaciran bawerî anîne , ew ji wan ku bî bal wan van hicret kirin ,hezdiken û jî bo malê ku jî wan (mûhaciran) rahatye dayin di dlê xwede çavnebariyê jî naken.çendî ku pêtiyaya wan heba jî mûhaciran liser xwera digrin(hewcehiya mûhaciran li pêşya hewcehiya xwe dibinin) kî xoj bexilya nefsa xwe biparêze bî rastî ew in yên rizgarbûyî û yên serfraz”

Pêwîst e ji bo destpêkirina jiyana xwe Mehwi yasayên jiyana dinyaya vê civakê û kes û aliyan serast bike, ked û hewldanê bike ku rêya dijwar a eşqê bişopînin ji bo tijekirina wateya jiyane. Ji bo destpêkirin û çûna nav jiyana rasteqîn pêwîst e Mehwi resm û rîtûalên eşqê cîbicî bike, di nav eşqa yar de bihile (nûra Xwedê), çimkî jiyana di nav vê civaka kes û aliyan de wek ku Mehwi jiyana xwe ya rasteqîn winda kiribe û di vê helbestê de dibêje:

(Telebî rehm û mirwet le dilî ehlî zeman

Telebî awî heyate le serabistana) ¹⁵⁰

Pêşî (serabistan) yanî ew cihê ku sîbera rojê li ser kom dibe, ji dûr ve wek cihê kombûna avê xuya dike, lê dema tu jê nêzîk dibe, ji bejahiyê zêdetir ne tiştekî din e. Ango daxwazkirina ava heyatê di nav van ehlê dinyayê û kesên vê çaxê de wek ku tu daxwaza avê ji leylan û serabistanê bikî, av di serabistanê de nîne, yanî jiyana jî di nav van de ji bo Mehwi nîne.

Yanî daxwazkirin û şopandina jiyane, baştirîn cih û kes, biyabana eşq û yar e, bi neman û dûrketina yar ji Mehwi, jiyana Mehwi tîk diçe, bi derketina yar û al û yarên yar jiyana Mehwi dest pê dike wek dibêje:

(Nebûwe qet (Mehwi) wîfî, bûnî min û to pêkewe

Husne awî zîndegî eşq agirêke dil birêj) ¹⁵¹

¹⁴⁹ Jêderê Berê, r.393.

¹⁵⁰ Muderis. *Dîwana Mehwi*, r.33.

Di vê beytê de têgeha (ava zîndegî) têgeheke sofîyan e, amaje ye bi jîyanê lê jîyaneke têkçûyî, çima têkçûyî? Çimkî yar ji Mehwî re dibêje bi hev re me nakirre, çimkî ciwaniya min wek ava jîyanê ye, eşqa te jî wek agirekî dilbirjên e, av û agir bi hev re nacivin, yanî yar dixwaze ji Mehwî dûr bikeve, ango jîyana Mehwî ku berê ji ber hebûna yar ronîdar bû, va niha bi cudabûna yar, zindîtî û jîyana Mehwî ber bi dawî diçe. Û dîsan derketin û nêzîkbûna yar tê wateya jîyan û ronahiya çav. Mehwî dibêje:

(Ke wextê al û yaranî le xizmetya debîn wek

Heyate, nûrî çawe, unsî cane, mehzi însane) ¹⁵²

Mebesta Mehwî ew e ku her bi dîtî û hevalbûna pêxember di roja Qiyametê de, dibin çavkaniya bexşîna jîyan û ruh ji bo mirovan, çav rewşen dibin, dilê wî jî aram dibe.

2.4.Ew Tiştên ku Tê wate û Hevwateya jîyana Pesendkirî (Jiyana Merdane) li Ba Mehwî.

2.4.1. Awî Heyat (Ava Heyatê)

Ev derbirîna ku di vê peyvê de heye, Mehwî di helbesta xwe de wek hevwatera jîyanê dahênan kiriye, bi wê ku ava heyatê di razîbûna Xweda di kirdeyên wî de derdikeve. Karkirin û teqwakirin ji nêzîk Xweda ve jîyanê di temenê Mehwî de diçespîne. Gihîştina bi ava heyatê, hestkirin e bi jîyanê û temenê ebedî û xweşî û sefayê. Gihîştin e bi nemiriyê. Ku maka temendirêjî û nemiriyê hilgirtiye, eger bimire jî mumkin e mirin jê re neyê gotin, lê bi giştî wek maka dirustbûna jîyanê û domandina jîyanê tê. Mehwî di vê helbesta xwe de dibêje:

(Dem le dem nanî reqîban çi bê mirwetî ye

Têkelî awî debaxane deka awî heyat) ¹⁵³

Mehwî ev hevwatera (ava heyatê) di vê helbestê de ji bo mebesta wê yekê bikar anîye ku jîyan li nêzîkî van bedkaran wek ku jîyana xwe tevî jîyana wan a pîs bike.

¹⁵¹ Jêderê Berê, r.142.

¹⁵² Jêderê Berê, r.142.

¹⁵³ Muderis, *Dîwana Mehwî*, r.60.

Çimkî derbaskirina vê cure jiyanê li ba Mehwî, ne qebûlkirî ye, lê şopandina rêya eşqa Xweda wateya jiyanê pê dide û tamam dike. Çimkî dûrketina ji Xweda xirab e. Ji bo bexşîna jiyanê divê berê xwe bide ber deriyê Xwedê. Û di vê helbestê de jî bikaranîna hevoka “ava heyatê”, mebesta jiyanê bêhtir li ba Mehwî diyar dibe.

(Xizr eger çawî heyatî birriye awî heyat

Min le xakî derî cananemewe her çawî heyat) ¹⁵⁴

Wateya vê hevwaterê diyar e ku jiyan li ba Mehwî bi xaka ber deriyê yaran dibe para min, yan ez jiyanê ji xaka ber deriyê yar dixwazim.

2.4.2. Heyat

Ev hevwaterê pir nêzîk e ji peyva (ava heyatê) di vê bêjeyê de jiyan (heyat) bi ber Mehwî ve tê, bi sedema hebûna al û yaran, maqûlên terîqet û şerîetê. Her bi dîtina wan giyan dikeve ber kesên mirî, yan dibe ku mebesta wî dîtina pêxember be ku di wê rojê de herkesê ligel be, jiyan bi ber de tê, ku şîrovekirina me li gor rengdana wê hevwaterê ye ku di vê helbestê de hatiye bikaranîn. Mehwî dibêje:

(Ke weqtî al û yaranî le xizmetiya debîn wek

Heyate, nûrî çawe, unsî cane, mehzi insane) ¹⁵⁵

Ango ji ber dîtina an hevalbûna pêxember jiyan bi ber de tê, di roja şer û mehşerê de çavkaniya wê jiyan û ruh biberdehatinê ye, rewşenbûna çavan û geşbûna dil e.

2.4.3. Ava –Xizr

Hevwaterêke din ji hevwaterên jiyanê ye ku cihê pêdana nemirî û temendirêjîyê ye, bûna Mehwî li ber qapî yan li ber deriyê Xweda maka pêdana ava heyatê ye, ewa ku Xizrê Zindî pê gihîşt û bûye sedema jiyanê dayîmî. Lê ev jiyanê dayîmî ya Mehwî li ber deriyê mala ewliya dinoşe, ji xaka wî derî jiyanê xwe ya dayîmî bidest dixê û di vê helbestê de ku hilgira şîrovekirina jorê ye dibêje:

(Awî (Xizr) e xakî ew ber qapî ye

Dirkî ew berde ke gul, poşî giyan) ¹⁵⁶

¹⁵⁴Jêderê Berê, r.63.

¹⁵⁵ Jêderê Berê, r.429.

¹⁵⁶Jêderê Berê, r.39.

Yanî ber deriyê wî cihî bexşîna jiyana dayîmî ye, ku wek gulê nazik û bêhnxweş e, heman ew av e ku Xizr vexwar û ji bo hertim maye, bi kurtî ber deriyê yar ava zindîbûn û jiyana dayîmî diyarî Mehwî dike.

2.4.4. Ruhê Teze

Dîsa ev têgeh tê wateya bexşîna jiyânê, yan tê wateya zindîbûnê, û ruhê teze gava bi ber gewdeyê Mehwî tê eger lêva yar bikeve ber lêva Mehwî, tew eger di dema candanê de be, hingê giyanekî nû û jiyaneke nû tê gewdeyê min. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

**(Le wextêka ke rohim geyiye ser leb, ruhî min be fidat
Debête rohî taze, ew lebem ger bête ser leb)** ¹⁵⁷

Ev têgeh dibe bexşîna ruh û jiyaneke teze, di encam de yan dibe çavkaniya wê lêva yar be, ango lêva yar dema bexşîna ruh e, tevî ku di dema giyandanê de jî be, dikarî jiyân û giyanê teze bi gewdeyê Mehwî de bike.

2.4.5. Zîndegî, Zindîtî

Ev hevwateriya jiyânê, li ba Mehwî hatiye bikaranîn, ku bi xwe têgeheke sofîyan e, mebest û wateya vê têgehê li gor bikaranîna wê, tê wateya ku mirov dirust bûye, yan dijî û ev hatina wî ya dinyayê dirust bûye, ji çend qetre û dilopên avekê, ku ruh bi ber wan de hatiye kirin, yanî jiyana me ji dirsutbûna wê dilopa avê, em jiyânê (zîndegiyê) birê dikin, her dema Xweda bixwaze bi ba û henaseyekê jiyânê ji me distîne û em dimirin. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

**(Be roçûnî awê dekey zîndegî
Be derçûnî bayek debê mirdinit)** ¹⁵⁸

¹⁵⁷ Jêderê Berê, r.49.

¹⁵⁸ Muderis, *Dîwana Mehwî*, r. 331.

Yanî ademîzadbûn û dirustbûna wî ji aliyê Xweda ve di encama çend dilopên avekê de bû, her dema bixwaze ji me distîne û jiyan namîne, ango qurre û pozbilind nebin, şanaziyê nekin.

2.4.6.Ruh Bexş

Ev têgeh li ba helbestvan Mehwî tê wateya jiyanê yan giyan bi berde hatinê, hokara vê ruhbexşînê temaşekirina pêxember e, bi dîtina pêxember dubare jiyan rasteqîn bi ber Mehwî de tê, tew eger mirî jî be. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Temaşakirdinêkî: roh bexşî alemî mirdû

Nîgahêkî be tundî: Restaxêzî alemî cane

Yanî temaşekirin an awirdaneke her giyanekî mirî, ruh bi berde tîne, hişyar dike û dixê ser rêya rastiye) ¹⁵⁹

2.4.7- Heyata Teze

Bi heman şeweyê ev têgeh li ba helbestvan hatiye bikaranîn bi mebesta dubare jiyan bexşînê, hêmaya jiyan teze ye ji bo helbestvan ku di encama bûn û hatina yar de, her demê yar hazir be tê wateya hebûna jiyan helbestvên, her demekê yar winda bibe tê wateya mirina helbestvan, bi hatina yar re jiyan wî teze dibe, şevçirax derdikeve û dinya ronak dibe wek Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Hevatî taze dête berim û rohim derdeçê, werna

Hewaêkî nî ye wek mewcî gewher hatin û çûnit

Ew hatin û kêferata yar û diyarbûna yar wateya jiyaneke nû ruhhatin bi laşê Mehwî dibîne û zindî dibe, her demekê jî yar diyar nemîne, wext e ruh û giyan derdikeve û ez dimirim.) ¹⁶⁰

¹⁵⁹Jêderê Berê, r.429.

¹⁶⁰Mehwî, *Ji Ferhengistana Dîwana Mehwî*, Çapxaneya Ezmer, Silêmanî, 2014, Çapa Yekem ,Î , r.70.

2.4.8. Awî Heywane

Dîsa helbestvan Mehwî vê têgeha sofî bi heman têgehên din (Ava heyatê, ava jiyânê, ava zindîtiyê) binav dike ku di taristanê de her gava Mehwî û sofîyên din ji wê avê noş bike wek Xîzr jiyana zindîti û nemiriyê bidest dixin) ¹⁶¹

Ev têgeh çavkaniya bexşîna jiyânê ye. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Îşarey yek ser enguşfî, mehî lew dûrewe şeq kird

Her ew enguşte bû detut fwarey awî heywane

Amaje ye ji bo wê bûyera pêxember ku di firavînekê de, tenê perdaxeke avê ya eshabîyan mabû û têra hemûyan nedikir, pêxember destê xwe xist nava perdaxê, av ji nav tiliyên wî herikî, bi awayekî ku têra hemûyan kir.) ¹⁶²

Helbestvan jî bi sûdwegirtina ji vê bûyerê, mebesta xwe wiha bicih aniye ku yar û hizûra yar pir sûd û jiyân bexş e bo Mehwî, bi awayekî ku Mehwî ji hemû kelem û astengiyan diparêze û ronahiya xweşiyê di jiyana Mehwî de bicih dike, çavkaniya jiyânê ye, Mehwî laş û giyanê xwe ji tihniyê rizgar dike ku hertim tihniyê dîtina heyvê ye, ango yar.

2.4.9. Jiyân

Dîsa helbestvan têgeha jiyânê bikar aniye bi tenê wek têgeha jiyânê. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Le rojî herb û zerba, rui bû û samî roh eka sersam

Eger şêrî jiyanî rûberû bê, çarî nejiyane

Ango di roja herb û derbê de (şer û cengê), herb derketina Mihemed, giyan û gewde dihile, tevî ku şêrê jiyânê be jî her çara wî nejiyan e ango kuştin e, lê dubare ji ber kombûna misilmanan li dora Mihemed dîsa dibe cihê jiyân û xweşiyê, peydabûna nûra çav, ulfetgirtina dil) ¹⁶³ motîfa vê dubarebûna jiyânê dîtina û hevalbûna pêxember e.

¹⁶¹Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.484.

¹⁶²Muderis, *Dîwana Mehwî*, r.429.

¹⁶³Jêderê Berê, r.429.

2.4.10. Canfîza

Rêya bihêzkirina giyan. Ev wateya vê têgehê ye. Têgeh ji aliyê helbestvan ve hatiye bikaranîn ku, ji ava heyatê nêzîk e, ku dîn û dil di xizmeta Xweda de bû, dibe sedema geşkirin û bihêzkirina giyan, ku wek ava heyatê, motîfa dirustbûna jiyane û bihêzkirina gewde ye. Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Nezmêkî canfîza û sefa bexşî dîn û dil

Nezmêkî terzî awî heyate rewan û rûn)¹⁶⁴

Mehwî dil û dîne xwe ji bo Xweda veqetandîye, helbestên wî jî ku berhema wî dilî ne, wek ava heyatê ye, ku jê vexwin, tucarî lêva we ziwa nabe, ew bexşîn e, di encama helbestên bialav û canfîda yên Mehwî de ye ji bo Xweda.

2.4.11. Ava Zindîtiyê

Têgeheke din ji têgehan, hevwatera giyan û zindîtiyê, ku helbestvan di tekstekê de bi wateya giyan û zindîtiyê bikar anîye (bi wê yekê ku ev çavkaniya giyan û zindîbûna min, çawa ji hîç e, belê pêştir wiha Mehwî baweriya wî hebû ku giyan û zindîti, di encama dîtina yar û wicûda mehbata yar e, wa niha ez dijîm divê wicûda yar hebe, ev giyan bê çavkanî nabe, lê ew têgihîştine ku herçiqasî tu xwe nîşanî me nedî, me mîna Mecnûn rêya eşqê girtiye û em ber nadin, Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(Dem nadiyar û nazî qisey, pir le deşt û şar

Dinyayek awî zîndegî û dextrê le hîç)¹⁶⁵

2.5. Peyv û Bêjeyên ku Bi wate û Hewwatera jiyana Neqebûlkirî

Tên li Ba Mehwî

Di vî beşê babeta me de, emê çend peyv û bêjeyan berçav bikin ku bi wateya giyan û zindîtiyê tên li ba Mehwî, lê jiyan û jînek neqebûlkirî ango eger jiyana Mehwî hebe bi

¹⁶⁴Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.446.

¹⁶⁵Mehwî, *Bêjeyên Arifî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, r.88.

vê şeweyê nîne, ev şeweya jiyane nexwestî ye, di vê dem û rêkeftê de, jiyane û heyat li ba Mehwi şewaz û resmê xwe hene. Rast e bi wateya jiyane tê, lê bi wateya wê jiyane nayê ku li ba Mehwi tê, em dikarin bibêjin jiyaneke nepesendkirî û nexwestî ye.

2.5.1. Ava Heyatê

Ev bêje yan têgeh bi hevwatera jiyane tê lê jiyaneke nepesendkirî ya nexwestî ye ku li ba Mehwi ne jiyane mebest e, çimkî bûna jiyane di nav keş û hewa yan kesên dûrî Xwedê de nabe sedema pêdana jiyane daxwazkirî, çimkî jiyane selîqe û resmê xwe yê taybet heye, di vê helbestê de wate û mebesta wî bêhtir zelal dibe, Mehwi dibêje:

Telebî rehm û mirwet le dilê ehlî zeman

Telebî awî heyate le serabistana

Yanî daxwaza dayîna ava jiyane di serabistanê de nîne yan em zelaltir bêjin jiyane û çavkaniya jiyane di nav dinya û xelkê vê heyamê de bûye xeyal û hêviyeke bêbingeh, serabistan ew cih e ku ji dûr ve wiha tê ber çav ku cihê herikîna avê ye, lê dema jê nêzîk dibî ji bejahiyê zêdetir tiştêkî din nîne. Sîbera zeviyê ye ku wiha dihate pêş çav ku av tê de heye. Ango ev cure jiyane ne daxwaza Mehwi ye, jiyane wiha di nav xelkên wiha de mehal e)¹⁶⁶ çimkî di nav ehlê dinyayê de peydakirina jiyaneke wiha nîne.

2.5.2. Ava Zîndegî

Dîsa ev têgeh di çarçoveya hevwatera jiyane de hatiye nivîsandin, hatiye bikaranîn, lê jiyaneke bêhêvîker e, Mehwi dibêje:

(Nebûwe qet (Mehwi) wifî, bunî min û to pêkewe

Husne awî zîndegî, işq agirêke dil birêj

Di vê helbestê de ava zîndegî bi wateya jiyane tê, lê jiyaneke bêhêvîker e ku li ba Mehwi bidawî tê, çimkî yar ji Mehwi re dibêje bi hev re jiyane me nayê kirin, çimkî ciwaniya min wek ava jiyane û eşqê ye, tu jî wek agirêkî dilbirêjî, av û agir bi hev re kom

¹⁶⁶Muderis, *Dîwana Mehwi*, r.33.

nabin) ¹⁶⁷ çimkî Mehwî yar û ciwaniya yar wek jiyana û zindîtî dîtiye, niha yar Mehwî bêhêvî dike, jê re dibêje, bihevrebûna me va bidawî tê, emê cuda bibin ango ew jiyana ku di encama bihevrebûna yar û Mehwî de hebû bidawî tê û ev jiyana jî ku carekê hebe û carekê nebe, sedema kuştina Mehwî ye, lewra ev cure jiyana jî yan zindîtî li ba Mehwî nepesendkirî ye.

2.5.3.Heyat

Dîsa pêdiviya helbestvên bi jiyana mebest an jiyana merdane hebû, pê ne hêsan bû biçe nav jiyana xelkên asayî, li vir helbestvan di helbesteke xwe de navê heyatê aniye, rast e bi wateya jiyana tê, lê di vê keş û barê de ev têgeh wate û nepesendiyeke watedar a jiyana dide, helbestvan dibêje:

(Tenke tiwêjêkî kêşawe berûda û qulzumî mewt

Wek heya bê hewa bende nira nawî heyat

Helbestvan di vê helbestê de, di danberheva jiyana û mirinê de, jiyana şibandiye wê tiwêjeya tenik ku li ser deryayê heye, derya jî mirin e, ango mirin pişaftin e û bêdawî ye, lê jiyana dihile û bidawî dibe.) ¹⁶⁸ Û herwiha di helbesteke din de jî Mehwî dibêje:

(Eger azadiyek bê le edemda boman

Çî heye xeyrî be pêçî pel pel dawî heyat

Li vir jî jiyana (heyat) hatiye, lê wiha hatiye nîşandan ku li dawiyê diçe û azadî bo mirovan tê de nîne, dîsa jiyana (heyat) nexwestî û nepesendkirî ye di vê rewşê de, çimkî azadî bo helbestvan tê de nîne.

2.5.4.Awî Heyat

Ev têgeh dîsa yek e ji hevwateriyên jiyana, helbestvan di hilbijartin û bikaranîna têgehê de (awî heyat) mebest û jiyaneke cudakirî ye, yan bi wateya wê jiyana nayê ku di şeweya peyvê de diyar e û Mehwî dibêje:

(Dem ledem nanî reqîban çî bê mirwetî ye

Têkelî awî debaxane deka awî heyat) ¹⁶⁹

¹⁶⁷ Jêderê Berê, r.142.

¹⁶⁸Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwi*, r. 98.

Mehwî di vê beytê de, tevî ku jiyana di eşq û etîketên eşqê de dîtiye, lê mabûn û tevlîbûna Mehwî ligel van kes û aliyan wek ku jiyana xwe têkelî jiyana wan a pîs kiriye, ango awî heyat bo Mehwî têkelî bi ava debaxane bûye, ev jî cihê bêzariyê ye ji bo Mehwî ango jiyana xwe (awî heyat) ligel tevlîbûna bi van kesan re ji dest dide, mabûna ligel van kesan jiyana pesendkirî û xwestî nîne li gor Mehwî.

Herwiha Mehwî di beyteke din de dibêje:

(Bew hemû taliyewe şerbetî merg, ehlî heya

Xoşî gewaratire boy êste le şekrawî heyat

Ango jiyana ewqasî nexweş bûye ku, şerbeta mirinê bi wê hemû tehliya xwe li ba mirovê bi heya ji şekirava jiyane baştir tê qurpandin) ¹⁷⁰ Dîsa naxwaze mabûn û jiyana hevawayê van mirovan li ba Mehwî nepesend e û şerbeta mirinê li ba wî xweştir tê qurpandin ji jiyana di nav van kesan de. Wiha bi heman awayî dibêje:

(Îznî çune çemenî weslî spêra be reqîb

Mehwiya bimire ke mirdin buwe mîrawî heyat

Dîsa Mehwî di encama nîşandana nerazîbûnê, bi wê ku desthilata dîtina yar ketiye dest bedkar, Mehwî jî mirin pê xweştir e ji çaverêtiya xweşiyekê ji jiyane¹⁷¹ Dergehê vê jiyane madem bi destê mirinê ye, ango mirin çavkaniya coka jîn ye. Yanî jiyana madem mirin tê de heye û bidawî tê û ev cureya jiyane ku mirin bi dû de tê nepesendkirî û nexweş e.

2.6.Ezmûna Hizrî Mehwî Bo jiyane Di Helbestên wî De

Em dikarin bi giştî di van xalan de jiyana û wateya heqîqeta jiyane di helbestên Mehwî de ku dihate dîtin, bibêjin, li gor ra û baweriya min pêwistiya jiyana Mehwî bi safikirin û cudakirinê heye, bo gihîştina bi wateya mebesta jiyana eqîdeyî ya Mehwî.

1. Jiyana dinyayê li ba Mehwî aloz e, bi tu şeweyekê ev jiyana ku bergewde bû di nav xelk û kesên dî de, ku Mehwî wan wek ehlê zeman binav dike, ne pesend e, rûxêner

¹⁶⁹Huwarî Neseb, *Dîwana Mehwî*, r.99.

¹⁷⁰Jêderê Berê, *Dîwana Mehwî*, r.99.

¹⁷¹ Jêderê Berê, r.99.

e, wek pûçî û hîçî binav dike. Çimkî ev jiyana Mehwî ji ber qapiyê mala yar û bûna Xuda dûr dixê.

2. Azadî di jiyana dinyayê de bêyî eşqa Xuda bo mirovan û bo Mehwî wicûda wê nîne, belkî ew azadiya ku di edemê de heye pir zêdetir e ji jianê.

3. Jiyana dinyayê ji bizayi * valaçûna temen zêdetir wêdetir ne tiştêkî din e, dawîya wê kurt e û dil û eql ber bi xafilbûnê dibe, piştî dikeve nav jiyaneke giran û xweşiyên wê dibe dava pelpel ku sedan girêkên wê yên kor hene, ku rizgarbûn jê zehmet e.

4. Jiyana taybet a Mehwî ji jiyana merdane (zindî) dest pê dike ku jiyana xwe di eşq û nûra Xuda de dibîne.

5. Jiyana Mehwî (merdane) ji yaxîbûna nefis û civakê dibîne, nemaze nefis û kuştina nefisê ye (elnefs amaretûn bîlsû –nef bi pîsîtiyê dagirtî ye)

6. Jiyana merdane bi qanûna tecenun û hetava xudayî û xizmetbûna yar û yawerên yar, dilê xilmaş ronak dibe, çav ronak dibe.

7. Di jiyana merdane de kesê merd dayîmen tirs di dil de û kêr ken e bi rûyê jiyana de, piştî xwe daye dinyayê û beheştî dinyayê, û bi xweşiyên wê nayê xapandin.

8. Hebûna azadiyê reha di nav jiyana merdane, çimkî kesê merd dayîmen bê tirs ji bo dîn û dinyayê kar dike, bi rastî olperest û eşqnoş e.

9. Gihîştina bi nemiriyê di jiyana merdane, çimkî mirandina nefisê di vê jiyana de, wek ku di dema mirinê de hest bi mirinê nekî, tenê dibe proseyeke guhastinê ji vê dinyayê bo wê dinyayê yan ji vê malê bo maleke din. Di jiyana de hest bi zindîtiyê û nemiriyê dikin ku Xuda dibêje (Ewe men kane meyten feeheynahû we ce'elna lehû nûren yemşî bîhî fi'n-nasî) bi vê jî ji mirinê bêminet dibe.

10. Mehwî pêrewkerê eşq û nerîtên eşqê ye di jiyana merdan de, bi wê eşqê ji Xuda û pêxember û al û yarên wî digihe, tarî rewşen dike, bêkes dike kesdar.

11. Di jiyana merdane de, jiyana wî têkilî jiyana xirab a xelkê nabe, di axiretê de jî ji rêza parastiyên sizayê xuda be ango ber bi îzolebûn û yaxîbûna ji tiştên dinyayê diçe.

12. Mehwî di jiyana merdane de komel û civak û zahidan şermezar dike. Bêhevîtiya ji jiyana nîşan dide. Êrişkirina ser wan, bi taybetî Xidrê Zindî, ku bi dû jiyana

de bû. Çimkî ev jîn li ba Mehwî dibe sedemê jidestdana pêname û nasnameya jiyane û dirêjkirina jiyana koletiyê.

13. Li ba kesê merd û ixtiyarkerê jiyana merdayetiyê, mirinê bi hemû tehliya wê wek şerbet dibîne li ba wî şêrîn e, ji şêrîniyên din ên dinyayê.

Beşa Sêyem

Ezmûna Hizrî ya Mehwî li Ser Mirinê û Gedelyeya Jiyan û Mirinê Di Şira Wi Da

3.1. Heqîqet û Rastiya Mirinê

Di dîrokê de ji berê ve xwesteka naskirina heqîqet ango rastiya mirinê mirov gelekî mijûl kiriye. Her mezheb û aliyekî bawerî û olî vê derbarê de xwedî hewldanên cuda cuda bûye. Li gor baweriya hin aliyan mirin tenê wek aliyê madî û rawestan fonksiyonên laş ango bedene û ji hevketina endamên beden wê detir ne tişteke. Li gor wê nêzîkatiyê ew tê wateya ku ew nêrînekî fîzyolojîke, ku ji ber sedemên cuda cuda di lehzeyekê ango bîstekê de dawî bi temenê mirov tê. Hin aliyên din jî tenê ji aliyê ruhî ve lê dinêrin, kû qutbûna peyvendiya di navbera ruh û bedenê ye û li gor wê nêrînê di wê pêvajoyê de divê ruh ji bedenê rizgar bibe û biçe nav jiyaneke xweş û ronakîtir.)¹⁷²

Ew bûyer buye sedemê hatina gelek nîqaş û dûbendîbûna felsefê di qada jiyana hevçerx de. Ji ber mirov bixwe hebûnekî tenêye ku hest bi wî tiştî kiriye, ku heye û hebûna wê jî divê qebûl bike û razî be. Ketiye ber şepola jiyane û jiyane pê xweş bûye, ku hin caran jî demên xweş derbaskirine, lê hin caran jî nexwaşî hebûne, lê bi awayekî giştî jiyane wek deskevtê mezînin dibînin. Hin aliyên din jî di demên tengasiyê û bê hêvîbûnê de pîrs kirine; ka bo çî dijîm, wateya jiyane çîye? erê jiyane berdikeve ku bi vî awayî derbasbikin? Dema ku geheştine asta bê hêvîbûnê û reşbîniyê de jî gotine ‘‘Jiyane jî wek mirinê ye’’ ev tê wateya ku mirin ne xweşe, ev jiyane jî li gel kêşana nexwaşiyane wek mirinê dîtiye û wisa pêname kiriye, lê di vê derbarê de em dikarin bibêjin, ji her dûyan jî

¹⁷² Mustefa Bin Hemze ,Filisfe Elmut Enid Bedû Zeman Seîdê Nûrsî, (Hira) www.hiramagazine.com, 18,12,2006.

tê negeştiye. Her çend hewl daye bi vî awayî bawerî pê bîne jî, lê tenê wek henek kirinekê bûye û ji rastiye dûre, ji ber merg û mirin helgirê hin paradoksane û pêkve dijîn.¹⁷³ Lê rastiyeke heye ku mirov cuda dike, hewldana têgeheştina derûniya mirove û ew jî ‘mirin beşekî ku di jiyana mirov de qutnabe û rastiyeke bi piştrastî dikare bê gotin em hemû wê her bimrin. Lê kijan demê, li kûderê? û çawa? Em wê tiştî nizanin. Her wekî ku Xwedêyê mezin di sûreta (الانبیاء) 35 de di fermê , (كُلُّ نَفْسٍ ذَائِقَةُ الْمَوْتِ وَنَبَلُّوكُم بِالشَّرِّ وَالْخَيْرِ , (فِتْنَةً وَإِلَيْنَا تُرْجَعُونَ) wata: (Her zindî dê mirinê tehim bike û em ê we bi şer û xêrê emtihan bikin û hun ê dawî her li me vegerandin.

herwaha di sûreya sebeh de jî di fermê (سبأ) (30) (قُلْ لَكُمْ مِيعَادُ يَوْمٍ لَا تَسْتَأْخِرُونَ عَنْهُ سَاعَةً وَلَا (تَسْتَأْخِرُونَ) “xwedê ji bo ezê rojêk danaye . hun ne saetekê ji paş diminin ne ji saetekê hun dedene pêşya wê” eger ev cîhane fanî be, lê mirin qederekî berdewame. Ew jî cudayî yê di helwêsta wan mirovan a beramber jiyana û mirinê diyar dike. hin kes wek rêyekî dilxweşiyê dizanin, hin kes jî wek westandinê dizanin. Vê derbarê de tirs û bi awayekî li derûniya binyadem ango Ademêzade de peyda dibe¹⁷⁴ Li gor baweriya Arnold Twinbe tirs ji mirinê xerîzeyekî zindiye û tiştekî asayî ye li gel herkesekê hebe, lê tiştê ne asayî û şerm, kontrol nekirina wê tirsê ye. Nabe ku li hember tirsê, ji hebûna xwe em sitûyê xwe bi tewînî li hember mirinê, ji ber ku sitûyê xwe tewandin lewaziya herî mezin ya mirove. Lewaziya derûnî ya mirov jî xirabtire ji mirinê)¹⁷⁵

Wê demê pirose hemû hevdû temam dikin, ku pêvajoyên giring ên jê re derbasbûnê ne, (jiyan û mirin hebûnekî ji yek cûdanabin û heta jiyane em nasnekin û daxilî jiyane nebin mirinê nabînin, heta ku em mirinê jî nebînin em ber bi jiyana ebedî ango jiyana bê dawî ve naçin. Mirin berdewam aliyekê wê yê diyar û rastî ango waqî ye û aliyekê wê jî yê ne diyar heye. Ji ber vê aliyê wê yê dervey mirov aşkeraye lê aliyê wê navxweyî ne diyare. Cîhê hewldana mirove di nasînê de, bûye cîhê metirsî û tê de bistbûnê ye. Hin kes wan rewşane bi ol ve girêdidin, ku xwe jê xilasbikin ango xwe jê rizgar bikin. Her wek çawa Ludvîk Vewirbak di pênaseyekê bo ol de dibêje; eger mirin neba, ol jî nedibû, bi awayekî ol asan kirina mirinê ye, yan jî revandina tirsê mirove li

¹⁷³Emel Mebrûk, *Felsefeya Mirin*, çapxaneyê Fêrbûn, Silêman ,2015, çapa yekem , r.15.

¹⁷⁴Arnold Twinbe û Axirîn ,*Alansan û Himum Almut* ,merkez Qumî Eltercime,Qahire,2011, Tibie El Awlî, r.19.

¹⁷⁵Jêderê Berê, r.12

mirinê ye. Lê divê bi tu awayekî li bîrame neçê ku mirin her demekê rastiyeke tale ku tu demekê ji ruxsara mirov nayê rakirin û berdewam di bîra mirovan de ye.)¹⁷⁶

Ew rastî her ji berê ve ji aliyê Ademîzade ve nasîna mirinê û heqîqeta wê xwe ferz kiriye, reng daye mirov û bi nêrîna mirov ve jî mirin wek rastiyeke zaniye û bi tu awayekê ji xelasbûn ji destê mirinê ne pêkane û hemû hebûn û zindîyên heyî jî girêdayî wê rastiye ne. Lê ne diyarî û gotûbêj û tevlihevî li wê derê destpê dike ku dema mirin pêktê veguhestina bo dem û saet û çarenivîsekî ne diyar ku tu tiştek di wê derbarê de nayê zanîn pêktê.)¹⁷⁷ Lê mirin bi nêrîna ola Îslamê ve di gelek ayetan de amaje pê hatiye kirin ku, bi awayekî teqez û waqîbûna ku heyî wek pirose hatiye behs kirin, herwaha pirose li dû piroseye hatiye ziman. Xwedê yê mezin (Di sûreta El beqare de 35-38) ku behsa Adem û li gel hevîna wî dike, dawiyê de jî dibêje herkesê ku li dû rênmayiyên min bikeve, ne tirs, ne jî xemên wan çêdibin li mirinê û ne jî dilê wan teng dibe.)¹⁷⁸ Herwaha ola îslamê bi dû awayan mirin diyar kiriye ku mirina li ser xwesteka kes û ya ne xwezayî ku ew mirin li gor ola îslamê herame xwedê di sûreta (نساء) 29-30 de dibêje وَلَا تَقْتُلُوا أَنْفُسَكُمْ إِنَّ اللَّهَ كَانَ بِكُمْ رَحِيمًا وَمَنْ يَفْعَلْ ذَلِكَ عُذُوبًا وَظُلْمًا فَسَوْفَ نُصَلِّيهِ نَارًا وَكَانَ ذَلِكَ عَلَى اللَّهِ يَسِيرًا³⁰, “ ku kesê xwe bikûje wek dijminê xwedê cîhê wî agire.” Herwaha mirina li ser xwesteka kes, tê wateya wê ne armanc mirineke ku xwedî sedem be li gel xwe mirin anîbe. Eger bûyereke di encama şer de be, yan xeniqandin, yan şewitandin be di rastiye de wek şehîd tê pênase kirin û ew mirin xwedî nirxekî mezine li gel xwedê û di sûreta (ال عمران) وَلَا تَحْسَبَنَّ الَّذِينَ قُتِلُوا فِي سَبِيلِ اللَّهِ أَمْوَاتًا بَلْ أَحْيَاءٌ عِنْدَ رَبِّهِمْ (169) wê derbarê de jî di fermê (يُزْرَقُونَ 169) “Zinhar tû wan kesên ku di rêya xwedê de hatine kuştin, mirî guman meke? Belkî ew sax in: ji cem perwerdigarê wan risqê wan tê da yin” di ola îslamê de ji ber mirov xwedî nirxê bilinde, û mirin jî bi wêneyekî baş ve hatiye nexşandin ji bo mirovê musliman, dema ku dimrê biheşt ango cennet li benda wî ye. Yan jî bûyerên ku nayên xwestin jî her wek şehîd ji ber hatiye pênase kirin, em dikarin bibêjin wêneyekî aramiyê çêdike, ji aliyê derûnî ve ji takekesê mirovê musliman re hatiye dayîn. Herwaha

¹⁷⁶ Heryem Osman, *çemkî mirdin di zimanî kurdî de*, çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2013, r. 6-7.

¹⁷⁷ Mihemed Mekanîkî, MefarqeElHeyat û El mut fi şeiri cahilî, wwiw.7q2w3e.kalamfikalam.com, 16,6,2008.

¹⁷⁸ Dana mela Hesên, *Mirdin le Rewangey Ayînekanewe*, çapxaneya pencere, Silêmanî, 2014, Capa yekem, r.32.

musliman bi bawerî xwedî dilxweşiyê mirinê ne û mayî ango akam nîne. Bê bawer jî tirsênok û şepirzeye beramberî wê diyardeyê¹⁷⁹ Di vê derê de emê amaje bi hin ayetên qur'anê bikin, ku her dem û awayên heyî yên behsa mirinê tê kirin giringin. Xwedayê mezin di sûreta (الانفال) 6, de di fermê وَهُمْ إِلَى الْمَوْتِ وَهُمْ (يَنْظُرُونَ) 6 (piştî aşkirabû (k utu jî bo cengê derdikeve) her wekî ku ew bi piçavên xwe li mirinê temaşe dikin û bi belê ve têne ejotîn (derbarê cîhadê de bê te re nîqaş dikin). herwaha di sûreta (مریم) 15 de di fermê حَيًّا بُعِثَ وَيَوْمَ أُمُوتٍ وَيَوْمَ أُبْعِثَ حَيًّا (الذي خلق الموت والحياة ليبلوكم أيكم أحسن عملاً وهو العزيز الغفور) 2, difermê (الذي خلق الموت والحياة ليبلوكم أيكم أحسن عملاً وهو العزيز الغفور) 2, difermê “Xwedê mirin û jiyan afrindinda ku we bi cerbîne: kar û kiriyarên kê ji we çetire her ew e yê ezîzê yê xefûr” herweha di sûreta (القيامة) 40 de difermê (أَلَيْسَ ذَلِكَ بِقَادِرٍ عَلَىٰ أَنْ يُحْيِيَ) 40 de difermê “erê me ew xwedê ku hûn wisa çêkirin nikare miriyan ji dîsa sax bike?”. ji aliyê felsefeya îslamî ve behsa vê diyardeyê hatiye kirin. wek diyardeyekî asayî-ne wek pirsgirêkek, lê behs lê hatiye kirin. (Bi dîtina irfanî û mixabin pêdaçûnê li mirina fîzîkê nakin, baweriya wan bi têkçûna mirov û her hebûnekê heye. Lê ev dîtina dervey mirinê ye, irfanî mirin wek deriyê piştê yê diyardeyan dibînin. Bi zimanê irfaniyan mirin bingehê derxistina cilûbergê madî û avêtina madiyatên cihanê ye û berê xwe dana cîhana menewî û fenabûn li sifet û zatê xwedê ye.)¹⁸¹ merg ango mirin li gel Mevlevî (Mirinê Mevlevî berevajî gişt xelkê dît û Mevlevî ji wê nêrînê tirsîya xelk rast dibêje û got ‘Mirin tirs avanake, ew mirin beşek ji mirov û xwe dizane, tirsî ji mirinê tirsî ji xwedê ye, mirina herkesekê wêneyê wî kesiye, ew kese li gor jiyana xwe wê xêr ji mirinê bibîne, mirin rengdaneya jiyana kesane, wê demê tê wateya jiyana û mirin vicdan û dilê wî mirovî ye,

(merg her yêk êy piser hemreng ûst

pîş dişmen û ber dûst ûst)¹⁸²

¹⁷⁹Jêderê Berê, r . 74-79.

¹⁸⁰ Beşîr El azmî, El mut fi El qiran El kerîm û alşera El Erebi ye El filisfe, (Eswaq El mirbid) www.merbad.net, 22,1, 2006.

¹⁸¹Sebur Ebdalkerîm (şîkar), *çemkî jiyan û mirdin le şeîrî Mewlewî û Mewlanay Romîda*, dezgay çap û belawkirdnewey Xezelnusî, Tehran, 2014. çapî yekem.

¹⁸²Şehbaz Muhsin, mirg az nigae Muluy, Şahbaz Mohseni.blogfa.com, 15, Ardebîşt, 1389.

Wata;li gor baweriya Mewlewî merg ne cihê tirsê ye. Beşeka ji hundura mirovê ye. Renga mirinê kurê dijimin û renga mirinê dost heman rengê ye ferq tune ye. Lêbelê mirev analîzeyê cuda ji bo mirnê kiriye. Lê ewv şirove kirin ne rast mirev dibe weka neynek mirna hemi kesek yek şêwe bibine.

Îbin Erebfî derbareyê mirin û tirs li merg de dibêje (Mirin dibe sedemê tirs û xof û bizdyana xelkê. Kesên bawermend ji tirsê wan xirabiyên ku kirine, kesên arif û zana jî, ji ber şerma ku wê xwedê bibînin, kafir jî ji tirsê ji destdana wan tiştên ku li cihanê ji mirinê ditirsin.)¹⁸³ (Ji aliyê felsefeya îslamê ve em dibînin Ebubekir Razî Axwan Sefa û Îbn Miskuveyh(W.130k) di pirtûka (Tehzîbu'l-Exlaq û El Toghîr El Ihraq) de behs kiriye, Ebu Heyyan(w,414 k) et-Tewhîdî li (el-Hewamil û eş-şwamil) Bi baweriya Îbin Miskuveyh (Li dû mirinê û pêdaçûna mirinê girêdayîne bi nimûneyên hin ji wan bi nirxin hin ji wan jî wek nebaşin ve. Yên bi nirxin wek rêvebirina baş di jiyane de, yê din jî wek xirabî û jiyaneke xirab û nayê pesend kirin tê pênase kirin. Herwaha derbarê mirinê de dibêje kesê ku jiyana wî baş û xweşî têde hebe mirin ji bo wî xirabe, lê berevajî wê yekê mirin li gel wî baş û di cîh de ye)¹⁸⁴ Derbarê mirinê de Seîdê Nûrsî jî waha dibêje û rawe dike: Mirin destpêka seferekî nûye li jiyana piştî bexşîna ruh. Piştî destpêkirina pêvajoyê qonaxeke din ê jiyane ku pîroztir û baştîre ji wê jiyana ku xwiya dike û hatiye bexşîn¹⁸⁵

Herwaha ji aliyê felsefê ve, herçend felsefeya kevingiringî daye vê pirsgirêkê jî; li gor felsefê mirin diyardeyekî ji xwe heskirina mirove ku hinde pêdaçûnê li ser dike, tirsê mirov ew bûye ku dibe herdemê mirin wî rastî wî bê. Ji ber wê jî herdemê li dû wê diyardeya mirinê ketiye¹⁸⁶

Sokrat wek yekem biryar tê naskirin di dîroka felsefê de ku behsa mirinê kiriye. Li gor baweriya wî jiyana bi dawî nabe tenê gohertina awayê jiyane pêktê. Ew jî tê wateya ku tenê gohertina cîh û demê pêktê û bangeşeya giyan pêk gohertin kiriye. Eflatun di dawiya pirtûka xwe ya bi nave Komar de behsa başiya mirinê dike. di çîroka “Êrda” de herçend vegotinekî efsanevî ye jî, behsa pehlevaniya kesekê dike ku di şer de dimre û

¹⁸³Mebruk, *felsefeya mirinê*, r.166 .

¹⁸⁴Jêderê Berê, r.159- 161.

¹⁸⁵Hemze, felsefe El Mut Enid Ebdî El ziman Seîdê Nursî, (mecele hera) wwiw.hiramagazine.com.

¹⁸⁶Mebruk, *Felsefey Mirdin*, r, 248.

piştî çend rojan careke din ji nû ve zindî dibe. Lê ew ezmûn ji bo mirinê hêvinê têgeheştinekî baş nîne)¹⁸⁷

Li gor nêrîna Eflatun di pênaseya mirinê de, merg ango mirin li navçûne ango têkçûne. Kesê ku dimre êdî hest bi tu tiştêkî nake. Veguhestina ruhe li cîhanekê bo cîhaneke din e. Eflatun mirinê wek xewn pênase dike û li gor wî xewnekî bêdawî û heta hetayî ye û xweşiyekî zêde ji mirov re dibexşe. Ji ber wê jî Eflatun ji bo mirinê amadeye, ji ber cîhana din rasteqîntir dizane¹⁸⁸ Ji aliyê felsefeya nû ve rawekirina diyardeya mirinê hatiye kirin. Heidegger mirinê piştî egera hebûna mirov pênase dike, ku dawiyê bi hemû egerên pêşerojê tîne)¹⁸⁹

Haydîger mirina resen ji mirina ne resen cuda dike. Li gor wî mirin mafe, mirov mirinê deyndarê wê mirinê ye ku jê re tê gotin. Mirina bîsteke ango demekî ji nişkive be ew mirin ne resene, ew mirina ku jê xwedana paş hebe ew mirin resene. Ji ber eger tirs ji mirinê hebe wek waqîbûnekê ji yên din verbigre wê demê wê ber bi ne resenbûnê biçê, lê xwedana paş ji mirinê babetekî ku hatî diyar kirin nîne, xweparastina ji mirinê di mirovê bîrmend de ava dibe û wek waqîbûnekê li mirinê dinêre, pirsyar çêdike bo li dayîkbûn, lê bi awayekî ne resen bi tirs ve li mirinê dinêre, ji ber mirina xelkê xwe wek mirina xwe dibîne û ew ne waqîf ye¹⁹⁰

Sartre baweriya wî we bû ku dema mirov hember wan tiştane tê mirove. Ji ber mirin jî tiştêkî mirovane ye. Herçend sînordare li hember biryarên mirovan, mirin jiyana takekes dike tiştêkî taybet, wa derdêxe ku carekedin venagere. Ji ber vê li jiyana û mirina xwe berpirsim, ne lêpirsîn kirina mirina xwe. Ji ber birîn û qutbûna jiyana xwe de, mirov li gel mirinê di na rekaberiye de ye. Ji ber vê mirov di mirinê de serbest nîne, lê miriyek serbeste, wê demê mirin berdewam ji aliyê din bixwe ve ye, nakeve navxwebûna xwebûyînê¹⁹¹

Froend di behsa mirinê de bin bandora dû ketiyên hebûnê de ye. Hebûn ber pêşerojê ve, ji ber di baweriya Freud de hebûn heye û hebûn ber bi hebûnê, cudayî di

¹⁸⁷ Jêderê Berê , r.6-7.

¹⁸⁸Osman, *Çemkî Mirdin Le Zimanî Kurdî da*,r.46.

¹⁸⁹Mebruk, *Felsefey Mirdin*, r.9.

¹⁹⁰Osman, *Çemkî Mirdin Le ZimanîKurdîda*, r.56.

¹⁹¹Jêderê Berê, r.58.

navber herdûyan de heye. Hebûna dûyem, egerin ku mirov dikete pirose. Wê demê hebûna mirov di vê hebûnê de nîne, ji ber mirine hebûn. Yan jî valatiya nebûnê teji dîke, mirin piroseya mirovane, heta ku nemirin nekevin gorê, pirose birêve naçin. Mirin û ezmûn li yek cuda ne)¹⁹²

Herwaha mirin bi dîtina zanistê ve yan mirin bi dîtina dahênanan ve lêhûrbûne û lêkdana ji kûr ve ye, bo diyardeya mirinê û behskirina bijîşkî, mirin û nîşaneyên wê pêktên ji (Rawestan nefesê û lêdana dil û gohertina awayê çav, bersiv nedana agahdarkirinên karebayî û zer bûn û sistbûna hemû gehên bedenê, her çend ewane têrnakin jî bo vê babetê, ji ber li gor teknolojiyê û cudayiyên mirinê de awayên cuda hene. Di wan salên dawiyê de, bi rawestana dil ve mirin bi dawî nabe ji bo mirinê, eger bi awayekî bihêz pêwîstiyên zindî kirinê bîn kirin dikare dil carekedin vegere jîyanê. Wê demê pênasayekî hatî diyar kirin bo mirinê, ku bê gotin mirina ev e hîn temamî tune, yan jî hîn dikare bê gotin zihmete¹⁹³

Birbireya piştî karê oksijenê; li gor baweriya zanistî eger oksijen 4 xulekan ango deqîqeyan negehîte demaxê wê demê jî mirov dimrê. Ev jî tê wateya ku di warên cuda de mirin tê pênasayê kirin. Zanist di pênasayê mirinê de dibêje: Mirin erkekî biyolojiyê ye, fizîkê ye û dawî bûna eqil û erkên wê ye. Wê demê mirin bi dîtina zanistî ve pêktê ji li karketina dil û mêjî ye¹⁹⁴

3.2.Mirin di Helbestê Mehwî de

Mijara mirinê û diyardeya mirinê ji ber meraqa mirov ya berhevkerin û giringî dana vê mijarê, bûye sedem ku pêl bavêje nav hemû aliyên mezhebî, fikrî û filozofî ve. Mirov bawerî bi rastiya mirinê aniye, dizane ku dawî hatina mirov li ser rûyê erdê, vê babetê li serdemên kevin ve rijaye û ketiye nav helbestan, giringiya xwe li ser helbestvanan ava kiriye û di wan aliyan de jî azadiya derûniya wan hiştiye ku teng bibe. Li gor sedem û gohertinên fikrî û olî rengdaneyekî giring hebûye. Mehwî wek

¹⁹²Mebruk, *felsefey Mirdin*, r.10 -11.

¹⁹³Tuyinbî, *El Insan û Hemum ElMut*, r.37.

¹⁹⁴Osman, *Çemkî Mirdin le Zimanî Kurdîda*, r.69.

helbestvan û mitesevuf pêşîra mirinê bernedaye. Nêrînekî cuda û bandora olî û Qur'anê li ser e. Ev babete bi têr û teselî li helbestên wî de reng daye. Bi awayekî mirin cîhanekî kûr û nêrînekî felsefeyî bo mirinê heye. Me nêzîk dike li cîhana tesevufa îrfan û mitesevufiyân. Ev diyardeye di piraniya helbestên Mehîwî dikare hest pê bê kirin, bêhtir bandora olî û felsefeya îslamê ve li mirinê dinêre û li gor baweriya Mehîwî cîhan li kot û bendan bêhtir ne tu tişteke. Ji ber hatina cîhanê wek ketina nav avekî şêlû ye ku hêdî hêdî mirov ber bi xeniqandinê ve diçe. Yan jî dikare bê gotin ku wa bîr lê kiriye ku cîhan û bedena mirov di vê cîhanê komkirina gunehan bêhtir ne tu tişteke û Mehîwî hest bi wan gunehan dike. Herwaha giringî dana bi rawekirin û asayî kirina piroseya mirinê û revîna wê tirsê û xwe jê parastina ku hember mirinê hatiye pêşkêş kirin. Mehîwî wa nîşan dide ku ji ehlî beyt ve, ew jiyane dibînin û wek qîn dibînin, lê mirinê jî wek azadî dibînin. Ew jî li gor Îmamê Xezalî diyar kirî, pêşwaziya Pêxember a li mirinê ye û di fermê: “من أحب لقاء الله أحب لقاءه، ومن كره لقاء الله فقد كره لقاءه” Herkes hez bi binina xwedê bike xwedê hez bi binina wî jî di ketin , we herkes hez bi binina xwedê ra nake , xwedê hez bi binina wî jî naketin”

Mehîwî wek pirsgirêka mirinê di helbestên xwe de jî di bin bandora nêrînen xwe de ye. Mehîwî vê cîhanê dawîya jiyane pênasê dike, mirinê jî bidestxistina azadî pênasê dike. Ji ber alîgirên jiyane westiyane ji behsa mirinê û jê ditirsîn, yan jî tamahên jiyane wa li wan kiriye ku nikaribin dest li cîhanê berdîn û nexwazin ji vê cîhanê derkevin. Guh nadin naz û nîmetên ku li cîhana axiretê de heye. Li gor baweriya Îmamê Xezalî ew kesane dikevin û reşbîn dibin li jiyana axiretê û tevlihevbûne di nav karên olî de. Dûrin ji rastiyân, dûrbînî ya cîhanî ya wan kesane nizme. Mehîwî bi şewq û giringiyekî zêde ve li mirinê dinêre. Ji ber baş dizane temenê jiyane her çawa be her kurte û mirin piştê wê bê. Ew jî ji aliyê derûnî ve cîhgirê fikrî û nêrînen Mehîwî de nêrîna ku mirin mafê û çarenivîsa me hemuyane û em hemû jî wê bimrin ava kiriye.

Herwaha Mehîwî bêzariyekî zêde li hember jiyane hebûye, em dibînin ku di çend cîhekê de hêviya xwe ya mirinê dixwaze, yan jî li gel wî mirin xweşe û xweşike. Herwaha xwasteka wî ji destê yar bê kuştinê ye (ji ber heskirin bi kuştinê û serî dan bi

destê yarê pîşeya evîndariya xwedê ye û dixwazin berî ecelê xwe bimirin)¹⁹⁵ Mehwî di wê helbesta xwe de dibêje

**(Mehwî bi (Mutwa) ke le mirdin bibê nejat
Royandinit le pêşe were biro)¹⁹⁶**

Wê demê Ademîzad dizane ku her divê bimirê. Ji bo vê jî di encama nexwaşî de mirinê nebînê, yan jî ji bo mirin li gel wî asayî be divê bi dilê xwe bimirê.

Ev jî amaje pêkirine bo wêjevanê (موتوا قبل ان تموتوا) “Bemire berî bi xwe bimirî” Mehwî yê arif wêjevanê evîndar pir bi temamî têr û teji û yek ji wêjeyên xwe yên evînî de dibêje, evîn bo mirine û ji bo dîtina yare, ew yara ku soz daye Mehwî di jiyana vala ya cîhanê de wê wî rizgar bike. Mehwî her bendewarê giyan ji dest danê ye. Herwaha dûrketin li yar û jiyana Mehwî de girane, mirin û kuştina wî baştire, daxwaza mirinê yan kuştinê dike, ji wê rewşa ne xwazyar. Waha dibêje

**(Çawî le wehdî kuştinî min Cawî dizyewe
Xutkarî wa , debê le qisey xoy neka nikûl)¹⁹⁷**

Mehwî hêvî dixwast bo kuştinê. Di vê derê de pir xweşik diyare ku dixwaze yar bibîne. Mehwî soz ji yarê girtiye ku bi tîrên çavên xwe ve wî bikuje. Lê dibêje çavên xwe li min diziye. Dibe ji gotinên xwe poşman bibe, ew daxwaz û hêviyên Mehwî yên mirinê êdî çi bi kuştin be yan jî mirinekî asayî be wî tiştî ji bo me ronî dike ku Mehwî rêya evînê girtiye pêşxwe û rêyekî tejiye li metirsî û nerihetiyê ye. Ji ber ketina nav herêmekî waha ya evînê pir girane, derketin ji wê jî bi silametî nabe û dibêje;

**(Dil Cuwe wadey mihibet hercî dî her kuşte , ya
Niwe kujrawe, le ser lêw ahu naley wa asef)¹⁹⁸**

¹⁹⁵Şiwan, *Mehuyname*, r.25 .

¹⁹⁶Muderis, *Dîwanî Mehwi*, r .255.

¹⁹⁷JêderêBerê, r,206.

¹⁹⁸Şiwan, *Mehwîname* , r .26.

Wê demê dil çûye ser rêya muhabetê êdî divê bi kuştî yan jî niv kuştî derbikeve û xilasbûna wî tune. Wê demê ew hevî û xwasteka mirinê bi xweşikî li gel Mehwî reng daye, ku ji ber vê jî ku cîhan hîç û pûçe û ji ber vê sedemê jî berê xwe daye helbijardeyekî waha yê wê rêyê.

Di vê helbestê de dibêje

(Dinya ke hîce hemu dezanin, ke çî çî kes

Merdane bo xuda nye dest helgrê le hic)¹⁹⁹

Wê demê dikare bê gotin li gel Mehwî cîhan pûçe, lê tu kesek tune bi awayê merdane ji bo xwedê dest jê berde, hemû jî mijûlê vê cîhana pûçin, ku dawiya wê her mirine. Tu sudekî ji bo wan tune û dijminê hemû mirovane. Mehwî hevî dixwaze ji mirinekî ji bo heskirina xwedê, mirinekî rû spiyane bigehe pêş xwedê û wek di vê helbestê de dibêje:

(Çi ruhê kuştay aw balaye, qumrî darî tubaye

Fiya tubî li qum fî sebîlî'l-hub him matû)²⁰⁰

Wateya wê xwazî mirinekî ku ji bo heskirina xwedê be, wekî ku darê (Şeceretu Tûba) wekî ku baskdarek li ser rûdinê û tê wateya ku wek ehlê biheştê be. Ev giringî dana bi mirinê û hewldana xwe zû gehandina mirinê li gel Mehwî hevî giringî û cîhê kêfxweşiyê ye, ku wî di cîhanê de şerbeta herî xweş vexwaribê ew jî mirine û her wekî ku dibêje;

(Çareya her derd û xeman mirine, çî bike

Neytwanîwe bike çarey xem û derdî hesed)²⁰¹

Herwaha dibêje

(Bew hemû talîyewe şerbetî merg” ehlî heyaya

Xoşî gewaratire bo êste le şekrawî heyat

Îzna çûne çemenê weslî spêra bo reqîb

Mehwî bîmrê ku mirin bûye bi mîrê ava jîyanê)²⁰²

¹⁹⁹Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.98.

²⁰⁰Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehwî*, r.306.

²⁰¹Jêderê Berê, r.151.

²⁰²Jêderê Berê, r. 99.

Wê demê em xwandinekî din ê heskirina ji mirinê bikin. Sedemê wê wek ezmûna bedena wî be, herwaha li gel wê ezmûna cîhê Mehwî ku tê de jiyan kiriye, ezmûnekî tal û nexwaş û bêzarker bûye, ku mirov nebaşbûne. Tejî bûna jîngeya wî li sîtem û ne edaletî û xirapkarî bo Mehwî evîndariyekî giran û zihmet li gel xwe aniye. Ew jî bûye sedem ku di wê jiyana giran û zihmet de mirinê wek şerbet pênase bike, yan jî mirinê wek çareserîya her tiştêkî bizane û jiyana ku heyî her saetekî wê wek mirinê bibîne û bi giştî ew jî ji ber mercên Mehwî yê ne guncaw di vê helbêstê de bi lêv dike.

her roje mirdnêke bjî be rohî wa

Destî kewê be girtnewey destî bo teleb

Wateya wê ez çî bêjim ew kesên ku cîhanperestî ji ber xweşiyê û destkevtin cîhanê, her rojê mijûlê destên xwe digemirînin û ji bo wan tiştan ku dest dikevin her roj û ew dîmenên ku ez dibînim ji bo wan mirin bixwe ye)²⁰³

Mehwî, mirina yekcarî angî fîzyolojîk cuda kiriye ji mirina saetekî û nîşan daye dest gemirandina angî mizdana mirov a ji bo destkevtên cîhanê û serî tewandin û tenezul kirin bo şehvet û temahên cîhanê wek mirin pênase kiriye û wek mirinekî abûra wî çuyî angî namerdane pênase kiriye. Ji ber mirov xeflet û xafilbûna vê jiyane wa dizane ku jiyana rasteqîne, xafilbûn bi naz û nîmetên ku xwiya dikin û mîhrebana diyarin, lê di naverokê de wek marekî jehrî û dikuji bixwe ne. Mehwî amadekariyên mirinê dike, ji ber dizane mirinê şûnde, cîhana axiretê çawaye û jiyaneke ebedî angî bê dawî ya bi şewq ve li benda wî ye. Li gel Mehwî derketin ji vê cîhanê tiştê herî xweş ê vê cîhanê ye û li gel wî ya herî başe û dibêje:

Mirdînêkî le ber ew qapyeda merdane

Bi xuda çatire emro, le gilarawî ' heyat

Li gor Mehwî ku Xidir çavê xwe ne berdaye jiyane, ji ber çavê xwe berdaye dewrê deriyê yar, ji wê derê jiyane û bi rêvebirina jiyane da ye)²⁰⁴

Di vê armanca jiyane ya Mehwî de jiyane li gel wî pir giring nîne, mirin çavkaniya angî destpêka çûna nav destpêkirina jiyane ye. Ji ber Mehwî wekî ku berî naha jî me amaje pê kir, cîhanê û jiyane bi giştî wek pûç û bêkêr dizane û pênase dike. Di vê derê

²⁰³Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.48.

²⁰⁴Omer Ezîz Mehwî, *Miştêle Bêjey Arifî û Kirdey Îrfanî 'Mewlana Mehuy*, çapxaneya Ezmer, Silimanî, 2012, Bergî sêyem, r.63.

de Mehwî jîyan û karakterên nav jîyanê ew qas nexwaş û bêzar dizane ku, bi tu awayekî ji jîyanê dilxweş nîne, ji ber li benda mirinê ye, bi tu awayekî di nav xak û xweliya niştiman jîyan û birêvebirina jîyanê naxwaze. Mehwî pir têniyêkî giran ê yara xwe ye. Naxwaze ji yara xwe dûrbikeve. Ew berdewam jîyanê nêzîk yara xwe bidest dixê û Mehwî li ser wê rêbazê birêvebirina jîyana xwe dike.

Jîyanekî ku hemû ji evîna yarê re hatiye cuda kirin, herwaha kuştina Mehwî ji aliyê yar ve wek xelata herî başe ji bo Mehwî û jê poşman nîne, ku diçe nav rêzên şehîdên evîne ve û dibêje:

le heq bêjî biwe, behrî (ana El heq) her qesîdêkim

Lebatî caîze, wacib gera qetlim biken wacib

Wateya vê Mehwî ji gotina heq ne poşmane, eger li ser heqbûnê ez bême qetilkirin û bême kuştin jî wek Hellac jê ne poşmanim, ji ber ev xelata rastbêjîyê ye.)²⁰⁵

Dawiyê de em dikarin bêjin Mehwî nêrîna wî ya ji bo jîyanê û baweriya wî divê kes serap û xewnên jîyanê red bike, dest li hemû peyvendiyan cîhanê berbide û xwazarê mirinê be. Ji ber pêxember di fermê bimrin û berî bimrin jî dostayetî û evîndarî bo xwedê hêvinê zindîbûn û jîyanê ye û dibêje:

(dil zînduwe be eşq û bijî to le merg emîn

Bem derde bimre, ta bibîte (heî la îmut))²⁰⁶

Bi destxistina azadiyê li gel Mehwî di vê jîyanê de nîne. Ji ber ew azadiya ku bidestbixê wekî ku di vê helbestê de dibêje di mirinê de ye. Herwaha dibêje:

(Eger azadegiyek bê le Ademda boman

Çî heye xeyrî pel pel dawî heyat)²⁰⁷

Ev jî belgeye bo ku Adem tu serbestiyekî wî tunebe, çawa wê bo binyadem hebe? Lê jîyan û xweşiyên jîyanê dervey mirinê tu azadiyekî wê tunebe bo mirov. Mehwî naxwaze li jîyanê de bimîne, ku li yar û yarên wî cuda dike. wê demê çavê wî li mirinê ye û dixwaze zu bimrê û dibêje:

²⁰⁵Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.54.

²⁰⁶Şiwan, *Ferhengî Sofyaney Mehwî û Cizîrî*, r.178.

²⁰⁷Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r. 64.

**(Becê mawim le yaran, nabe cê mawim, ecel zûbe
Be mirdin lem qîsûrî jîne îstîfa nekem çîbkem)²⁰⁸**

Mehwî li jiyana li dûrî yaranên xwe hest bi xerîbiyê û dûrbûnê dike, bi mirinê ve jî vegera nêzîk yar û yaranên xwe dizane, dîsa bi temamî li benda ecelê xwe ye, ku zû giyana xwe ji dest bidê û zû biçê.



²⁰⁸Jêderê Berê, r.233.

Dema ku behsa mirinê tê kirin li gel Mehwî di helbestên wî de dû awayên mirinê li berçav dikevin. Mirina fîzyolojîk ango mirina ku dibe bi temamî dawî hatina mirov û ji hevketina hemû aliyên hestpêkirin û endamên bedena mirov, ku ji aliyê her mirovekî ve, mezheb û aliyan ve wek mirina fîzyolojîk hatiye pesend kirine. Awayekî din ê mirinê yan awayê mirinê yê dûyemîn li gel Mehwî mirina nefsi ye. Mehwî bi awayê yekem dibe ku ji aliyê destewaje ve, ku heman destewaje me bo piroseya mirinê diyar ki, lê dû pêkanînen cuda ne. Ji gelek aliyên pîvan, mebdê û yasayî ve xwedî taybetmendiyên cuda ne, herçend mirina fîzyolojîk yan mirina asayî, li gel herkesekî tiştêkî ku tê zanîn û mirinekî ku bi ecele û dem û wextê wê em nizanin û giştî digre navxwe û gelek car sedemên wê nayên nasîn û bi kurtî em bê desthilatin li hember wê mirinê, herwaha ew yasa û taybetmediyene ku di Qur'anê de hatiye behs kirin, ku li gor Mehwî ew mirin rêya me hemuyane, divê hemû hebûnek bi taybet jî mirov di wê rêyê de biçê.

Wekî ku di vê helbestê de dibêje

(em xellqe cumle demrin û hemûwanyan îlae

Zîndû dekatewe şîş debînê hîsabyan

Kafir ke xare, babetî nare, cehîme cêy

Mumîn gulle, ke zînetî baxe çuwe cînan)²⁰⁹

Wateya vê helbestê ku behsa mirin û qiyametê dike, em dikarin bibêjin behsa ew mirina çavkaniya xwe li ola îslamê ye hêlsengandin dike û behsa piroseya mirinê dike ku wê hemû xelkê jî bigre navxwe, piştê jî behsa piştî mirinê tiştên ku pêkbên aniye ziman ku carekedin wê em hemû zîndî bibin û maf û hesab wê li gel herkesekî bê kirin, her kesekî ku kafir be wê wek stiriyekekê ango kelemekê wê danûstan li gel bê kirin û wê wek amûrên agir li dest verin girtin, kesên xwedî bawerî ango îmankirine jî wek gul in û cîhê wan jî baxên biheştê ne. Di vê helbestê Mehwî wêneyekî baş û xweşik ê mirinê û piştî mirinê kêşaye. Ev yek jî dikeve nav mirina asayî, tu kesek an jî Mehwî di vê mijarê de xwedî desthilat nîne. Ew mirin, mirinekî asayîye car caran bi êşe car caran jî bê êşe, metirsî û xofa wê zêde ye. Ji ber mirovê sîtemkar û xwedî guneh naçarê vekirina deriyê cehenemê ye, ev yek jî li ser mirovê gunehkar tirs û xofekî mezin ji mirinê ava dike û ji

²⁰⁹ Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.377.

wê piroseyê heznake. Lê mirovê xwedî bawerî ji mirinê na tirse û ji mirinê hesdike. Herwaha berî mirinê her kesek dikare tobe bike.

Lê piştî mirinê tobe kirin namîne û qebûl nabe. Hertişt çawa bûye heta dawiyê her wisa berdewam dibe. Mehwî di helbesta xwe de Hanî Zahîd wek nimûne ji herkesekî re pêşkêş dike ku berî mirinê tobe kiribû. Û dibêje:

(nêzîkey mirdinit ey pîre zahîd

Were ba tobe bikeyn, îtir riya bes)²¹⁰

Di vê şîretê de Mehwî bi navê Zahîd ve me hişyar dike ku heta hîn mirinê pêşîra me ne girtî em zû tobe bikin. Piştî mirinê tobe kirin bê sûde, ji ber wê demê hertişt bi dawî bûye. Ev jî wêneyeke din ê mirina asayî ango fîzyolojîke, ku pêwîste em hemû xwe ji bo wê mirinê amade bikin û tobe bikin, xwe ji hemû kar û pîrsgirêkên sitemkarî û ne dadperwerî ango ne edeletiyar û ne rewabûnan dûr bixim. Ji ber vegera ji wê mirinê tune, dawî li hemû tiştên mirov ên li ser rûyê erdî tê. Piştî mirinê pîrs û bersiv li mirov tê kirin, ku hêlengandin li ser kiryarên mirov ên li cîhanê û bo vergirtina encamên kiryarên wî yê cîhana axiretê de, vergirtina xelat bo piştî piroseyê mirinê têne kirin. Mehwî dibêje: Mirî dema geheşte tirba xwe û cîhê xwe, ji Reb û dibe ku ji pêxember û dibe ji ol, pîrs lê tîn kirin²¹¹ Mehwî wê nîşan dide ku di vê piroseyê de mirov dema geheşte tirba xwe ya cîhê mafê wî ye, melaîket têne ser û pîrsên xwedê û pêxember û olî lê dikin. Mehwî wê nîşan dide ku, em hemû berî mirinê divê li xizmeta ol û xwedê de û xwedî bawerî û îman bin ku em hemû mirinekî deyndarin û ew mirin jî mafe û encama mirov bixwe diyar dike.

Bi baweriya Mehwî ew mirine tê wateya îstîqbal ango pêşeroj li cîhanê derketin û çûna bin axê, ev yek wek mekan jî di aliyê azadiyê de dibe bingehe rihetî û refahê, xilasbûn û rizgarbûn tê ji nerihetiyên cîhanê û dibêje:

(çarî her derd û xemê kirdine mirdin, çi bika

Neytuwanîwe bika çare carê xem û derdî hesed

²¹⁰Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehwî*, r.186.

²¹¹Muderis, *Dîwanî Mehuy*, r.391.

Mehwî wa nîşan dide ku mirin çareseriya hemû derd û nexwaşiyê ye, ku eger çareserî nebe lê çi bike dilê pîs û pexîl pê birin bike)²¹²

Li gor nêrîna Mehwî eger mirin li gel xelkê wêneyekî xirap û reşbîniya wê heye, ew yek li gel Mehwî ji aliyê Mehwî ve hewl hatiye dayîn ku wêneyekî xweşik û aramkirinê jê re bê ava kirin û careke din di helbesta xwe de dibêje:

(be pîrî mergewe, firsex be firsex royun merdan

Dyare ewey bakî le mirdin bê, bilh û namerde

Li gor nêrîna Mehwî kesê xwe ji bo mirinê amade kiribe, bi serbestî bi pîrî ber bi wê piroseyê ve diçe, ew li destê û kesên mirdin, mayînde û baqîne li mirinê, kesê ku amade jî nebe bo mirinê û tirsê wî hebe ew kesane namerdin.²¹³

Ew jî hewldana Mehwî ya ji bo revandina tirsê mirinê ya di dilê xelkê de ye û hewldaye ku herkesek bi awayekî ji dil mirinê himbêz bike û hebûna xwe li hember mirinê amade bike.

Mehwî berdewam wek mamostayekî derûnî kar ji bo wê yekê kiriye ku mirin piroseyekî dilxweşkere bo mirovê xwedî nirx û bawerî û merd, herwaha di pênaseyekî hîn xweşiktir a mirinê de Mehwî dibêje: Bew hemû tallyewe şerbetî merg, ehlî heya

Xoşî gewaratre, bo êste le şekrawî heyat

Bi vê pênaseyê ve Mehwî dixwaze têbigehîne ku mirin û piroseya mirinê li gel wî, çûna nav cîhanekî aram û tejtî li serbestiyê ye. Herwaha hewldaye ew wêneyê mirinê yê li gel xelkê wek talî û reşî û nexwaşiyê ye, li gel Mehwî wek şerbeta herî bi tam e û tiştê herî xweş û bi tame li gel wî û bi awayekî pir asanî dikare bê tam kirin û şerbeta jiyane ye.)²¹⁴

Mehwî hewl daye naveroka mirinê bi hemû awayan raxe berçav, herwaha aliyên kêr û zêde yên mirinê ji mirov re û piştî mirinê ji mirov re ronî kiriye. Mehwî wek mamostayekî derûnî li mirinê û felsefeya mirinê nêriye, hewldaye mirovan ji aliyê derûnî û zîhnî ve ji mirinê re amade bike. Ji ber amade bûna ji bo mirinê û bawerî pênîna li heqîqet ango rastiya mirinê û li rathatina merg û mirinê wek yek ji prensîp û pîvanên

²¹²Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehwî*, r.151.

²¹³Mehwî, *Miştêle Bêjey Arifî û Kirdey Irfanî Mewlana Mehwî*, r.269.

²¹⁴Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehwî*, r.99.

herî giring ê Mehwî dikare bê pênase kirin. Ew jî wek çavkanî xwe disperse Qur'an û felsefeya îslamî. Wek di vê helbestê de dibêje:


**(Le dinya cennetî xo dîwe her kesê
ke to bî hazrî weqtî wefatî)²¹⁵**

Bi vê dîtinê ve Mehwî amade bûn û hemberhatina merg û mirinê dikare bê gotin ku; Mehwî wek di vê cîhanê de biheşta xwe dîtiye, ew jî tê wateya ku merg û mirina xwe ya li cîhanê bi bernamêkirin wekî ku ji aliyê Mehwî ve biheşt di vê cîhanê de bidestxistine.

Li gor baweriya Mehwî, mirin dema ku hat mirov pê nizane, lê divê amade be bo mirinê. Li gor baweriya Mehwî mirin jî qonaxeke din ê jiyane ye û herkesek mehkumê mirinê ne, piştî mirinê jî ku mirov geheşte tirba xwe tiştên ku ten hêvîkirin û yên nayên hêvîkirin dibe ku pêkbên. Di wan helbestên xwe de bi awayekê hêvî û bendevarî xwestin ji mirinê bêhtir derdikevin pêş. Sedemê wê jî ew e ji ber Mehwî ji destê avarebûn û nexwaşiyên cîhanê mirov bêzar kirine û cîhan tu baqî û mayiyên wê piştî mirina wan kesan nahêle. Herwaha mirina siyasetmedar, sultan, karker û bijîşkan wek yeke, piştî wan jî cîhan û jiyane her berdewam bûye. Mirin jî maf û milkê xwedê ye. Divê mirov di jiyana xwe de wê deynî her bide. Lê di heman demê de tirsek heye ji mirinê ku, ji bo me hatiye çêkirin, ew jî awayê ku mirov pê dimre ye. Ne wek awayê ku mirov dixwaze dimrê.

²¹⁵Şahîn, *Mehwînasî*, r.189.

3.2.1.Mirina Miroyî (Nefsî)



3.2.2.Mirina Merdane ya Bi Dilê Xwe

Mehwî yê xwedana û tê geheştî wî tiştî baş dizane ku cîhan ne tu tişteke, ji sergêjî yê bêhtir, dem borandina mirovan zêdetir ne tu tişteke. Hertişteki xirap ê civat, civak, zahîd û kesan heye, sîtemkar, derewîn û xasûk, dilê wan ji bo jîyan û keyf û sefayên jîyanê lê dide. Mehwî li gel wan beş û kesane hest bi xerîbî û xirap birêveçûna jîyanê dike û di nav wan de hest bi bêkesiya xwe kiriye û ji bo wê jî di vê helbestê de dibêje:

**(bê kes minim kesê nî ye le zubanîm biga nî ye
Hemdem xuda nenasin û dem pirr le xuda)²¹⁶**

Mehwî di nav vê nêvengê de kesek tune ye li zimanê min têbigehe, yan jî li derdê Mehwî bizane û bigehe hawara wî. Tû lê dinêrî hemû xwe wek xwedê nenas pênase dikin. Eger waha be Mehwî wê bi xefletê biçê, deriyê dilê wî wê kovana xwedê re bê daxistin, wê bikeve nav rêz xirapkaran de, divê karekî bike ji bo çareserîya vî dîmenê xirap û nayê pesend kirin, ji bo wê rêya herî baş, rêya evîndariyê ye ku di vê rêyê de Mehwî xwe bigehîne payeya şehîdê evîndariyê ku bikeve nav rêza kuştîyên evîndaran bo dîtina yarê. Divê bi merdane dest li cîhanê berdin, durkevin ji xweşiyên jîyanê. Jîyan eger xwarin û qûtê ruh be minetê em bo nebin, dest jê berdin. Ji bo em bikarin rêya evîne bigrin berxwe, li ser nefis û zatê xwe em desthilatbin, ku bikarin rêya evîne re

²¹⁶ Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r. 3.

amadebin. Bo vegera dil bo rastî û heqîqetê û aşînbûna evîna xwedê, nêzîkbûna li yar û alî yaranan, pêwîste li dû mirina Irfanî de bigerin.

Bi xweşhalî Mehwî li cîhana Irfan û mutesevvufan şarazaye, dikare wê rîskê bide pêşxwe, hêza avjeniyê ya wî ku dikare di wê zeryayê de bigere heye. Mehwî tu nîgeraniyekî wî tune ye ku hemû jiyana xwe di wê rêyê de dabe jî, eger çarenivîsa wî di rêya rastî û heqîqetê de kuştin, şewitandin jî be, yan darvekirin be jî, ji bo wî ne girînge ew li ser rêya xwe ye. Mehwî dixwaze berî mirinê yan jî ew mirina ku di wateya fîzyolojîke ku wê bê, ku dawî li jiyana bedena mirov tîne, dixwaze di rêyekê de biçu ku tu tîrsekî wî tunebê û Mehwî wek irfanekî dixwaze xwe pêşkêşî mirinê bike. Wê demê dikare bê gotin ew bixwe mirinê heldibijêre. Ji ber ew cîhê ku xwe pêşkêşî mirinê dîkin Meşûq tê de ye, cîhekî ku dervey evîn, heskirin û aşîyê tu tiştêkî din tê de tune ye. Bo vê pêngavê ji aliyê mirovî ve ber bi piroseya mirinê biçin û nefsa xirapkar li xwe dûr xistine. Ji ber nefsa hevalê herî xirap ê mirove. Di vê helbestê de Mehwî dibêje:

(esîrî seyîdî qeydî keydî seyîdî nefîsî amarem

Le destî em mare bed çare, çî ye çarim xuda çarim)²¹⁷

Bo cudakirin û şewitandina vê nefsa diz, rêya herî baş bo serkeftinê di serî de, ferzkirina mirinê di serî de, li gel peyrewkirina edeba evînê ye, karê yekem ê evînê kuştina nefsa ye, nîşandan can fedayî û dostê mirinê bûyîne di rêya evîna xwedê da. Ji ber şehîd bûn bi rêya merg û mirinê de, yan jî şehîd bûn bi awayekî mirinekî merdane ve, biheşta xwe di vê cîhanê de bidest xistine û her dibe şehîdê evînê ku payeya herî mezîne li gel xwedê. Mehwî amadeye di piroseya merg û mirinê de biçu. Di baweriya Mehwî de merg cudaye ji mirinê. Ji ber mirin piroseyekî asayî ye ji bo hemû mirovan û herkesek mehkûmê wê ye, piroseya cezadanê li ser mirov tê ferzkirin û ew tişt nayê xwestin ji aliyê mirov ve. Wê demê rêyekî di navberê de ne xwezayî ya mirove û giştî nagre navxwe)²¹⁸ Merg li gel Mehwî piroseyekî ne xwezayî ye, lê xwesteka Mehwî tê de heye, hin caran tê xwestin hin caran jî nayê xwestin, wê demê piroseyekî dervey cezaye, lê rûkarê navxweyî ve piroseyekî pêşkeşîya ji dile bo dîtin û nêzîkbûna li yare, li pişt wê biryarê Irfanîbûnê serîrakiriye, li gel tîrsekî ku alîkare bo biryardana çûna nav merg ve

²¹⁷Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehuy*, r. 271.

²¹⁸ Albert Kamo, *Qenare*, Çapemenî Genc, Silêmanî, 2015, Çapî yekem, r.17.

bi xwesteka Mehwî ve ye. Helbesta xwe de dibêje: Tirs tê wê wateyê ku peyvendiya xwe bi paşerojê ve heye. Ew tirs jî pêktê ku tirs ji destdanê hebe di paşerojê de, yan jî ji destdana doste(yar) ku negehî yar di paşerojê de, lê eger naha de hebe êdî tirs bo ew kese namîne)²¹⁹ Di Qur'anê de jî tirs waha hatiye ronahî kirin, behsa tirsê cîhana axiretê de hatiye kirin.²²⁰

Bo giringîdana bi mirinê li gel Mehwî, ew giringiyeye ku Mehwî di nav vê mirina xwezayî de jiyana xwe bidest bîne û bike bi wate, ketina nav bahewayaya merge di nav xwede, nêzîkbûne li yar, ev jî pêdana jiyane ye, yan jî dikare bê gotin Mehwî wî tiştî wek jiyana dizane û di vê helbestê de dibêje:

**(Ke şik bem (mehwîya) her şerbetî merg
leser erza nîye awî gewara**

Mehwî di vê behsê de derbarê merg û ji dilbûna merg li gel wî wek bidestxistina jiyane ye, ewe wateya jiyane bi merg xwastinê ve teji kirine, herwaha merg li gel Mehwî gehestina ava jiyane ye.²²¹ Ji ber ku Mehwî tenê bi biryardana merg ve dikare xwe ji nefsa xwe dûr bixe û bi yara xwe şad bibe, herwaha li xirabiyên cîhanê dûr bikeve. Kuştina mirov yan jî kuştina nefsa başiya herî mezin a Mehwî ye di jiyane de. Li gor Quşeyrî perwerdekirina nefsa aliyê veşartî yê hemû îbadetê ye, pirs ji pîran kirine ku di ola îslamê de gotine ku li dijî nefsa bi şûr herî tuj ve nefsa li nav bibe.²²² Mehwî ji fêl û fitên nefsa baş têgeştiye, dixwaze bi rêya evîne yan jî bi zate baweriya xwedayî xwe ji nefsa xilas bike û biryara merg di serî de ferz bike, Mehwî bo biryardan û amadebûn bo merg divê jê dûr bikeve li nefsa xwe û dibêje:

(emînî şetî ye (mehwî) le mekrî nefsi emmare

Meger rehmî xuda, dem bestî bika, em mare engêwe)²²³

Li gor baweriya Mehwî aramî û azadî bi dest nakevê, heta ku ev nefse hebe. Divê bi rihma xwedê mirov bikare vê nefse ku wekî mare xwe jê xilas bike. Mirov ji vê têdigehe ku li gel Mehwî nefsa divê bimirê, ji ber hebûna nefsa dûrketina Mehwî li yar,

²¹⁹Quşeyrî, *Risale El Qişîrye*, r.249.

²²⁰Jêderê Berê, r.250.

²²¹Qeredaxî, *Mehwî Le Nêwan Hezî Dînyayî û Işqî Xudayî da*, r.277.

²²²Quşeyrî, *Risale Elqişîrye*, r.287.

²²³Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.291.

tirs û xofa ji mirina rasteqîne, divê berî mirina asayî ango fîzyolojîk biryara mergbûnê li ser nefsa xwe de ferz bike. Bi kuştina nefsa û hêviya merg bûyînê tê wê wateyê ku, li gel Mehwî jiyan bidestxistine, jiyanekî ku hebûna xwedê tê de bidestxistî û wî nêzîkî yar bike û bi wî awayî Mehwî dibe hêvinê nemiriyê. Ji ber jiyan kirin di nav evînê de eger mirin jî tê de be, hest bi mirinê nakin, tenê sefereke ji cîhanekê bo cîhanekê din. Bo tişteki waha jî Mehwî canfeda û rêvîngêki aram ê rêya evînê ye. Amadeye bo ruh fedakirinê û çûna nav merg ve. Ji bo yar(evîna xwedê) di vê helbestê de dibêje:

(Êste bo laf û gezaf her kes debînî aşiqe

Nek hemû kes can fîda, wek mîm û hê û waw yê)²²⁴

Ew canfedayiya Mehwî di encama hest bi guneh û tewanan kiriye li hember xwedê. Herwaha Mehwî amadebûna xwe ya canfedaiyê pêşkêşî xwedê kiriye, ji herkesekê zêdetir têniyê merge. Mehwî bi merdane biryara çûna nav piroseya merg dide û bangeşeyê bo ew kare dike. Ji bo ku herkesê din çav li Mehwî bikin û dest li cîhanê helgirin, pişt li cîhanê û gunehên xwe yê li cîhanê bikin û dibêje:

(Dinya ke hîçe, cumle dezanin keçî çî kes

Merdane bo xuda nî ye dest hellgirê le hîç

Herwaha dibêje

(Namerd ewende muteberin, lem zemaneda

Merdî atîbarî kem buwe, merdî xuda xusus

Di vê helbestê de Mehwî pêwîstiya xwe mirovê merd û jiyana merde, mirovê merd li dû jiyana merd de digere, ji bo ku mirinekî merdane bike, dest li her tişteki helbigre, di rêya xwedê de mergbûnê li ser xwe ferz bike, lê kesên waha pir kêmin. Mehwî bi wî awayî dixwazê li pêş deriyê yarê de bimirê, ji ber mirin di ber deriyê yarê wateya dayîna saman û dewlemendiyê ye di vê cîhanê de. Di vê helbestê de dibêje:

(Rêy da le qapiya bimirim pêşî ser serim

Na, wa geda debê bexudawendî text û tac)²²⁵

²²⁴Şahîn, *Gullxaney Arîfan*, r.309.

²²⁵Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.291.

Vê cîhanê de li gor nêrîna Mehwî mirin li ber derî û nêzîk mala yar an jî dosta xwe, wateya bextewerî û aramî bidest anîne, jiyana korane ronahî kirine, geheştina ber mala yar geheştina bi padîşahî û tac û textê paşatiyê ye. Carekedin Mehwî hêvî dixwaze ku biçe nav rêzên mergxwazan û dosta xwe bibîne. Dibêje:

(şertî kird îtir le kuştin bes bika, yarreb bikey

Ew wefayem şerte ka, emma le qetllî min be paş)²²⁶

Wateya vê xwedê bike yar berî ku tobe bike min bikuje piştî tobe biket, ev rêya evînê teji ye ji metirsiyê, herkesek nikare bigre berxwe, lê Mehwî bi awayekî zîrek û ji dil di rêya merg de diçe ber bi evîna xwe Di vê derê de jî dibêje.

(Dill çuwe wadey mesyet herçî dî her kuşte, ya

Nîwe kujrawe, Leser lêwe aye û nalley wa esef

Vê derbarê de li gel Mehwî rêya evînê ye (Mirin û merg) Mehwî jî bo wî karî hêvî ji xwedê dixwaze bê kuştin bi destê yare)²²⁷ di vê beytê de jî dibêje:

(esîrit wextê kuştin şade mergin, nagene kuştin

Le xoşî xoşiya rohî firrîwe ta çuwe mezbeh)²²⁸

Di vê beytê de destûra wê didin ku Mehwî merg û piroseya merg dostiyê baştîre ji mirinê, ji ber êşawê kêmîre, hêvinê xweşî û serfiraziyê ye, piştî careke din bê baqîbûna xwe li merg derdixe û dibêje:

(heta heq nasîre her heqme mensur

Weku mensur eger bimken be dara

Mehwî dibêje di rêya heq de gotin geheştina bi heq û heqîqetê ye, eger fermana darvekirinê bo derbikeve dîsa jî dilê wî pê xweşe û wê her wê rêyê helbijêre)²²⁹

Dîsa Mehwî ji bo encam û meziniya evînê rêya şewitandinê digre berxwe, ew jî bikaranîna awayê perperokê ye, ku bingehekî Îrfaniye û Hellac dahêneriya wê kiriye û di helbestên wî de rengdaye û dibêje:

(sekîney mertebey sutanye ates perestî eşq

²²⁶Jêderê Berê, r.150.

²²⁷Şiwan, *Mehwîname*, r.26- 27.

²²⁸Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.103.

²²⁹Şika, *Rengdanewey Kesêti û Dinyabîni Helac Lay Mehwî û Hafizî şîrazî*, r. 454.

Eger sahîb îradet bê eceb pîrêke perwane)²³⁰

Mehwî dîsa wek kesekî canfeda bi rêya bikaranîna remza perperokê ku remza helandinê ye û fedakariyê ye li gel Îrfaniyan di rêya evîna yarê de, dîsa helbijardeya rêya merg bi xwastek û îradeya xwe ango wîna xwe ve helbijartiye. Ji ber berî wê qonaxê jî Mehwî bê kese û hest bi jîyan û evîna yar nake ku bi vê rêyê ve wê bigehe Meşuq. Ew jî bi ruhê bilind ê hêza karîne ya di nav evîne ve dikare pêkbê û dîsa waha dibêje:

(Ke rohim têgeyî to hez be derçunî dekey, derçû

Debê aşq ke dî bêzare yarî, bê brro birrwa)²³¹

Li gor Mehwî berî ku bigehe piroseya mezin a mirinê, divê bi rêya merg û biryara kuştinê ve biçin, bo dermanê nefse yê melon ê di vê jîyanê de. Herwaha divê Mehwî di vê derbarê de jî agahiyên xwe baş ji demê hebe, ji ber ew rêya evîne rêyekî giran û zihmete, dibe ku rêviyê vê rêyê tê de biçê demekî zêde tê de mijûl be û piştê jî wek şagirtekî zîrek neyê vergirtin û divê canbexş ango xwe bexşbê. Ev jî dibe ku dem nehêle bo Mehwî ku bi rûyekî spî vegere gel xwedê. Wê demê ev rêye teji ye li metirsî (Necîb Mihfuv) derbarê demde dibêje; dem bo takekes di navbera zatê takekes de ye, di navbera ciwantiya wî û li gel tenduristiya wî de ye. Mirin jî dawîye, fenaye)²³²

Vê dîtinê ve Mehwî derbarê dem û wext de heman nêrîna Mihfuv dixê bîra xwe û dibêje:

(lenakes karya xakim beser royî beba umrim

Xuda to bimjêne ta leber qapî kesê demrim

Be zayeh çû (le mala îni) ya weqtim hemû yenî

Debê weqtê le ebû wlweqtê bixwazim tiya bimrim)²³³

Mehwî heta ku berî vê piroseyê û negeheştina ber deriyê mala yar hemû jîyan û temenê wî vala deçê û piştê jî dest li piroseya mirinê bernade, ji ber mirin bi çavê Mehwî ve pir girînge, herwaha wext jî, ji ber negeheştina bi biryarê mirinê tê wateya vala çûna hemû temenê Mehwî ye, Mehwî naxwaze mirinê bi çavê xelkê ve binêre, ji

²³⁰Jêderê Berê, r.469.

²³¹Huwarî Neseb, *Dîwanî Mehuy*, r.628.

²³²Tuyinbî, *El İnsan û Himum Elmut*, r.9.

²³³Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.103.

ber xelk bo ku nemire di nav hewldan û xeyala de ye, lê Mehwî dixwaze bi çavê zatê xwe ve li merg û mirinê binêre, ku ew jî derfeteke dibe Mehwî pê negehe û amade nebe bo wê mergbûnê, Mehwî rastiya jîyanê ji bo wî aşkera bûye, di wê piroseyê de piştî merg û kuştinê dikeve, ev yek tê wateya ku li nefis û zatê xwe dûrketiye, bi xeflet û şermê ve temenê xwe vala derbas neke. Hemû tiştên derdora xwe red dike, tenê ji bo yar û evîna îlahî, cîhan ser û bin kir lê ji bo wî nake libek pûş. Jê bêzar û acize. Rêya merg sedemê herî başe bo rizgarbûn li nexwaşiyên cîhanê, Mehwî teqezkirina amadebûna xwe ya ji bo pêkanîna yasayên bawerî û îmanê bi lêv dike.

Di vê ezmûnê de Mehwî bo mirina mirovê ji dil dixwaze wî tiştî li berçav dixe ku; Mehwî bi dilê xwe biryara merg yan jî mirina xwe dide, ji dest nexwaşiyên cîhanê, kesa û zahîd, tîrsa tarîbûna dilê Mehwî di nezera xwedê de û vegera bo evîna xwedê, dihêle ku Mehwî biryara merg yan jî mirinê bide, bi çî awayekî be rêyên merg, yan jî darvekirinê, yan şewitandinê ji bo nêzîkbûna li yar û dîtina Meşûq de diçe. Ji bo bibe şehîdê evînê. Ji ber ew paye di ber xwe de bi asanî bidest nakeve, ji ber evîn rêyekî girane, resm û adabên xwe heye. Ku hate kuştin geheşt bi payeya padîşahî û samandarî û biheştê xwe di wê cîhanê de bidest dixe. Ew mirine bo Mehwî wek xelatekê ye, wê bibe padîşahê evînê. Xala cevherî di vê mirinê de bi bedenî yan jî mirina fîzyolojîk nîne, ji ber armanc di vê gotûbehsê de nefis e, gotûbêj li ser kontrolkirina nefisê ye. Ji ber nefis astenga herî mezine li gel Mehwî ku bigehije yar. Mehwî bi nerîna îslamî û felsefeya îslamê ve li vê pîrosê dinêre. Li gor wî berî mirinê pêwîste bimirê, ku mirin nemiriyê bidest dixe, ji ber di dema hatina mirina mezin de emê hest bi wê mirinê nekin, tenê veguestinek dibe, ji malekê bo maleke din. Waye di vê helbestê de dibêje:

(dill zînduwe be îşq û bijî to le merg emîn

Bem derdewe de bimre ta bibîte hî la îmut

Wateya wê; eger dilê xwe bi evîna xwedê zindî bikî, biryara merg li ser nefis û zatê xwe de bidî, wê demê ji merg û mirina mezin natirsî, hebûna wê li gel te namîne, bi zindî wê bimînî)²³⁴

²³⁴Jêderê Berê, r, 83.

3.2.3.Mirina Bi Merdane ya Bi Dilê Xwe Ne Xwestin

Mehwî di encama rêya evînê girtina ber xwe de, raziye bi her encamekî ku ji aliyê yarê ve bi dest bixe, di beşa berê de behsa mirina merdane me kir, ku li gel Mehwî ji dil û bixwe xwastin bû, wê demê Mehwî amadeye û raziye di wê rêyê de bimre yan jî mergê xwe ji dest bide. Herwaha kêfxwaşê bi encama merg, ji ber mirina wî bi ziyanaçe, ji ber wê sedemê jî wê bigehe heqîqet ango rastî û bi vê sedemê ve jî wê yar bibîne. Lê di merg û mirina merdane yê bi dil xwestinê de, Mehwî raziye rêya evîn=merg bide pêşxwe, lê razî nîne li gel mirina xwe li yar dût bikeve. Ev tê wateya ku Mehwî bi mirinê yar nebîne, ji ber Mehwî hevî dike û dixwaze ji bo dîtina Meşûq de merg bide, naxwaze bedel û qurbaniya dayî vala biçê û yar nebîne. Di helbesta xwe de dibêje:

**(Mehwî ke xemye merdim û xem perwerî nî ye
em mayewe bebê kes û mewa ke min nemam)²³⁵**

Mehwî di vê derê de dixwaze rojek ji rojan yara wî ya Meşûq awrekî çavên xwe ve li wî binêre û bê te gel wî ku gotin û nêrînên xwe ve xêr û bereket li rûyê Mehwî bibarîne, lê waye Mehwî dimrê û encama wî jî bi fetaret ve çûye, yar cîha ku bê û bi hewara Mehwî bigehije, ku li bendê bû, tû lê dinêrî yar nehat û her nehat. Ev encame yan jî merge belê piroseyeke merdaneyê, lê naçariye bo Mehwî, ji ber Mehwî ji encamên wê razî nîne, Mehwî di vê piroseya merg û mirinê de li bendê ye ku yar bigehe hewara wî, lê wa lê nehat.

Mehwî dixwaze stratejiya piroseya wî di wê derê de diyar be, lê bo mirina merdane ji bo dîtina yar e, lê dût ketina ji yar yan jî nedîtina yar piroseyê tamam nake. Wa ye dîsa di vê helbestê de dibêje:

**(îznî çune çemenî wesllî spêraye reqîb
Mehwya bimre ke mirdin buwe mîrawî heyat)²³⁶**

Vê derbarê de dîsa Mehwî wêneyê merg û mirinekî nexwazyar jê re hatiye dayîn, armanca helbestvan waha ye dibêje, madem rêya geheştina yar û çûn û geheştina nav

²³⁵Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.215.

²³⁶Huwarî Nese, *Dîwanî Mehuy*, r.99.

bax û bostan di destê xirapkar de be mirin xweştire, ji ber li benda tu awayekî xweşiya li jiyane nayê kirin, madem mifteya deriyê wê bi destê merg de be, merg mîrê kanê ava jîne ye. Di vê wêneyê de eveliyat ango serekî bûna mirinê ketiye berî merg, ew jî tê wateyê ku xwe amade kirinek bo yar bê û eger dixwaze bibîne, lê merg biryar dide bi dîtina yarê û ev jî tê wateya ku heta nemrê naçe nav gotûbêjen li gel yarê. Dibe ku armanca piştî mirinê be ku, melaîket tê ser wî û pirs û bersivan li wî tê kirin. Vê derbarê de merg tewanbar dike ku ji ber heta ku nemrim yar nabînim, çi faydeye bigehim mirina mezin bo dîtina yar divê destûr ji merg bixwazim. Piştî jî yar nebînim, çûna wê jî bo seqer be. Di vê derê de wêneyekî ku nayê xwastin ji bo merg hatiye kêşandin, Mehwi naxwaze bigehe mirina mezin bê ku yar bibîne û di vê helbestê de dibêje:

(be oxir kirdnî min bume qeqnes

Ke ew çu bo seqer, min bo seqer çum

Herwaha dibêje

xemî qatîlme (mehwî) munfeîl ma

Le heşra kifnî xwênawî beber çum)²³⁷

Mehwî tirsê wê yekê heye ku li vê cîhanê koç bike û di rê de bimre yan jî li nav biçê, piştî jî ber ku rêyên xwe temam nekiriye bê ceza kirin û têkbiçê. Bo seqer biçê. Piştî lêpîrsînê li gel yarê bê te kirin, ji ber bûye sedemê li destdana min. Ez di xema wê de me ku cil û bergê bi xwîn li gel yarê bibînin, piştî lêpîrsînê li gel wê bikin û ew jî ji wê yekê bitirse. Wê demê ew merge jî li gel Mehwi bi xwesteka xwe û bi dilê xwe kiriye, lê jê razî nîne û mergekî ku tê xwestin nîne û Mehwi ji encama wê ditirse. Piştî di wêneyekî din de, dîmenekî mirina merdane ya xwesteka xwe nîşan dide û dibêje:

(her be hesret, nek be zirbet, koştîmî

Wa nellên em qetlî bê tawane bo çî)²³⁸

Di vê wêneyê de jî merg û encama merg de nedihate hêvîkirin ji aliyê Mehwi ve, ji ber Mehwi ji heskirin û evîna yarê ve biryara merg dide lê, vê derbarê de; Mehwi bi hesreta yarê ve, bi tînbûna yarê ve dimre, kes jî yarê wek qatîl ango mîrkûj nabîne, lê sedemê kuştina min her yar e. Eger em bi ponijîn li ser vê babetê, mirina bi xwesteka

²³⁷Muderis, *Dîwanî Mehwi*, r.224.

²³⁸Jêderê Berê, r.97.

xwe, yan jî bi dilê xwe, dibe sedem Mehwî ji derd û kûlên yarê xwe bide aliyekê, qurbaniya xwe ya ji bo yar nîşan dide ku qurbanê destê Meşûqe. Di jiyana xwe de jî qurbanê destê ne dadperwerî ango ne edaletiya cîhanê û gerdûnê ye.

Lê Mehwî berdewam teqezbûnê li wê dike ku evîna xwedê û yawerê îlahiye. Mehwî wa derdikeve berçav ku di kîjan qonaxa jiyânê de ye, jiyân dijî wî ye, eger mirin jî be ji bo wê yarê wê avê wê wexwa, lê yar nagehe hewara wî, ev bê îstiqrarî ango ne seqamgiriya derûniye, lê hîn jî Mehwî bi hêviya dîtina yarê ve bê çareye. Ji ber wê jî Mehwî wa tê berçav ku berdewam hestê bê xemiyê dike, ji bo ku xirabtir nebe û dilê wî li Meşûq tarî nebe, di şer û pevçûnê de ye li gel nefis û gerdûnê. Lê li gel wan hemû tewanbariyan dilê wî bi wî tiştî xweşe ku ew qurbaniyane herçend dilê yar razî jî neke, lê waha tiştek bi yarê daye fêmkirin ku evîna wî rasteqîne, lêpirsîn li gel wê yekê bê wate ye.

Bêpare, ew yek jî wê pir başbe ji bo Mehwî di cîhana axiretê de û di vê jiyânê de jî kontrola nefisî dike û dikare di jiyânê de xwedî karê olî be hem jî bo xelkê nimûneyekî başbe û hêdî hêdî Mehwî ji karên xirap û tewananan wê dûr bikeve. Bi wateyekî din eger qurbanî dan ji bo evînê be, qet nebe Mehwî hest bi hebûna reseniya xwe dike, xerîze û nefsa xwe de aliyên xirap dikare bikûje. Herwek Mehwî dibêje ‘

‘Ne şeytan, ne dewran û xizmanim bi min nakin’

Ewey nefisî xesîsim (Mehwî) kirduye der barim)²³⁹

Ev jî bi baweriya Mehwî, ku di helbesta wî de wateya wê ronî ye, nefis dijminê herî mezin ê mirove. Tiştê ku nefis bi mirov dike, ne şeytan, ne kesûkar û ne jî biyanî tu kesek nikare bi Mehwî bike. Li gor baweriya Mehwî mirov di ber xwe de berpirsyare. Herwaha li ber kiryar, rabûn û rûniştin bi xwe berpirse. Xwedê aqil ji mirov re bexş kiriye, azad kiriye ku çawa radibe û rûdine bi wîna xwe dike, lê li gor ronahiya prensîbên ola îslamê de divê tevbigere û piştî jî li gor kiryarên wî xelat dike yan jî ceza dike. Lê mirov divê berê karê xwe bike û çarenivîsa xwe bixwe diyar bike.

²³⁹Jêderê Berê, r.230.

3.2.4.Mirinî Namerdane (Satekî)

Li gel Mehwî ev mirine rastî wan kesan tê ku namerdin rû û berê wan li cîhanê ye û cîhan jî rûyê xwe li wane. Herwaha rastî wan kesan tê ku ji bo pare, pul, paye û tejîkirina nefis û xerêzeyên xwe yê şehvetê her tiştî dikin û li wan tiştê dikevin. Li gor baweriya Mehwî ew kesên waha rojane rastî mirina namerdane (satekî) dibin. Herçend ew mirovên waha bizdiyane ji mirinê, lê rojane nizanin ka çend çaran dimrin, wa tê wateya ku her sitûyê xwe tewandinekî wan a ji bo xweşiyên cîhanê, mirineke bo wan. Mirovê rasteqîn li gel Mehwî ew kesin ku sitûyê xwe li hember jiyane xwar nakin, kesên merdin piştiddin nefis û xerîzeyên xwe. Mirovê bê heya cezayê wan cîhanê tê dayîn, rojane bê ku agahiya wan li xwe be ceza dibin, dimrin û mirina wan jî bi encamên ne pesendkirî ve pêktê. Ku abûr û heya li gel wan kesên waha nemaye. Berdewam bo xwedê na bo xwe dijîn. Lê mirov divê berdewam bo xwedê bijî, mirin jî her ji bo evîna xwedê û îmana wî ango baweriya wî tamam be ye. Li gel Mehwî ew mirovane serê wan tevlihevin û wê cezayê xwe verbigrin. Pêwîste mirov xwedî li nefsa xwe derbikeve û li ser desthilatbe, ji ber li dû nefsa xwe ketin jê dûrketina ol û mebdeyên xwe ye. Li gor nêrîna Mehwî kuştina nefis berdewam yan jî hestkirina bi nemiriyê ye, rizgarbûna li êş û herwaha rizgarbûne li merg, êdî ew kese hest bi merg nake, ji ber berî piroseya merg li ser xwe de ew tiştê ferz kiriye. Ji ber wê jî divê mirov bê xafil bibe kuştina nefsa xwe, mineta kesekî negre ser milê xwe, temahiya, paye, pare û pûl neke. Mirovê merd temame (kamile ango pêgeheştîye) berdewam rihete û dilxweşe bi hebûn û tinebûnê.

Mehwî di vê helbestê de dibêje

(be pîrî mergewe firsex be firsex royun merdan

Ewey bakî le mirdin bê diyare bilhû namerde

Bi nêrîna Mehwî mirovê merd û bê nîgeran bê dû dilî bi pîrî û pakkûna merg ve diçe û tirsê wî li mirinê tune)²⁴⁰

Li gor baweriya Mehwî ku mirin raste piroseyekî nexwaşe bo mirov, lê peyda kirina yasayên evîn û nûra xwedê ew piroseye hest bi pêkhatinê nakin, tiştê asayî ye, bo rizgarbûna li merg û hest kirin bi jiyane ye. Mehwî kuştina nefis pêkaniye û bi

²⁴⁰ Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.270.

bername bo hemû aliyên jiyânê ve qurbanîdan di rêya yar de, herwaha azadbûnê ji mirov re dibexşe li jiyânê de li hember mirinê. Lê mirovê ne paqij û namerd hinde dilê wan li xwedê re girtiye ku mirin li bîra wan çûye, di heman demê de li mirinê ditirsin, ew mirovane keyfa wan bi xweşiyên jiyânê tê û dixwazin ji mirinê rizgarbin lê ew xeyalên wan ne pêkane, ji ber ew xweşiya ne her wê bi dawî bê û mirin wê çarenivîsa wan diyar bike û hem ev cîhane, hem jî cîhana din wê ji dest bidin, berdeyam kirina ew saetên jiyana wan wê bi mirinê bê hesab kirin, tu kesek ji wan jê rizgar nabe. Ne jiyân, ne mirin, lê ku behsa jiyana wan bê kirin jî, jiyana wan jî bi mirin hesabê. Li gor baweriya Mehwî mirov hatiye çêkirin bo ku bijî ne wekû bimirê. Ji ber hemû babetên vê cîhanê girêdayîye bi jiyana axiretê ve. Hemû hewldan bo biheştêye. Cîhan jî tecrubekirineke, li gor pêkanînen xwe wê xelat bibî. Mehwî baweriya wî wahaye ku, divê li vî cîhanê de em bimirin, bo ku bijîn, berevajî yasayên mirovê namerde ku dixwaze di vê cîhanê de bijî, bo ku bijî lê ew dijî bo bimirê.

Ev berevajî armanc û nêrînen Mehwî ye. Mehwî li mirina namerdane qest û armanca wî ewe zêdetir, ku ew mirovên li ser wê grubê ne rojane bi hêz pare û pul de dimrin û dibêje

(Ew pare perestane pir zû li ser xwe diçin

Dexlî nepellî dêwe, ne bay balî perî bû

aqlin û feqet (minê) legell dîtnî paren

Mahî newî em qewme, hîlalî qemerî bû

Wateya wê gelek xelkên vê cîhanê...Ewqas nefis û derûn pîsin û asta wan di jêr de ye, ku ji bo pare û pul mirîne, paye û asta pare perestiya wan geheştiye ast û payeyekî ewqas neşirîn û xirap û ne durist, her tiştî pare dibînin, li gor wan jî dikarin hertiştî bi wan bikin û mergê herî şirîn wê yê wan be û li ser xwe diçin.²⁴¹ Ew li ser xwe çûn û bêheşbûne bo wan hênîkayî ye û şîne baye, lê li gel Mehwî mirinekî ne pêkhatiye, ku çarenivîsekî xirap li benda wan e. ew mirovane di encama himbêzkirina wan ya pare, pul û xweşiyên cîhanê de, wê her demek ango kêliyekî ji bo wan bibe mirin, ew wek dem û wext û her kêliyek wê bo wan mirinê li gel xwe bîne û ew mirine ne mirinekî merdane

²⁴¹Umer Eziz Mehwî, *Miştêle Bêjey Arîfî û Kirdey Irfanî Mewlana Mehuy*, çapxaneya Ezmer, Silimanî, 2012, Î, r.399.

ye û tu qurbaniyek bo xwedê nedane, tenê jiyana kirine bo nefis û xerîzeyên xwe yê
şehvetî û di wê helbestê de dibêje:

(her roje mirdinêke bijêy be rohî wa

Destî kewê be girtnewey dest bo te leb

Mehwî ew kesaney (takî asayî, zahîd,...) Bi ruhekî ne paqij û nefsekî nizim û pîs
ve dijîn, eger hest bi vê bikin her rojek li jiyana wan kesana mirine bo wan ²⁴²

Mehwî di rawekirina jiyana wan kesane de, her çend rojên jiyana wan kesane wek
mirî pênase dike, di dema mirinê de jî wê rastî êş û îşkenceyekî pir bibin, bi taybet jî di
dema ruh vekîşînê de, ji ber piroseya merg a wan kesane bi se ango kuçik pênase kiriye.
Dibêje:

(seyrî seg mergî reqîbit ke xeyrî ew kese ke

Şîrî xemzet şêru bewrî ruberrubê, duqede

Segmerg di ferhenga helbestên Mehwî de tê wateya ku seg her kuçike ku tê wateya
wek se mirinê û kesê ku ruhê wî bi zehmetî û giran derbikevê, yan jî heger hîn ronîtir
mirov bibêje dema ruh kêşanê de bi eziyet û êş, yan jî mirineke ji mirina nêzîk ya sewal
ango heywanekî giran rûh bide ye)²⁴³ Di vê derê de pêwîst bû em amaje bi awayên
mirina hin kesan bikin ku kesên namerd mirina wan li mirina sewalên se ango kuçik ve
nêzîke û ruhê wan di dema mirinê de bi eziyet û bi êşekî mezin ve derdikevê. Ew kesane
dilê wan pîs û ne paqije, her tiştekî li cîhanê qebûl dikin, her tewanekî pêktînin, dizî û li
hember her xirabiyê bê dengîn û ser şor û sernizmin.

Herweha debêje

(çi xeyalêke lîqa bê be fenaçunî cesed

Ta perîşan nişud kar bî saman nerised

Mehwî di vê helbestê de bandora fikir û nêrîna tesevvufane li sere, ku dibêje heta
mirandîna beden û giyan pêkneynî di vê cîhanê de nagehî dîtina xwedê û hest bi hebûna
xwe ya rasteqîn nakî)²⁴⁴

²⁴²Muderis, *Dîwanî Mehuy*, r.48.

²⁴³Mehwî, *Emustîley Ferhengistanî Dîwanî Mehuy*, r.365.

²⁴⁴Şiwan, *Ferhengî Sofiyaney Mehwî*, r.259.

Vê derbarê de em digehin wê baweriyê ku Mehwî di vê cîhanê de piştî kuştina nefis û valakirina dil li hemû geşt û xubarekê de, geriya ye û ew yek jî di bin navê kuştin, yan jî merg standinê cih girtiye. Ji ber Mehwî wan hewldanên ku bi merg dostî pênasê dike, bi wateya kuştina nefsa pîs û ne paqij, kirina derve ya ruhê ne rasteqîn, desthilatbûna li ser xerîzeyên şehvetî, dûrketina li mirov û ademê xirap û ne paqij, têkel nebûna li gel amûr û tiştên ku xweşî û buhranê bo mirov tînin. Evane hemû di bin piroseya mirinê de xwe dibîne û bi baweriya Mehwî berî ku bimrin divê ber bi piroseya biryardayîna mirina nefisî de biçin, mirov dilê xwe dûrbixe li tarîbûnê û ronahîbûnê bi evîna xwedê ve pêşbixin û li gel xwedê û pêxemberde di mûhabbetê de bin. Ev jî bi rêya şewitîna di ber evîna xwedê de yan jî ruhê xwe fedakirinê ve, yan jî xwe tinekirina ji bo yare û bi dil û xwesteka xwe ve biryara wê yekê dayînê ve pêkane. Ji ber Mehwî baweriya wî waye ku dil û zindîbûna dil bi wê yekê ve dikare pêkbê, ku Mehwî di vê rêyê de ku bikare biçê û bi wî rengî Mehwî dikare nemiriyê bidest bîne. Herwekî ku berî naha jî me diyar kir, Mehwî di vê helbestê de dibêje:

(dil zîndwe be îşq to bijî le merg emîn

Bem derde bimre ta bibîte hî la îmut)²⁴⁵

Wateya helbestê ronî ye ku bi rêya pêkanîna evînê û bi hebûna evînê ve zindî ye û nemiriya xwe bi dest tîne, ji merg wê bê bexşkirin û wê hest bi mirinê neke, eger bimrê jî tenê wê di çarçoveya piroseya veguhestinê de wê pêkbê ango wekî ku ji malekê biçê malek din.

3.3.Ew Peyv û Gotinên li Gel Mehwî ku Têne Wateya Mirinê

Li gor zanyariyên ku bidest geheştine di encama geryan û kontrolên di helbestên Mehwî de, rengvedana mirin yan jî tevgera hizra mirinê em zêdetir dibînin heta jiyane, ji ber mirin bûyera herî mezine di jiyana me de, herwaha babeta herî mezine ku heta naha mirov berdewam li ser wê yekê lêkolînan pêşdixe û Mehwî jî di wê derbarê de bi saxî ji wê babetê derneketiye, giringiyekî zêde daye mijar û babeta mirinê û mirin bûye mijara herî bi nirx ji aliyê Mehwî ve.

²⁴⁵Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.83.

3.3.1. Mirin

Mirin di helbesta mehwî de zêde dhête binin çimkî şahir bi awayek zêde merg dostî ji helbesta wî da hene, dibinin mehwî di beytekîda behsa mirin dike, peyva mirin bî raste û rast bikar anye û dibêje:

(mirdinêk leber ew qapiyeda merdane

Be xuda çatire emrro le glarawî heyat)²⁴⁶

Yan jî dibêje

(dû espe menzilltî pê gehî deken taser hedî mirdin

Be dîqet Mehuya têfikre, şew şebdêze, roj eşheb)²⁴⁷

3.3.2 Sutin, Sutan

Dî dinya yê merg dostya mehwî de peyva(sutin) bi heman wataya mirin dhête hisab kirin şahir bi heman mebesta mirin bi kar anye û dibêje:

(usulî dînî îşqite sutin û bes

Perî perwaneme (cim alciwamih)²⁴⁸

Yan jî dibêje

(perwaneyek be bilbilî wit ke (abwalfizul)

Sutane êşî ehlî meêyet, ne hole hol)²⁴⁹

3.3.3. Fena

Di dinya yê merg dostya mehwî de fena yekî di ji peyvên daye ku bî wataya mirin ya heman rêgayêne ku mehwî bi sedema wî dimre ya dixwaze bimre dibêje:

(çi xeyallêke lîqa bê be fenaçunî cesed

Ta perîşan nişud kar be saman nerised)²⁵⁰

²⁴⁶Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.324.

²⁴⁷Jêderê Berê, r. 51.

²⁴⁸Jêderê Berê, r.168.

²⁴⁹Jêderê Berê, r. 206.

²⁵⁰Şiwan, *Ferhengî Sofiyaney Mehwî Cizîrî*, r. 259.

3.3.4. Xilasîbun

Xelasibun ji di heman peyvêne ku bi wataya mirin û fenabûna mehwî dihêt, mehwî di ev beytêda ji yara xwe tewesil dike ku garê tobe neke ji kuştina mehwî de, bila mehwî bikuje paşê tobeya xwe bike dibêje:

**(lenawa basî tobey to bu bû emrro ey sitemgerî şox
Bixe em tobe paşî koştinî min, to bî bo pîrt)²⁵¹**

3.3.5 Kuştin

Kuştin jî ya peyva kuştin ji def mehwî serbe dinyayê merg û mirine, ku şahir ev peyve bi watayê mirin hatye şahir hez dike yar wî bikuje libelê bi kuştina mehwî çavên xirap li ser yar ladibe û bi wata mehwî ji ber rend kirina demu çavên yar bi kuştina xwe razî di be û dibêje:

**(Biyanu bigre, şewey xot bişewêne be min koştin
Weha çawî bedet lê la dedem, birrwane çonim bot)²⁵²**

3.3.6 Merg

Mehwî ji bo maneweya xwe bi zindêti ji dinyayêda extyara merg dike û lê dibe dila mehwî pir jî eşiq bibe û heta ji bo heta hetayî bi zindêti bimine dibêje:

**(dil zînduwe be îşq we bijî to le merg emîn
Bem derde bimre ta bibîte (hî la îmut)²⁵³**

3.3.7 Canfîda (Ruh fedakirin)

Dinya yê merg dostya mehwî pir mezine ji def hiç kes û sofya û layenên di nayete binin çimkî hiç kes wekî mehwî nine ji bo canfîdayî û merg dostî ji ber geştin bi binina yara xwe û dibêje:

²⁵¹ Muderis, *Dîwanî Mehuy*, r.67.

²⁵² Jêderê Berê, r.77.

²⁵³ Jêderê Berê, r.83.

(Êste bo laf û gezaf her kes debînî aşiqe
Nek hemû kes can fida, wek mîm û hê û waw u yê)²⁵⁴

3.3. 8. Edem

Mirin Cihanekî pir mezine û bi hemî awayek mehwî di jyana xwe dixebite heta digehye malaza xwe libelî bi gehîştina mehwî bi merg ya (edem) azadiya xwe bi dest dhênêt u wekî di ev beytênda dibêje :

(eger azadegyek bê le edemda boman
Çî heye xeyrî pel pel dawîy heyat)²⁵⁵

3.4. Di Helbestên Mehwî de Gedelyeya Jiyan û Mirin

Di babetên berî naha de, ku taybet li ser jiyana û mirinê gelek xal me li ber çav re derbaskir, di wan her dû babetên dijî yek de, jiyana û dinya li gel Mehwî wêneyekî nexwazyarî pê hatiye bexşirin, ku em dikarin bibêjin di vê cîhanê de dervey bêzarî û westandinê tu tiştek tune, dikarî bibêjî cîhê bêhnvedanê jî bo mirov nehatiye hiştin. Herçend xweşiyên temenê mirov kurte û dawîya wê jî wê bê, ji ber mirov di bingeh de li vê cîhanê ji ceribandinekê re derbas dibe û dervey wê jî jiyana li vê cîhanê ne tu tişteke, ji ber hemû babetên mirov ên di vê cîhanê de girêdayîne bi cîhana axiretê ve. Her çend xweşî û nexwazyarî vê cîhanê wê pir zû bi dawî bibe, lê ya giring mirov dil û bawerî ango îmana xwe bi xwedê qût neke.

Dîtina Mehwî ya cîhanê nêrînekî reşbîn bûye, ne ku bi wateya ev cîhan ne cîhanekî nayê xwestine, ji ber mirov divê xeletiyên cîhanê rast bikin, ji ber divê nexşeya desthilatiya avikirin û hatina vê cîhanê mirov bizane, ku wateya jiyana û cîhana xwe bibîne. Mirovê kamil ango pêgeştî û merd pişt li vê cîhanê dike û di nav dil û cergê xwe de cîhanê digohêre û wateyekî baş û dil xweşker pê dide. Mehwî nêrîna wî ya ji bo jiyana, ji çavkaniya Qur'anê vergirtiye ku çawa pênase û wateya cîhanê hatiye kirin, bi heman rengî ew wate li gel Mehwî heye. Baweriya Mehwî waye ku mirov dikarin çarenivîsa jiyana xwe diyar bikin û xwe serpişkbin li hêvî, xwastek û awatên xwe

²⁵⁴Jêderê Berê, r.324.

²⁵⁵Jêderê Berê, r.64.

pêkbînin. Lê divê bi awayekî rewa be û li gel Qur'an û felsefeya îslamê yek be. Ji ber jiyana girêdayîye bi evîn û heskirina xwedê ve, azadî û hênikayîyê bi dil dibexşe. Ji ber jiyana pêwîste li gor xwestek û biryara mirov be di bin siya ola îslamî de. Ne wekû cîhan tamahî û xirûra cîhanê pê bixşê. Mehwî hemû destketekî ji cîhanê bê red dike, ji ber Mehwî di bin siya evîn û hebûna îlahî û awayê jiyana wê helbijartîye û pesendên jiyana Mehwî ew diyar dike. Ji ber ev jiyane ku encama biryara xwedê de pêkhatîye, dawîya wê tuneye û ji êş û sernizmiya cîhanê divê xwe bi parêze, ku di axiret û qiyametê de bê parastin.

Her çend mirin li gel Mehwî ku wefayeke mezin û berfireh di helbestên wî de cîh girtiye, wate û têgeha wî heta astekî ronî ye. Mirin xwedî peyvendiyeke rasterast li gel jiyane heye, wek tiştê ku ji yek nayên qutkirin, mirin eger bi wateya fîzyolojîk de be, li gel Mehwî ev yek xwedî cîhekî wê yê giring heye û mirin teqeze. Lê mirina mirovan di navxwe de xwedî wateyekî jiyane ye. Wexta ku li derve behsa mirinê tê kirin, em hest pê dikin ku di wateya mirina fîzyolojîk de tê gotin, lê ne wûsa ye, di navxwe de hin armanc û wateyên xwe wahaye ku; di navxwe de watedane bi jiyana, ango dikarin bibêjin mirina mirov û bangeşedan bo mirina nefsi û xerîze û kiryarên nayên pesendkirina mirove, derxistina aliyên navxweyî yên jiyane dostê Mehwî ye. Ji ber wek me got Mehwî jiyane red dike, ji ber jiyana resen bixwe, di navxwe de dikole û bi wî awayî jiyana Mehwî teji dike. Mirov dikare bibêje giringîdana bi mirina nefsi û babetên din ên di vê derbarê de aliyê pesendkirî yên jiyana Mehwî ye. Ji ber Mehwî di jiyane de yan jî jiyana Mehwî ji mirina nefsi û dûrketine ji babet û kiryarên xelet û neşirîn û têkel kesên xirap nebûyîn, kesên derewîn, temahiyên jiyane û bi dij derketina wan hebûnan ve destpê dike. Lê li ser lûtkeya dawîya temenê xwe de em dibînin nîgeranî û hin pirs rastî Mehwî tên. Paşeroja xwe li pêş metirsiya mirinê de dibîne. Vedigere bo serdema ciwantîya xwe, ku serdema hizir û girî û hêsir ango rondikê çavan zêdetir tu tiştê nedîtiye, dibe ku ew jî wî bigehîne wê nêrîne ku dibêje mirovahî berdewam di bîranînen xwe de jiyana dike, bîranên mirov ên berê ji naha û ji paşerojê şirîntirin. Mehwî wî tiştî têgeheştiye ku, ev gerdûne bi rihefî, xweşî û nexwaşiyên xwe ve li pêş metirsiyên mirinê de rawestayê. Heta astekê xerîzeyên merg, li hember xerîzeyên jiyane dostatiya wê

desthilatire. Ji ber Mehwî bi nîgeranî ve çav li yasayên gerdûn û cîhanê dike, herwaha bi tundî û tujî û bê mirwet çav lê dike.

Di bingeh de ew bo bê şansî, zehmetî û êş dîtîne hatiye cîhanê. Dive mirov hewl bide di vê dema kurt a temenê xwe de sûd û tam ji kêliyên jiyanê verbigre û bigehe rihetiye. Herwaha li gel wê jî Mehwî hin caran wa nîşan dide ku madem ev yek çarenivîsa mirove, her naba baştir bû. Wek di vê helbestê de dibêje:

(îbaret çî heye? Her (sîmya) te bîrî pê lêdem

Le dinya yek îbaret bê le mehzi hatin û royin

Di vê helbestê de Mehwî bi guman û nîgeraniyê ve li cîhanê dinêre, ji ber ev cîhan madem mirin têdeye, başe hatina cîhanê ji bo çiyê? ez şik nakem tu zanist û îbareyek pênaseya vê dîmenê rawe bike, tenê ev qasê dikarim bibêjim sîmya, sextekarî û cadukariye)²⁵⁶ bi rastî ev helbeste deriyê bo gotûbêjên zêdetir û bi giranî biryardan li ser merg dostiya Mehwî ya cîhanê naxwaze, ji ber Mehwî di navbera dû babetên hin pirsyaran de maye. Gelo ev gerdûne bi hemû xêr û xweşî û dîmenên xwe ve, herwaha bo xweşiyên mirov esman û erd hatiye avakirin, başe piştî wan jî hatina cîhanê ya mirov û şûnde gelo ev mirin çiyê? em dikarin bibêjin fikirandina bi vî awayî ji aliyê babeta helbestî û wêjeyî ve wê demê ez heme! Mehwî berdewam di bi fikirandin û têr nêrîn bûye li hember dûalîbûnên dijî yek ên wek jiyan û mirinê. Ev yek jî derî ji bo me vala dike ji aliyên kûrayiya fikir û nêrînan di navbeyna jiyan û mirinê de. Mehwî bo jiyan û mirinê helwêstên wî aşkera dike. Serdem û dema jiyanê red dike, piştî geheştina lûtkeya temenê xwe Mehwî dilê wî bo bîranînên wî û jiyana wî ya ciwantiyê lê dide. Mehwî di destpêka temenê xwe yê ciwantiyê de, tirsê Mehwî li amadebûna mirinê û babeta mirin di ezmûnên helbestan de hemberhatinekî berfireh ku axaftinên wî yên li ser mirinê ve dagir kiriye.

Di vê helbestê de dibêje:

(bew hemû talliyewe şerbetî merg, ehî heya

²⁵⁶Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.251.

Xošî gewaratre boy êste le şekrawî heyat)²⁵⁷

Armanca Mehwî di vê helbestê de diyare ku li gel jiyânê û mirin, herwaha talî û şîrînî kû ew dûalîbûnên dij bi yekin, herwaha wekî ku li gel hemûyan diyare di bingehê de jiyân xweşe û merg tale û nexweşe, lê Mehwî di bangeşeya mirin dostî de xwe kûrkiriye. Mehwî dizane merg tale jiyân şîrîne, lê di cîhana Mehwî de merg bûye şerbet û şîrîne, jiyân tale û nexweşe, bê guman em rengvedane sedemê wê yê xwezayî, kes û yasayên ne dadperweriyên gerdûnê bûne yek ku Mehwî di cîhanbîniyekî waha di xwe de ava bike. Mehwî di helbesta xwe de dibêje:

(le nakes karî, xakim beser royî beba umrim

Xuda ! To bimjêne ta leber qapî kesê demrim)²⁵⁸

Mehwî di bangeşeya mirinê de, ji destê bêkesiya xwe ve dinale, li gel wê jî bangeşeya merg dostî ya Mehwî ew e bêzar û acize ji bêkesiya xwe, li ziman û halê Mehûyî kesên ku tê bigehin tune ye û bêkese û ji ber vê di helbesta xwe de dibêje:

(çî xoş weqtê bû ew weqtem le goşey bê kesîda bûm

Weku hayem le deştî nakesîda êste awarem)²⁵⁹

Mehwî em dibînin li serdemekê de yan jî di qonaxekê de bêkesiya xwe wek xweşî pênase dike.

Xwezî bi wan qonaxan tîne û wan qonaxan dixwaze, ji ber naha Mehwî bi temamî tenê ye û di awarebûnê de ango penaberiyê de jiyân dike. di vê helbestê de em dibînin ku dû bangeşeyên ji hev cûda em bidest dixin, di helbesta yekem de morikên bangeşeya merg dostî tê de diyare, em dibînin ji dest bêkesiyê direvê, di helbesta duyem de Mehwî qonaxa bêkesiyê wek xweşiyê pênase dike û xweziyê li wan rojan tîne. Ev jî dûbendiyêke kûr û gotûbêjên navbera nêrînên ne pesend di temenekî şûnde jê vegera Mehwî ya di dawiya temenê xwe de û vê carê bi awayekî berevajî bangeşeya raboriyê û dûbare heskirin û xwasteka xwe ya ji bo vegera qonaxa ku berê wî red dikir diyar dibe. Herwaha di amajeyêke din de derbarê merg dostî û heq ango maf bêjiyê de ye, ew jî bikaranîna pênaseyên Hellac dike bingeh, yan jî Ene'l-Heq, ku Mehwî bê par e û dibêje

²⁵⁷Jêderê Berê, r.65.

²⁵⁸Jêderê Berê, r.220.

²⁵⁹Jêderê Berê, r.229.

mirin û kuştina wek Hellac, ku cîhê armanç û şanaziya min e, tu demekê bo kuştina wek a Hellac tirs û xofa wî jê çênebûye. Di vê helbestê de jî dibêje:

**(heta heq na syre her heqme mensûr
Weku mensûr eger bimken be dara)²⁶⁰**

herwaha dibêje:

**(le heq bêjî buwe behrî (Ene'l-Heq) her qesyêkim
Lebatî caîze wacib gera qetlim biken wacib)²⁶¹**

Ev bangeşe li gel cîhanbîniya Mehwî de derbarê merg dostiyê guncawe, Mehwî ji bo heq ango maf amadeye her awayekî bo êş û îşkenceyê û herwaha amade bo rêya Hellac bigre pêşxwe, eger wî darve jî bikin. Li gor gotina wî vê yekê wek xelatê herî bi nirx ji bo xwe û gotinên xwe yên bi maf ango heq dizanim.

Lê em dibînin Mehwî dem û kêliyekî din de rexne li Hellac dike, tirs ji nêrînên xwe yên berî wê tîne û jê vedigere, ji Hellac dûr dikeve. Wek di vê helbestê de jî dibêje:

**(ba heqîş bê lebo mensûr (Ena Elheq) heq nî ye
Şêtiye mecnun eger bê nazî leylay bika)²⁶²**

Mehwî di vê helbestê de dibêje, nedibû pênaseya Hellac herçend heq jî be, nedibû ewqasê bilêv bike û xwe lê bigoherê bibêje Ene'l-Heq, ji ber Mecnûn naz li Leylayê bike nagehije payeya wê, eger tiştê wa bike wek dîn ango bêaqil wê bê pênasekirin. Em di wan dû helbestan de dû nêrînên dijî yek dibînin, dibe ku bi tamamî ne li dijî yekbin, her pêvajoyek çawa dixwaze Mehwî nêrîn û ramanên xwe yên wê derbarê de pêşkêş dike û dikare wa jî bê gotin. Ew yek jî girêdayiye bi Mehwî jiyana çawa derbaskiriye û nêrîn û tevgerên wî yên ezmûniyên xwe ve dinav danûstandinê de ye. Ji vê derê ve dû nêrînên cuda di dû helbestên cuda de derdikevin pêş. Em nikarin bêjin Mehwî xelet bûye, ji ber her serdemekê de nêrînên Mehwî li hember mirinê û li hember pênaseya Hellac li gor yasayên exlaqî û olî û civakî li gor dem û merca di goherê. Lê di dawiyê de nêrînên kûr di tevgerîna Mehwî de ava kiriye. Her nêrînek di serdema Mehwî û dema Mehwî tê de jiyana kiriye giring bûye. Ev yek jî derdixe ku Mehwî aliyekî de hêviya wî geheştina bo yar e, ji aliyekî din ve jî bê hêvîbûna li hember jiyana ye, ew jî dihêle ku

²⁶⁰Jêderê Berê, r. 8.

²⁶¹Jêderê Berê, r.54.

²⁶²Jêderê Berê, r.19.

Mehwî di navbera wan her dû cîhanan de bimîne û winda bibe, ku tu yek ji wan her dû hêviyên wî jî pêkneyên. Eger em bibêjin jiyan tu baha û nirxekî wê tune, ew têgeh dihêle ku pişt li cîhanê bike, rexne li zindîbûne bigre û destli xwe berdaye her tiştî dihêle piştî jiyanê.

Ji ber Mehwî baweriya wî waha bûye, jiyan di vê cîhanê de pêktê ji astengî û koletiya mirov, armanca zindîbûnê jî eger li ser bingehe hewl û beza bidestanîna nemirî û mana li bêdawîbûnê û ava jiyanê vexwarin kirinbe, wê demê wateya wê yekê divê dirêje bi koletiya mirov bikî. Lê Mehwî wê jiyanê red dike û berevajî zindîbûnê, li gor wî azadî di vê cîhanê de tune ku benî Adem bidest bixe û her wekî ku di vê helbestê de dibêje:

(eger azadiyek bê le Ademda boman

Çî heye xeyrî pêçî pel pel dawî heyat)²⁶³

Armanca Mehwî di vê beytê de ronî ye, ku bi dest anîna serbestî û azadî di vê cîhanê de tune, ji ber ev cîhan xwedî hezar serî ye, kor bûye, derketin ji wê ne pêkane, lê di cîha wê yekê de derketin ji bo mirov li vê cîhanê qet nebe wê azadiyekê bidest bîne. Mehwî di babeta jiyan û nemiriyê de li gel zindîbûnê nakoke û li gel wê yekê nîne. Dibe alîgirê mirin û merg dostiyê. Wek di vê helbestê de dibêje:

(xidir eger çawî heyatî brrîye awî heyat

Min le xakî derî cananeme her çawî heyat)²⁶⁴

Mehwî rêya zindîbûnê nade ber xwe, rêya dijî zindîbûnê digre pêşxwe ku jiyanê bêdawî misoger bike, ji ber ez wî tiştî nakim, ezê xweliya ber deriyê yaran vexwûm ku ez bijîm, çavê min bi tamahiya jiyanê bê dawiyê, bi vê xweliyê ve hewldanê min bo geheştina yarê ye û di jiyanê xwe de min tenê ew divê.

Wateya vê Mehwî li benda jiyanê di nav xweliya ber deriyê yaran dike ye. Lê Mehwî di aliyên din de dijî zindîbûna xwe wek bingehe jiyanê û nemiriyê bikaraniye, ku baweriya wî wa pêhatiye, nimûneya jiyanê vî tiştî teqez dike û li gor wî ev jiyanê bê dawî bixwe ye. Herwaha bûye nimûne û balkêş û kesan çavli wî kiriye.

Wek di vê helbestê de dibêje:

²⁶³Jêderê Berê, r.64.

²⁶⁴Jêderê Berê, r.63.

(awî xizire xakî ew berqapiye

Dirkî ew berderke gul, puşî giya)²⁶⁵

Vê helbestê da amaje bi vê hatiye kirin ku Mehwî ava jiyane bi zindîbûnê kiriye, ji ber zindîbûna remaz nemirî û jiyana bêdawî bi ava jiyane ve pênase kiriye. Herwaha bi wê armancê Mehwî dest li jiyane berdaye û li ber mala yarê ye, wê demê ev nêrîn vî tiştî ji bo me aşkera dike ku hewldana zindîbûnê daye wî, bo nemir be, li gel Mehwî ew tişte qebûl û amaje pê dike û bi wê hêviyê li jiyane dinêre, jiyana xwe ji bo geheştina ber derê mala yarê cudakiriye. Bi vê nêrînê ve Mehwî wek me berê jî got, jiyana wî li gel wî pir nexwaşe û bi tengasiyan we dagirtiye û tu serbestiyek tê de tune. Ji ber jiyane her roj, ji bo wî derketiye ku naçarî hin tiştaye, tu hêviyekî bo mirov nahêle û di navbera yasayên mirovahiyê û civakî de bi zihmetiyan ve dagirtiye, ji ber wê jî wa lê hatiye rexne li zindîbûnê dike, ku ewqas dest li hertiştî berdide bo vexwarina ava jiyane. Bi kurtî watedana jiyane û bi başî zanîna jiyane ji qonaxek qonaxên jiyana temenê xwe de, Mehwî li jiyane bêzar bûye û ji bo Mehwî mirin ji jiyane baştir bûye. Lê ji aliyekî din v edema behsa meseleya Hellac de, wekî ku aşkera ye Hellac nimûneya herî bilind a fedakariyê ye di heq û maf gotinê de. Jiyana xwe têkdibe ji bo mirinê. Pir bê par û jîr û zîrekane rastî mergbûnê bûye, bê tirs biryara têkberina jiyana xwe daye.

Lê Mehwî vê fedakariyê yan jî ew karê Hellac li gel xwe pesend kiriye, ji aliyekî din ve jî Mehwî bi helwêstekî xwe parastinê behsa bûyera Hellac dike. wê bûyerê dike sedemê ku bêdeng be. Ji ber di heq ango maf gotinê de darve kirin jî li dû xwe tîne. Mehwî tîrsa ji destdana jiyana xwe tê de ava dibe, ku ew yek li gel cîhanbîniya wî ya din ve yek nagre, ku bangeşe bo dikir û êrîş û rexne li zindîbûnê dikir.

Wek dibêje:

(heq bêjî yek gunahiye mensûr, heqme min

Em qete ger nîşanî nedem mehwaya be kesê)²⁶⁶

Di vê helbestê de Mehwî behsa heq ango bi mafdarî axaftinê dike, we dizane ku baca heq gotinê Hellac çî bû, herwaha wa dizane ku piştî heq ango bi mafdarî axaftinê li dû xwe darvekirin li bendê ye, ji ber vê daxwaz dike ku helbesta wî bê veşartin û

²⁶⁵Jêderê Berê, r.3.

²⁶⁶Jêderê Berê, r.149.

naxwazê nîşanê kesê nede ku xwe ne de kuştin. Lê heman demê de Mehwî dû dilî di heq gotina Hellac de jiyan nekiriye, lê ew jî tenê ne sedeme ku waha bê kuştin. Em dikarin bibêjin ev helwêste giringî dane bi xweparastin û mana li jiyanê ye. Ew jî awayeke hebûna nêrîna wî ya di vê helbestê de hatî bidestxistine. Ev jî xweparastine ji her pirsgirêk, êş û azarekî ye. Dikare bê gotin xwe parastine ji her awayekî tirsê û bi wî awayî nêrînen xwe eger aşkera bike bi helbesta xwe, dibe ku bibe sedema tirsê û ew tirs dibe ji sîstem û pergalekî be, yan ji desthilatiya olî, yan edeb û kevneşopiyên civakî, yan jî gera Mehwî ya li dû naskirin û danûstandinên li gel jiyanê, giringî dana her qonaxek li qonaxên jiyanê û li gel wan hemû tiştê guncawbûn be. Ew tiştê ku Mehwî jê ditirsa dibe ew bibe destpêkek. Mehwî divê amade be bo tepeserkirinê. Li meseleya nefsi de ew tiştê aşkeraye ku Mehwî berdewam jê xilas nebûye li gel nefsa xwe her di şer de bûye. Wek di vê helbestê de dibêje:

(esîrî seydi qeydî keydî seydi nefsi amarem

Ledestî em mare bed çare, çî ye çarm xuda çarm)²⁶⁷

Di vê helbestê de meseleyeke ronî heye ew jî hember hatina berdewam a Mehwî ya li gel nefsa xwede ye. Heta astekî lewazî û bêçareyiya Mehwî derdikeve li hember nefsa xwe, heya ku wisa kiriye ku hewara xwe dibe gel xwedê ku Mehwî rizgar bike ji desthilatiya nefsa wî. Bi vê hêviyê ve dixwaze xwedê bigehe hewara wî, di vêderê de pirsek heye gelo kesekî wek Mehwî wek sofîyekî serekî xwe pêşkêş dike û berdewam li dû kuştina nefsa xwe bû. Lê bo waye naha hinde nefsa wî ji bo wî bûye asteng. Bi guman çav li biryar û desthilatiyên nava gerdûnê dike û gumana wî ji wî tiştî jî heye ku, hêzek heye û dikare wî ji desthilatiye nefsa xirap rizgar bike. Wek di vê helbestê de dibêje:

(le manimda nedîwe hasilê, xeyrî tewehuşî min

Xuda pêda w ewanen lem wehuşistane zû royn)²⁶⁸

Mehwî mana xwe li vê jiyanê de wek xerîbî û wehşet dizane, xwedê daye me ev wehşistane zû çûyîn, jê xilasbûn û mirin. Mehwî di vê derbarê de jiyan û cîhan bi temamî ji berçavê wî ketiye, bi dil û xwestek mirinê dixwaze. Ji bo rizgarbûn li vê

²⁶⁷Jêderê Berê, r.228.

²⁶⁸Huwarî Neseb, *Dîwanî mehwî*, r. 629.

cîhanê dixwaze bimre, lê em dibînin Mehwî di helbestekî din de teqez dike, nû nû di dawîya temenê xwe de heskirin û xwesteka bo vê cîhanê tê de ava dibe. Wekî ku di vê helbestê de dibêje:

(pîrî nemamî baxî ciwanî kirde pûş

Tazem dirextî tulî emel derdeka çiro)²⁶⁹

Mehwî piştî wê saeta dawîya temenê xwe de hest bi lewaziyê û pîrbûna temenê xwe kiriye, lê dara hêviya awat û xwestekên wî nû nû şîn dibe. Ev felsefeya mirove di jiyane de, her çend berbi pîrbûn û mirinê ve biçe bêhtir raboriya li pişt xwe hiştî ango jiyana wî li ber çavê wî şirin û bi heskirin dibe.

Mehwî nêrîna red kirina cîhana berî naha pesend kiriye, ev tê wê wateyê ku di dema ciwantiya xwe de ewqasê jiyana û cîhana xwe li ser ne ponijiyê, ew li ber çav derbaskirina jiyane wekî ku di temenê salên xwe yê dawiyê deli ser ponijiyê di ciwantiya xwe de hin de li ser ne fikiriye. Ev gotûbêjên Mehwî yê di dawîya saetên temenê xwe de, ku di dema ciwantiya xwe de tiştên ku red dikir, lê ji aliyê din ve piştê pesend kirina cîhanê vî tiştî aşkera dike ku mirov tu demekî xerîzeyên wî yê li hember jiyane nayê kuştinê. Herçend da dawîya temenê xwe û pîrbûnê de jî be, bi xwastek û bi armanc ve li jiyane dinêre. Herwaha di helbestekî din de jî derbarê nefse de heman gotûbêjan û ew nakokiyane bi awayekî kûr dúbare bûye. Em dibînin di destpêkan salên ciwantiya xwe de derbarê nefse de xwedî nêrînekî reşbîne, tu carê nekariye pêşîra xwe jê xilasbike, baweriya wî wusabû ku bi binxistina nefse ve mirov dikare jiyana xwe birêve bibe û bigehe al û yarên xwe. Wekî ku di vê helbestê de dibêje:

(bê minet rizqêke xem, bimirim le birsan, ew dexom

Tefre naxom, teleb nakem, le dinya qutê roh)²⁷⁰

Mehwî bangeşeya îzeta nefse û kuştina nefse dike. herwaha xem xwarina xwe wek qût û nanê herî bê minet pênase dike û dibêje eger ez bimirim jî li birsîyan, heta xem radiwestin, hewlnadim xwarina bi minet ku nanê heram bixwem. Ca eger cîhan ev bê û servet û saman û dewlemendî ev be, sermayeyê jiyane ev be, heyf û mixabîne bo xem bo vê cîhanê bixwe, daxwaza servet, hebûn û malê vê cîhanê bike. Eger cîhan ev be, bibe

²⁶⁹Jêderê Berê, r.629.

²⁷⁰ Muderis, *Dîwanî Mehwî*, r.102.

qut û nanê ruh heyfe daxwaz kirina wê. Lê Mehwî di dem û serdema pîrbûnê de, ew nêrînên wî goherîne û ji wan nêrînan vala bûye, hêvî, daxwazên wek zarokekî tê de ava dibin û nikare xwe ji wan xwestekên zarokî xilas bike.

(lepê kewtum û nefsim bo hewa deşnê weku mindall

Leber pîrî serm xoy nagrêt û taze pê degrim)²⁷¹

Mehwî ji ber pîrbûnê û nexwaşiyê ji dest û lingan ketiye, lê dibêje nefsamîn wek a zarokekî bi awat û xwestekan ve tejî bûye, qey tû dibêjî ez nû pê digehim û destpêka jiyana min e. Ev tişkên Mehwî yê derbarê jiyana û mirinê û li ber xwe ketina wî, bîr û nêrîn û hizrên Mehwî li ser qonaxên cuda de, vî tiştî digehîne ku li gel misliman û misliman û felsefeya îslamê û bi taybet takekesê misliman li gel Mehwî giringe û peyvendiyeke bihêz a nayê qutkirinê heye li gel heskirinê û xerîzeyên mirov de. Raste ev cîhan dem kurte û xweşiyên wê berdewam nînin û tam jê girtin zû zû diheliyên, mirin her li benda mirove û piştê jî her tişt bi dawî dibe. Lê nayê wê wateyê ku êdî madem jiyana di dawiyê de her mirin li piştê, tu giringî û pîvanekî nebe. Ji ber ev cîhan çî tê de xweşbe û çî nexweşbe hemû bexşên xwedê ye û lê razî ye. Ev nêzîkatiyên bi nakok ên Mehwî yê derbarê xwastinê û nexwastina cîhanê tiştekeke pir asayî ye, ku demekê em lê dinêrin ciwane û dilê wî li cîhanê xweş nîne û pişt li cîhanê û jiyana kiriye, lê di serdemên dawîya temenê xwe de dil û nefsa wî ji bo jiyana dúbare lê dide, yan jî xwezî bi temenê ciwantiya xwe tîne, ji ber temenê ciwaniyê ya wek behest wekî ku ji dest çûyî dizane, naha jî pîr û lewaz bûye û hêza wî ya berê nemaye, ku asayî ye mirov dema pîr dibe dúbare nefsa û xwestekên wî yê ciwaniyê verdigerin, wê demê ji aliyê derûnî ve ev tiştekeke pir asayî ye, ku xem dixwa ji ber li dest dana tiştên ciwanên gerdûnê yê serdema ciwaniyê. Em dikarin bibêjin ev têkçûn û ser tevliheviya Mehwî çî di qonaxê û pêvajoyên ciwaniyê de, ku li goşeya bê kesî bû, naha jî di dema pîrbûna temenê xwe de li deşta bêkesiyê de maye û penabere. Wê demê Mehwî li her dû pêvajoyan de jî ji ber dest li xwe berdana li dû yarê de nasnameya xwe jî, ji dest daye, dikare bê gotin Mehwî nizane çima rêya giran a bê xeber çima girtiye berxwe, ku bê encame.

Berdewam di nav fikirê û ramanê de bûye, li hember jiyana û mirinê. Li gel Mehwî mirov di her pêvajoyekê de dikarin tam ji jiyana verbigre, êdî xweşî be yan nexweşî be,

²⁷¹Jêderê Berê, r.221.

ji ber li gor wî ev destkevtê xwedê ye, mirov dikare tam ji dîmenên gerdûnê verbigre û ji dest wî neçe. Lê ev hişyariya Mehwî di dawîya temenê wî de ji bo wî aşkera dibe, piştî ji destdana hemû tiştê em dibînin na mûradî û bêkêriya xwe bilind dike ku, di vê cîhanê de çikîr ku temenê wî de ev tiştana pêkhatin. Waha mûkir bi xeletiyên xwe dike û dibêje:

**(le hefta tîperrîm û hefteyek bo dîn û dinya
Be karî xom û karî kes nehatim wey çî bêkarim)²⁷²**

Herwaha dibêje:

**(hergiftugome keçî her dellêm û tê nagem
Her cust û come keçî her derrom û pê nagem
Çawim rewaw goşeyî ew ebirwem nedî
Dill bû be behrî ulum û le elf û bê nagem)²⁷³**

Ji vê derê em digehin wî rewşê ku hîn Mehwî negeheştiye tiştê ku xwestibû, herçend pîrbûye dil û westana mêjî û bedena Mehwî li girtina rêya evînê û avarebûn ango penaberbûn û vala derbasbûna temenê ciwaniya Mehwî. Hîn jî nebûye xwediyê kesayetiyeke. Rasteqîna vê pêvajoyê li gel Mehwî xweşî û tam jê girtin heye, lê ji aliyê kiryar û amadebûnê ve tu nirxekî tune.

Mehwî di wan dem û saetan de bi temamî li meseleya jiyana û mirinê tê geheştiye, hûrgulî û rewşên cîhanê bo aşkera bûye, dibe ku ev poşmaniya Mehuywî awat û hêvî xwestinek be, ji bo serdema ciwaniyê ku têgeheştiye mirov di vê cîhanê de, hem ji bo ol hem ji bo cîhanê tekoşîn bike û gotinekî Îmam Elî heye di vê derbarê de dibêje: “ **اعمل** لَدُنْيَاكَ كَأَنَّكَ تَعِيشُ أَبَدًا، وَاعْمَلْ لِآخِرَتِكَ كَأَنَّكَ تَمُوتُ غَدًا ” ji jiyana xwe da wisa bixebite ku tu heta dawî dimînî û namrî , we herweha wisa ji bo axireta xwe bixebite ku tu sibehê dimrî” ew nêrîna Mehwî di dawîya temenê xwe de hişyarî û bala têgeheştinê bihêz dibe, ev tê wateya teji dibe, li gel wê gotina Îmam Elî de (xwedê jê razî be) Mirov nabe di vê cîhanê de hemû tiştê jiyana bike qurbana mirin û qiyametê, herwaha nabe hemû xweşiyên cîhanê wa lê bikî ku qiyamet jî jibîr biçê. Wê demê hevsengî avakirin di navbera her dû halet û rewşan de girînge. Sedemê wê nakokiyê û wan gotûbêjan dikare bê gotin ku

²⁷² Jêderê Berê, r.229.

²⁷³ Jêderê Berê, r.343.

Mehwî melayekî başe û ji malbatekî oldar de li dayîk bûye, demekê xatibê mizgevtî imamê E'zam bûye, di xizmeta Şêx Behaiddîn yan jî li gel bavê xwe bûye, ev tê wê wateyê ku nêzîk bûye li cîhan, ol û nêrîna oldariyê li hember cîhanê, jiyana û mirina waha bûye, lê piştî mirina bavê wî Şêx Behaiddîn bêkes bûye û qutbûn û valatîyekî mezin bo Mehwi ava bûye, piştî temenê wî bû pence salî bê mûrşîd maye, dibe ku ew jî bibe sedem xof û têkçûnekî derûnî di Mehwi de hatibe jiyana kirin. Ji aliyê din ve hiştina Behaiddîn ku Şêx Husamuddîn kurê wî bûye, ji Mehwi re giran hatiye ku dilê wî razî be temenê wî pence salî ye û bibe mûrîdê Şêx Husamuddîn ku temenê wî bîst sal bûye. Ev jî nêzîk bîst çar sala, di encama dûrketina bê mûrîdî di qonaxa bêkesiyê de maye, her çend berê jî xwe wek bêkes pênasê kiribû jî. Ji vê derê encam û armanc bi dest nexistiye, Mehwi dikeve raman û fikra ku her çend dû direve û dû digere lê dîsa jî bê encam maye, dil û mêjî de tevlihevî, ji ilim û zanistê bê parbûn, lê her di goşeya tenegeheştinê de maye, ji ber wê jî Mehwi di nav xwe de hest bi ne temamî û ji dest dana yar û armancên xwe dike, belê di vahrî şer'î de bûye behir, lê di nav xwe de her hest bi kêmasiyan dike, hîn jî aware û penabere negeheştîye xwestek û armancên xwe yên bîr û ramanî.

Encam

Di vê lêkolînê de, em gihîştin van encamên li jêr:

Bi baweriya helbestvan Mehwî, di vê jiyânê de hebûna rasteqîn ji Xweda pêk tê, gerdûn û hemû bûnewer sûret û sîbera wî ne. Mehwî hebûna rasteqîndi dêwanebûn û di bi eşqbûn û derketina ji eqlê giştî û pîvanên giştî dibîne. Mehwî ji bona gihîştina bi hebûna rasteqîn, bi rêya dûrketina ji tiştên dinyayê, nihênîyên jiyânê dibîneû xwestiye tenê jiyânê bi deng bibihîze û di vê jiyana xwe de deng û awaza cîhana nediyar bi ruh bibihîze.

Mehwî dinyapir bi reşbînî wêne kiriye, wî xwestiye hiçîtiya dinyayê teqez bike. Lê di heman demê de armanc ji dinyayê têgihîştina ji nihênîyên afirîner û roja dawî ye.

Derbarê jiyânê jî ku helbestvan jiyânê zêdetir di tevger û reftar û hizra xwe de dibîne, hiçîtiya dinyayê dike ku ev helbestvan di warê psîkolojî û eqlî û moralî jiyana xwe di wê de dîtiye, helbestvan zêdetir meziniya afirîner cihê geşbîniya helbestvan di jiyânê de bû. Ew jiyana xwe di dûrxistin û giring nedîtina stûnên jiyânê li ba wî zoq bû. Tew ne xema wî ye eger bimire here dojhê, giring ew e ji vê jiyânê xilas bibe, derbarê jiyânê xwe di daveke pêçayî de dîtiye ku derketina mirov jê ne pêkan e.

Her derbarê mirinê jî, baweriya Mehwî bi mirinê heye ku mirin rastiyeke fîzîkî ye û tê wateya guhartina ji jiyaneke bo jiyaneke din ku wek jiyana dawî tê naskirin. Çimkî ew di jiyânê de dixwaze bi ruh laş jî bi mirinê bigihe bo gihîştina heqîqeta çespondî, bi rêya mirandina hest û şehwetên xwe di vê dinyayê de ber bi mirin an hewesa mirinê çûye, bo gihîştina bi eşqa heqîqî divê mirinê hilbijêre, lewma zêdetir têgeha mirinê ji têgeha jiyânê dibîne ji ber giringîpêdana vê mijarê li cem Mehwî û tewaw gihîştina bi heqîqetê zêdetir têgeha mirinê di helbestên wî de reng daye.

Di dawiya temenê xwe de, Mehwî wek helbestvan bi taybet, di pêvajoyên dawiya jiyân û temenê xwe de hin cudayî û bê seqamgirî ango bê istiqariyên derûnî di nêrînên wî yê derbarê jiyân û mirinê de derdikevin pêş û di encamê de, muqayese û dana berhevkirina nêrînên Mehwî tî kirin, ji destpêkê heta dawiya temenê wî, derbarê jiyân

û mirinê de ji aliyê wêjeyî ve ji qalibên hûnerî ve ew diyardeye hatiye dariştin. Herwaha bi hurgilî li ser wan mijaran muqayese û dana berhev pêkhatiye.

Çavkanî

Kurdî:

Agirîn, Ebdullah Ezîz Xalid, *Derbarê Mehwî lutke*, Wezaretê Rewşenbîrî û Lawan, 1986.

Bêdad, Xefûr Fetah Sîlêman, *Gulzarî Şahiranî Kurd*, Çapxaneya Cwarcira, Silêmanî, 2013.

Bexdadî, Ibn Cewzî, *Ezmûnên Jiyanê*, Çapxaneya Karo, Silêmanî, 2015.

Dana, Mela Hesên, *Mirin li Gor Olan*, Çapxaneya Pencere, Silêmanî, 2014.

Ebdula, Emced Emîn *Bûn/Hebûn di Helbestên Mehwî de*, Çapxaneya Tîşk, Silêmanî, 2008.

Freud, Sigmund, *Raman li Ser Wextên Ceng û Mirinê*, Çapxaneya Tehran, Silêmanî, 2015.

Hacî Teratewenî, Hisên Salih, *Endîşeyên Min Bo Jiyanê*, Çapxaneya Baban, Silêmanî, 2015.

Helmet, Letîf, *Sofî û Sofîgerîtî*, Çapxaneya Rexneya Cawdêr, Hewlêr, 2009.

Heme, Tehsîn Xerîb, *Ruhê Hikmet û Nûra Îrfanî ya Mehwî*, Rêveberiya Giştî ya Kitêbxaneyan, Silêmanî, 2012.

Huwarî Neseb, Eta'ullah, *Dîwana Mehwî*, Intîşarat Kurdistan, Sine, 1379.

Hisên, Hîmdad, *Mehwînasî*, Çapxana Serdem, Silêmanî, 2012.

Kamo, Albert, *Qenare*, Çapemenî Genc, Silêmanî, 2015.

Mebrûk, Emel, *Felsefeya Mirinê*, Çapxaneya Fêrbûn, Hewlêr, 2015.

Mehwî, Omer Ezîz, *Emustîley Ferhengistanî Dîwanî Mehwî*, (2.4) ,Çapxanê Azmer, Silêmanî, 2014.

Mehwî, Umer Ezîz, *Bêjeyên Arîfî û Kirdeyên Îrfanî yên Mewlana Mehwî*, (1-4) Çapxaneya Ezmer, Silêmanî. 2012.

Mehwî, Umer Ezîz, *Felsefeya Çarînên Mehwî*, Çapxaneya Çarçira, Silêmanî, 2005.

Mela, Ehmed, *Mehwî di Navbera Zahiriyet û Batiniyet Çavkaniyên Eşq û Wêneyê Maşûq de*, Çapxana Rojhelat, Hewlêr, 2013.

Muderris, Mela Ebdilkerîm, *Dîwana Mehwî*, Çapxana Husam, Bexda. 1984.

Neqşibendî, Şêx Emîn Şêx Aladîn, *Tesewûf çi ye*, Çapxaneya Çwarçira, Silêmanî, 2015.

Osman, Herêm, *Çemkî Mirdin le Zimanî Kurdî da*, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2013.

Qeredaxî, 'Eta, *Mehwî di Navbera Xwestekên Dinyayî û Eşqa Xwedayî de*, Çapxana Kemal, Silêmanî, 2011.

Şahîn, Hîmdad, *Gulxaneya Arifan*, Çapxaneya Rojhelat, Silêmanî, 2014.

Sartre, Jean-Paul, *Bûn û Nebûn*, (Muhemed Kemal) Weşanxaneya Serdem, Silêmanî. 2011.

Seccadî, Alauddîn, *Dîroka Edebî Kurdî*, Çapxaneya Wetenye, Bexdad, 1971.

Şikar, Sebur Ebdilkerîm, *Rengdana Kesayetî û Nerîna Melayî di Helbesta Klasîk ya Kurdî û Farsî de bi Taybetî li ba Mehwî û Hafizê Şirazî*, Çapxana Nemiran, Silêmanî, 2014.

Şikar, Sebur Ebdilkerîm, *çemkî Jiyân û Mirinê di Helbestên Mewlewî û Mewlana Romî de*, Çapxana Xezelnûs, Tehran, 2014.

Siruş. Ebdilkerîm (*Eql û Îman*), Çapxaneya Genc, Silêmanî. 2009.

Şiwan, Îbrahîm Ehmed, *Mehwîname*, Çapxaneya Minare, Hewlêr, 2010.

Şiwan, Îbrahîm Ehmed, *Ferhenga Sofîger ya Dîwana Cizîrî û Mehwî*, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 2010.

Şiwan, Îbrahîm Ehmed, *Helbesta Olî û Sofîgerî di Helbestên Kurdî Yê Mehwî de*, Çapxana Mukiryan, Hewlêr, 2001.

Xorşîd, Qanih, *Jiyân çi ye*, Çapxaneya Genc, Silêmanî, 2011.

Erebî:

el-Mawerdî, Ebû Hesên Elî bin Muhammed bin Hebîb el-Besrî, *Edebu'd-Dunya we'd-Dîn*, Daru'l-Kutubi'l-İlmiyye, Beyrût, 1987.

Şimeyl, Ana Marî ,*Ebhad sufye fi Tarixe Islam we Tesewuf* ,Menşurat Elgemel ,Koln,,2006.

El Qernî. Aîz , *La Tehzen* , Mektebet el Ibîkan, , Riyaz, 2004 .

Fetah , Îrfan Ebdilhemîd , *Sewretûr” - Ruh* , Dar el Zebîe , , Qahîre. 2014.

Zehir, Ehsan İlahî,*Tesewuf al menşah wel mesder* , Edare Terguman el sune, ,lahûr , pakistan. 1986.

Ehmed, İbrahîm ,*İşkaliyetûr”- wucud elteqniye inde Martin Heidegger*, Menşûrat elixtîlaf, 2006.

Qur'ana Kerîm,.

Toinbî, Arnold û Wel Axerin, *İnsan We Hwmum ElMewt*,Çapxaneyaya el wetenye, Qahîre,2011.

Zêdan, Yûsif, *Elfikir elsûfî beyne Ebdulkerîm Cîlî we kîbar elsûfiye*, Dar El Amin litibahe,misir, 1998.

Farsi

Seîdî ,Doktor Gul Baba ,*Hîcab Hestî* , Intîşarat Zwar , , Tehran , 1387.

Helebî . Elî Esxer , *Şinaxet Îrfan û Arîfanê İran* , Intîşarat Zewar , Tehran , 1390.

Xezayî , Nesrîn Muhteşem , *Kuliyat Fexredîn Iraqî* , Intîşarat Zwa , Tehran , 1392.

Quşeyrî , Abu Qasim Abdilkerim Bin Hwazin, *Rîsaletel Qeşîriye* , Çapxaneyaya Xaşii , , Tehran , 1388.

Îmamî, Elî Eşref , *Muqayese ve dîdga hay irfanî Ebdulkerîm Cîlî ve Ibn Erebî*), Intîşarat Besîret, Tehran. 1389.

Tedîn, Eta Allah, *Cîlwehay Tesewuf û Îrfan der İran û cihan*, Intîşarat Tehran, 1388.

Mihrbanî, Mehdî Fidayî , *Îstaden der an suy merg* , Çap Xezel,
Tehran,1391.

Silêmanî , Merziye , *Istîlahat Sofîyan*, Intîşarat Ilmî û Ferhengî , Tehran,
1388.

Uludag ,Silêman ,Ibn Erebî, Nîga Çap, Tehran , 1390.

Saytên Aliktronya Erebî

Beşîr El azmî , El- mutû fi l- qur”anîl kerîm û alşera El Erebî ye El filisfe, ,
Eswaq El mirbid, wwiw.merbad.net .22.1.2007.

Mistefa Bin hemze , Filisfe Elmut Enid Bedû Zeman Seîdê Nûrsî (Hira)
www.hirammagazine.com. 18.12.2006.

Malpera books strim , www.booksstrem.com

Mefarqe El Heyat û El mut fi şeiri cahilî (Mihemed Mekanîkî)
www.7q2w3e.kalamfikalam.com.16.6.2008.

Saytên Aliktronya Farsî

Malpera Tebiyan Zencan, www.tebyan-zn.ir

Malpera Gengûr , ganjoor.net

Şehbaz Muhsin, (mirg az nigae Muluy) Şahbaz Mohseni.blogfa.com, 15,
Ardibihişt,1389.